YE Û PİRSGİRÊKA KURD A Lİ TİRKİYEYÊ • Nebi Kesen • ▶ 6

Du welat - Du komkujî
Doğan Akhanlı • ▶ 8

Îdeolojiya serxwebûna bindestan
Sharo Îbrahîm Garîp • ▶ 2

LE MONDE diplomatique kurdî

Almanya: 3,50 Euro
Welatên din: 4,00 Euro

Mijdar 2009 - Hejmar 1 | www.lemondediplo-kurdi.com · info@lemondediplo-kurdi.com | 32 Rûpel

# Têkoşîna me

SERGE HALIMI *



HASAN HÜSEYİN DEVECİ – "Rê" (2008)
(Derbarê hunermend de rûpel 29)

Ev bîst sal in ku *Le Monde diplomatique* behsa pêkhatina tofaneke aborî dike û ev tofan îroj li redaksîyona rojnameyan dixe û rojnamefiroşan jî ji mişterîyan bêpar dihêle. Analîza sedeman tedbîran ava nake û rojnameya me bi xwe jî di bin bandora guherîna rewşê de dimîne. Rewşa wê ne weke ya yên din e û bi awayekî din e: Ne berdewamiya wê û ne jî serxwebûna wê di xetereyê de ye, lê belê derfetên wê yên bipêşketinê kêm bûne. Ji bo zelalkirina pêşeroja wê, ji bo berdewamîya tevlêbûyina şerê ramanan û ji bo ku em bikarin awayê xwe yê dîtinê û yê têgihiştina xwe ya dinyayê veguhezînin xwendevanên nû, em bangê li we dikin. Piştî tekstîl û siderurjî û otomobîlê... çapemenî. Ji bo karkerên welatên Bakurî buhayê barkirina çapxaneyan ya ber bi Başûr ve gellekî giran bû; piştî koça xwendevanên wan ya ber bi înternetê ve, niha jî rojnamevan bi xwe ketine rewşa taswasa karên xwe. Em dikarin bigihijin wê encamê û bibêjin ku modeleke aborî tim ya berî xwe ji holê radike, em dikarin şikuriya xwe bînin û bibêjin ku waye em li ser lingan in û jiyan weha ye. Lê belê, divê em demokrasiyê jî ji bîr nekin. Ji me re dibêjin ku otomobîl ne alaveke civatê ya weha ye ku mirov nikaribe biguhere û ew bi tenê alaveke bazirganiyê ye. Mirov dikare li devereke din û bi awayekî din jî otomobîlan çêbike, mirov dikare alaveke veguheztinê ya din jî bike şûna wê. Yanî, ne gellekî giring e. Lê belê, çapemenî...

* Nivîskar, rojnamevan, edîtore Le Monde Diplomatique

▶ 14

ENFAL

# Komkujiya ku li kirdarê xwe digere

FAYSAL DAĞLI *

Di sala 1988'an de, Kurdên (ji Başûrê Kurdistanê) ku li kolanên Amedê, bi şewatên li dest û rûyên xwe li ber dergehê doktoran digeriyan, bûn yekem şopên Enfalê yên di mejî û çavên min de. Ligel ku min peyva Enfalê di jiyana xwe ya rojnamegeriyê de gelek caran bihîstibû, yekem wêneyên vê "bahozê" yên li cem min; laşên şewitî, çavên korbûyî, çermên perpitî û sîlûeta bi hezaran kesên ku ji malên xwe hatibûn vederkirin, bixwe bûn.

Di heman demê de, şahidê bêdeng ê Helebçeyê û komkujiyên girseyî yên rejima Baas, bi me dida xuyakirin ku Enfal, piştî serhildaneke kurdan, ne tenê hewldaneke hovane ya ji bo temirandina serhildanekê ya rejimê ye; di rastiya xwe de bi me dida xuyakirin ku li Başûrê Kurdistanê tevkujiyeke sîstematîk tê pêkanîn. Enfal ango kiryarên beriya wê û piştî wê, heta dema ku rejima Saddam hate rûxandin, bi awayên cihêreng hatibû pêkanîn û ev yek hatibû berdewamkirin. Rejima Saddam, kurdên ku ji ber "bahoza" qirkirina etnîk, ber bi derveyî Îraqê ve reviyabûn, li derveyî welêt jî dişopand û hewl dida bermahiyên komkujiyê, li deverên xwe spartinê jî ji holê rake. Hemwelatiyên Îraqê yên li kampên Diyarbekir, Mêrdîn û Mûşê ku di bin stara dewleta tirk de bûn, li cihê ku lê bûn jî, bi awayê jahrîkirina nanên wan, rastî hewldanên kuştinên girseyî dihatin. Sîxurên Saddam bertîl didan peywirdarên dewleta tirk, diketin firûnên ku ji bo kampên penaberan nan çêdikirin, jahrên ku hê jî li cem wan gelek hebû, dixistin nav hevîrê nanê kurdên sivîl û çav li mirina wan dikirin.

Piştî dagirkirina Kuweytê, di sala 1991'an de şopa jahrên kîmyewî yên di bedenên bi dehezaran kurdên Îraqê de ku xwe li sînoran xistibûn, piştî rizgarbûna Kurdistanê ji jêrdestiya rejima Baas, bîranîna gelek însanên bêhejmar ku di komkujiyê de hatibûn qetilkirin, di jiyana pîşeyî ya rojnamegeran de jî bandora jahrê kiribû. Enfal ku wekî jenosîdeke modern ketibû dîroka mirovahiyê, rojnamegerên şahid jî xistibû nava trawmayên bêderman.

Di 30'ê Hazîrana 2009'an de li Dadgeha Bilind a Hollandayê (Hoge Raad) ku sûcdarên komkujiyê lê têne dadgehkirin, biryareke ku di danişîna tacirekî çekan de hat dayîn, -ku wî ji bo ku kurd bi awayeke girseyî bêne kuştin gazên jahrê firotibû û alîkariya Enfala rejima Saddam kiribû- rehên Enfalê yên di wîcdanê min de careke din ketin tevgerê.

* Nivîskar, rojnamevan, edîtore Le Monde Diplomatique kurdî

▶ 16

Rûdaw
Hemû rojên sêşemê li firoşgehan
Deutschland, Österreich, Nederland, Belgique, France 1,50 Euro | Schweiz 2,70 CHF | England 1,40 GBP | Sverige 21,00 SEK | Denmark 15,00 DKK
info@rudaw.net | www.rudaw.net

www.arsivakurdi.org

NETEWPERWERÎ

# Îdeolojiya serxwebûna bindestan

**Sharo Îbrahîm Garîp ***

Li gor teorîsyenan şerên rûxênî karê komên etnîk e. Bi rastî jî ev dîtin bi fêl û fikrên lêkolînvanan ve gelek hatine girêdan. (Sigrist 1995) Gava mirov li ser fonksiyona legîtîmasyonê ya zanistiyê bifikre, mirov dibîne ku rê, teorî û heta peyvên ku lêkolînvan hildibijêrin, di lekolînê de roleke mezin dilizîn. Ji ber vê yekê ezê jî di vê lêkolînê de, him paradîgmayên sereke, him jî yên li dijî van binirxînim. Mînak; Gelek caran di lêkolînan de şer weke “pirsgirêka gelên bindest“ tê binavkirin. Gelo çima weke “pirsgirêka gelên serdest” nayê binavkirin? Yan jî daxwazên gelên bindest wek xetereke mezin tê pejirandin. Lê pişgiriya mafê gelên bindest weke pirsgirêk nayê hesibandin. Ji ber vê yekê zelalkirina teoriyan, metod û binavkirinan pir girîng in.

Ji dema ku dewletên netewî hatine damezrandin ve di navbera gelên bindest û serdest de şer sar nebûye. Bi taybetî jî sedsala 19 û 20’an (Deutsch 1972) weke termekî bi ser gel û netewên bindest de hat. Qirkirina yahûdî, ermenî, asûrî û kurdan hîn ji bîra mirovahiyê neçûye. Berî deh panzdeh salan li Ruanda, li Balkanan yan jî îro li Srî Lankayê bi hezaran, bi milyonan mirov hatin kuştin. Encama şer gelek giran e; şerê bi çekan ji aliyekî ve telefbûna mirovan, zirara aborî ji aliyên din ve xirabûna qeydên mirovatiyê bi xwe re tîne. Pirs ew e ku sedem û çareseriyên şer çi ne? Mirov dikare ji bo sedemên şer sê teoriyên mezin bîne ziman. Li gorî teorîsyenên modernîzmê şerê netewî/gel û komên bindest bi piranî bi paşvemayîna civak û aboriyê ve girêdayî ye. Teorîsyenên demokrasiyê şer wek pirsgirêka siyaset û demokrasiyê dibînin. Grûbeke din jî heye, ku wek “teoriya çand”, ew jî dibêjin ku çi gav çandên ji hev cuda bêne cem hev, bêşik şer çêdibe. Ji ber ku di dîrokê de mînakên li ser aştiya çandan ji mînakên şerê çandan zêdetir e. Di nav tezên min de ew teorî cih nagire.

Weke dîtina sedemên şer, çareseriya şer li gor teoriyan cuda cuda tê şîrovekirin. Lê dîsa jî mirov dikare van teoriyan di nava du kategoriyên mezin de kom bike: Teorîsyenên lîberal bi piranî çareseriya vî şerî di nava mafên mirovan ên şexsî de dibînin. Lê teorîsyenên ku piştgiriya plûralîsmê dikin çareseriyê di nava mafên (group) komelî de dibînin. Armanca min di vê nivîsê de ne kûrkirina van tez û mijaran e. Lêbelê, ez dikarim bêjim ku ji van teoriyan tiştekî hevbeş derdikeve holê: sedem civakî bin, aborî, siyasî û dîrokî bin, her tim sedema şer niheqî ye. Daxwaza min di vê nivîse de ev e ku sedemên dîrokî weke konseptên “etnîsîte”, “netewî” û konseptên “kesayetî” şîrove bikim. Di gelek beşên zanistiyê de ji bo kifşkirina qeydên giştî pirê caran metoda ‘’li hemberî hev girtin’’ tê bikaranîn. Ez jî li vir du dewletên ku pirsgerekên wan weke hev in, didim ber hev û dixwazin ku bibînim ferq di kuderê de ne û çima ev ferq hene?

Lêbelê çima Spanya/Bask (Euskadi) û Tirkiye/Kurdistan wek mînak hatin hilbijartin. Ji ber ku di aliyekî de dîroka Osmaniyan û Kastil/Aragonîan, damezrandina netew/ dewletên tirk û spaniyan, pêşketina civakî û aborî di aliyê din de jî parvekirina baskî û kurdan di nava dewletan de, şerê bask û kurdan û partiya bask wek ETA/PKK û Herri Batasuna/ DTP nêzikî hev in.

**Etnîsîte:** Li Yûnanistana kevin komên biyanî wek “ethnos” dihatin binavkirin. Li Îm- paratoriya Romayê jî bi peyva “ethnos” kesên li dervayê paytaxt Romê rûdiniştin, dihatin tarîfkirin. Ji wê demê heta îro “ethnos” dichtomiyek wek “em û hun” yan jî bi gotineke din “em û biyanî” tîne ziman. Di çavkaniyan de gelek binavkirinên “etnîsîte” hene, lê di şûna binavkirinan de ez dixwazim li ser konseptan rawestim. Gelek konsept hene. Mirov dikare wan di nav du beşan de berhev bike. Konseptên objektîf wek konseptên “prîmordalîst”, “trîbalîst” yan jî “sosyo-biyolojîk” bi piranî bala xwe dikêşin ser kokên mirovan. Ji ber ku konseptên sosyo-biyolojîk ber bi rasîsmê (nîjadperestî) ve diçin, ez bi guman li rastiya wan dinêrim. Ew konsept li vir nehate bikaranîn. Di konseptên objektîf de (primordal û tribal) taybetmendiyên wek ziman, malbat, eşîret û merlixî roleke mezin dilîzin. Li gor Barth (1969) û Geertz (1963) ‘’etnîsîte’’ fenomeneke îrrasyonel û psîkolojîk e.

Di konseptên sûbjektîf de xwemalî fenomeneke polîtîk û îdeolojîk e û bi daxwazî û berjewendiyê ve hatiye girêdan. Yanî kokên mirovan rolên mezin nalîzin. Konsepta objektîf bê dînamîk e û guherandina etnîsîteyê yan jî ya kesan nikare zelal bike. Di aliyê din de jî kêmasiya konseptên sûbjektîf ev e ku ew xwemaliyê bes di berjewendiya aborî û stratejiya entelektuel de dibînin. Ev jî ji sedî sed nerast e. Ji herdu konseptan diyar dibe ku du aspektên girîng yê “etnîsîteyê”hene: Kesayetî û berjewendî. Bi rastî jî eger mirov li dînamîkên tevger û palpiştiyê binêre, him kesayetî him jî berjewendiyê di nava van de dibîne. Weke McDonald jî gotiye li gorî fikra min, rola kesayetiyê ji ya berjewendiyê zêdetir e. Eger ne wisa bûya gelek komên berjewendiparêz hene, mirov çima hewceyî komên etnîk e? Epstein dibêje ku endamiya komên etnîk baweriyek e yan jî rizayeke dildarî ye. Ji ber ku hevaltiya salan, merlixî, cîranî yanî têkîliyên civakî dewlemendiyeke civakî ye û bi salan ava dibe. Yan jî ziman, dîrok û çand hemû şayayên taybet in ku tenê di nava wê kome de bi qîmet in. Ew şayan sermayeyên dîrokî û çandî ne. Kom di van nirxên xwe de parastina xwe û berdewamiya xwe dibînin. Herwiha komên etnîk li rêxistinên xwe yên siyasî jî wek sermayeya siyasî dinêrin.

## Etnisîteya baskan

Çi wext baskî hatine ciyên xwe yên îro yan jî ji kîjan wextê de li wir bûn? Gelek dîrokzan li ser dîroka baska (Euskadi) kevin ne hemfikir in. Lêbelê gelek antropolog û etnologên baskî nivîsên li ser dîwarên Înan yên ku ne îndogermanî ne, mîna ‘’şopên baskî’’ nîşan didin. Ji ber ku zimanê baskî jî ne îndo-germanî ye, dozeke pêşda dajon ku baskî berî hemû ewrûpiyan li wir bûn. Di kesayetiya etnîk a baskiyan de dîrok û mîtolojî roleke mezin dilîzin. Berî her tiştî ji “fueros” yanî “komên asîl” weke dokumentan têne bikaranîn. Ji sala 711’an vir ve asturî, kanturî, galîçî û baskî xwe ji îslamê parastine. Gelên ku li dijî Fransa û Ereban, Spanyayê diparastin xeleta “asaletê” ji hikumdarî digirtin (Greenwood 1977). Ew gel ne mecbûr bûn bac bidin, ne jî mecbûr bûn leşkerî bikin. Bes li hemberî dijminên Spanya sînoran diparastin. Hinek dîrokzanên (wek Juan Matinez de Zaldibias 1564) baskî “komên asîl” weke “xwîna asîl” (Limpieza de sangre) şîrove dikin, dibêjin ‘’baskî qet tu caran ne li ereban ne jî yahûdiyan qelivîne.’’ Ji ber vê yekê baskî xwe ji spaniyan bilindtir dibînin û xwe weke xwediyê asîl yê Spanyayê dihesibînin. Du îdeologên netewiya Baskê, Peter Larramendî (1754) û Sabîno Arana jî di nivîsên xwe de gelek bala xwe dikêşin ser dîrok, kok û paqijiya nijada baskê. Arana bi berdedojo ku zimanê baskiyan yên ne indo-germanî yan jî bi piranî xwîna baskên Rhesus negatîf ji bo cûdahiya baskiyan peytên girîng in. Arana dibêje, ‘’Bask ji dîroka kevn ve heta îro her hebûne.’’ Larremendî jî dibêje ‘’Baskî gelekî matriarch bûn û ji ber vê yekê her tim demokrasî û wekheviyê diparastin. Ji ber vê baskî ji spaniyan bilindtir in.’’ (Röhmhild 1994, Heiberg 1989; Greenwood 1977). Ew konseptên objektîf îro zêde bandora xwe tune ye. Ji netewperestên çep yan radîkal heta netewperestên lîberal, “kesên li welatên Bask dijî û kar dike yan jî ji bo pirsgirêka netewa Baskê xebat dike” weke Bask tê binavkirin (Heiberg 1989).

## Etnîsîteya kurdan

Di etnîsîteya kurdan de jî weke ya Baskê dîrok, mîtolojî û bi piranî jî ziman roleke gelek mezin dilîze. Li ser koka kurdan du teorî hene. Li gorî teoriya Mînorskî û Nikitîn kurd şopînerên Kassît û Karduhka ne. Weke aryenên din, paşê hatine Mezopotamyayê û zimanên

** Zanistê siyasî, aborînas, xwendekarê doktora*

www.arsivakurdi.org



HASAN HÜSEYİN DEVECİ – "Tevger" (2009)

van indo-german e. Nöldeke û Mar vê tezê napejirînin û dibêjin; ''Kurd xwediyê Mezopotamyaya kevnar in. Zimanê indo-german jî paşê ketiye nav zimanên wan. Lê gelek dîrokzan li ser vê hemfikir in ku kurd ji medan tên. Gelek etnolog û dîrokzan nivîsên asûrî, sûmer, akadiyan bi taybetî jî nivîsa Ksenefon û Şerefxanê Betlîsî ji bo koka kurdan wek delîl tilmînin. Li gorî Franz, Mezopotamyaya kevin mozayikeke gelan bû û wisa tevlihev bû ku mirov nikare bejê ku bav û kalên kê kiye! Li gorî fikra Mehrad Izady û Şerefxan Cîzîrî, kurd sentezeke indo-germanî û ne indo-germanî ne. Cizîrî dibêje, ''Çima mirov li dê û bav û mîletên din nagere bes li yên kurdan digere. Ew lêgerîna bav û kalên gelan ên biyolojîk tiştekî xelet e.'' Franz dibêje, ''Kurd weke etnîsîte bi îslamê re derketin.'' Îro kurd bi çi awayî tên binavkirin an jî kurd kî ne? Dr. Nebez jî wiha bi nav dike: (binavkirina Izady jî nêzikî wî ye) "Kesên li hemberî gelên din xwe wek endameke gelê kurd dibînin, xwe kurd dihesîbînin an jî ji aliyê gelê kurd ve weke kurd têne dîtin, kurd in."

Konsepta etnîsîte ya baskî û kurdan bi konsepteke objektîf dest pê dikin û îro bi piranî hatine ser konseptên sûbjektîf. Lê dîsa jî pîvanên objektîf bi taybetî jî ziman li gel baskiyan û kurdan roleke gelek mezin dilîze. Mirov dikare bêje ziman bûye kesayetî. Ziman weke çek ji bo parastinê yan jî weke protest tê bikaranîn. Ji sedî sed ne diyar e. Parastina kesayetiyê yan jî ya ''etnîk'' pi piranî ji ber zorê ye, yan jî ji ber xwenaskirina xezayî ye? Lê tiştê diyar ew e ku di tevgerên herduyan de etnîsîte roleke mezin dilîze.

## Neteweperweriya etnîk: "Îdeolojiya serxwebûnê"

Şerê etnîk bi gotineke din berxwedana netewçêkirinê ye. Îdeolojiya wê jî netewperwerî ye. Wateya netew (nation) jî "nasci" ji latînî tê. Wateya wê ''zabûn'' e. Lêbelê netew û neteweperweriya modern bi şoreşa Fransî dest pê dike. Netew jî weke ''etnîsîte'' cuda cuda tê binavkirin. Ji bo Anderson (1996) û Gellner (1991) netew, ''civakiya siyasî'' ye. Lê Connor (1994) û Smîth (1995) netewê di katagoriya gel û etnîsîteyê de dibînin. Yanî konsepta Anderson û Gellner konsepteke sûbjektîf e. Li gorî wan netew tiştekî bi hîs û daxwaziya şexsan ve hatiye girêdan. Konsepta objektîf a Connor, Smîth û Şenghaas bingeha netew di etnîsîte, dîrok û pîvanên objektîf de dibînin. Ji bo wan netew ne fenomeneke sentetîk e, netew bi salan di pêvajoya xwezayî de ava bûye. Pirs ew e kurd û baskî netew in yan na? Li gorî Deutsch, ''Eger gelek bi piranî ji bo etnîsîteya xwe yan jî ji bo zimanê xwe di nava tevgerê de be, ew netewek e; eger gelek doza dewletê bi destê xwe bixe, ew neteweyek e. Binavkirina Hroch jî nêzikî ya Deutsch e lê Hroch zêdetir ji bo binavkirina netewê balê dikşîne ser têkîliyên navbera komekê de, wek yên dîrokî, aborî, çandî, siyasî û ziman.

Herçiqas me bahsa konseptên netew yên objektiv û subjektiv kirîbe jî, ferqeke mezin di navbera ''netewperweriyê'' de jî heye. Netewperweriya berî îndustriyê û piştî îndustriyê ji hevûdû cûda ne. Netewperweriya destpekêr yanê ya berî dema îndustriyê li welatên wek Fransa û Îngiltereyê îdeolojiya eriş û întegratione bûn. Ji ve netewperweriyê re ''netewperweriya navendî'' te gotin. Ji ber ve yekê netewperweriya gelên sereke bi piranî ya navendê ye. Piştî dema îndustriyê li dijî netewperweriya navendî gelen bindest yani yên kêleka navandê (dardor) netewperweriya kêleke peydakirin. Ew netewperwerî ne îdeoljiya êrişkariyê ye, îdeolojiya parastin û serxwebûn e. Netewperweriya bask û kurdan (etnonationalism) di vê grûbe de tê dîtin.

## Netewperweriya kurd

Gelek nivîskar û dîrokzanên kurd dibêjin fikra netewî bi Ehmedê Xanî dest pê kiriye. Her çiqas mîrên kurd ji sala 1806'an heta 1880'an li hemberî osmaniyan şer kiribin jî, Bruinessen (1989) û Kutschera (2001) tevgera Şêx Ubeydullah ya sala 1880'an weke destpêka şerê netewî şîrove dikin. Di nava împaratoriya osmanî de li gorî sîstema "milet" ji mîrnîişînên kurd re digotin "Hikûmetên Kurd." Ew hikûmet serbixwe yanî otonom bûn, ne hesab ne jî bac nedidan hikûmdarên osmanî (Cengiz 1997). Lêbelê Hikûmeta Osmanî, Kurdistan di nava gelek mîran de parve dikir. Ji ber vê jî gelek caran di nava wan de şer derdiket. Bruinessen li ser mijara netewperweriya kurd qala du qonaxan dike: ''Netewperweriya herêmî û ya tevahiya Kurdistanê.'' Hroch berfirehbûna netewperweriyê li ser sê dewran dabeş dike: ''Di dewra yekem, yanê di dewra ro-

www.arsivakurd.org

mantîk de tenê kesên navdar xebatên wek edebiyata netewî dikin. Di dewra duyem de kom weke komal têne rêxistin. Di dewra sêyem de gel bi tevahî dikeve nava tevgera netewî.'' Ez jî li gorî vê modelê bask û kurdan dinirxînim. Qonaxa netewperweriya kurd ji sala 1880'an dest pê dike û heta 1910/1920'an berdewam dike. Rewşenbîrên kurd, oldar û şaxsiyetên navdar bi piranî li Stenbolê li ser zimanê kurdî, wêjeya kurdî dinivîsin. Di despêka wê dewrê de netewperestên kurd yên mîna İshak Sükuti û Abdullah Cevdet bi Jontirkan re bi rê ketin; lêbelê piştî eşkerebûna zordestiya Jontirkan, rewşenbîrên kurd riya xwe ji wan veqetandin. Tesîrên neteweperes- tiya tirk li ser ya kurdan du ne. A yekemîn kurdan jî di nava metropolên osmanî de ji netewperestiya tirk mînak girtin. A duyem piştî geşbûna pantirkîzmê weke reaktion (acizbûn) hate holê.

Qonaxa duyem ji salên 1910/1920'an hetanî 1960'an berdewam dike. Di vê dewrê de jî gelek komal, rojname tevgerên mezin hatin avakirin. Rêberên tevgeran bi piranî oldar, nivîskar, paşa û serokê eşîran bûn. Tevger herêmî man, li tevahiya Kurdistanê belav nebûn. Her çiqas Kemalîstan ji bo komareke kurd û tirkan soz dabe jî piştî damazrandina Komara Tirk hemû soz hatin jibîrkirin. Kemalîstên rêçika Îttihat Terrakiyê şopandin zordestiyeke reştir bi ser kurdan de birin û kurd bi tevahî înkar kirin. Di vê demê de kurdan jî gelek caran heta sala 1940'î serî hildan. Lê kurd bi ser neketin û hatin qirkirin. Ji sala 1940'an heta 1960'an tevgerên kurd rawestiyan û kurdan gelek car hêviya xwe wenda kir. Di nava kurdan de asîmîlasyona reş û gewr bi hev re hatin meşandin.

Qonaxa sêyem di sala 1960'an de dest pê dike. Weke li cîhanê xwendekarên kurd jî tevgerên şoreşger ava kirin. Encamên van tevgeran rêxistinên wek PDK-T û DDKO damezirandin. Daxwaza wan partiyan Kurdistaneke otonom, serbestiya çanda kurdî û mafên civakî yên kurdan bû. Bi hezaran kes tevli meşên wan dibûn. Ew dema hişyarbûna kurdan ji bo neteweya xwe bû. Lêbelê cuntayên (1960/1971/1980) wek şevên tarî bi ser kurdan de hat. Kurdan jî li hemberî vê siyasetê di sala 1984'an de (PKK) dest bi şerê çekdarî kirin. Aktorên vê dewrê bi piranî jî tebeqeya navîn û ya jêr in; yanî bi piranî xwendekar, rewşenbîr, karker û cotkar bûn. Her çiqas Kurdistan paşvemayî be jî koçberên kurd yên ku li bajarên Tirkiyeyê ji aliyekê ve krîzeke kesayetiyê bi xwe re derxist holê û li aliyekî din de jî di zanîngeh û dibistanan de ji bo xwedîderketina li kesayetî û neteweya xwe hişyar bûn. Ji ber ku kapîtalîzm li Tirkiyeyê pêş ve diçû şerê tebeqeyan jî derdiketin holê, wî şerî bi veşartî şerê netewî hin zêdetir geş dikir. Wekî din jî bi saya pêşveçûna kapîtalîzmê ve medya li gelek deveran belav bûbû. Ji ber vê yekê tevgera netewî herêmî nema, li hemû derên Kurdistanê belav bû. Weke Deutsch jî anîbû ziman, rola xwendin, pêşveçûna civakî-aborî, avakirina bajêran, bi taybetî jî rola medyayê li vir careke din diyar bû. Ji ber ku kesên xwenda hindik bûn yan jî têkîlî kêm û dereng bû, xeber dereng digîştin qonaxa yekem û duyem, gelek dirêj dajot û netewperwerî herêmî dima.

## Netewperweriya baskan

Dewleta Baskan a dawî di sala 905'an de ava bû. Mîr Navarra hingê herdu parçeyê welatê Baskan (ya Fransa û Spanya) di bin hikmê xwe de kiribûn yek. Lê di sala 1512'an de dîsa baskî ketin bin hikmê împaratoriya Kastil-Aragon. Bask teqrîben bi sînorê îro di nava Fransa û Spanya de hatin parvekirin. Her çiqas baskî bindest bûn jî weke min li jorê anî zimên di saya "Fueros" de ew otonom bûn. Baskî ji bac û leşkerdayînê azad bûn. Lewma mirov dikare bêje ''serbixwe'' bûn. Otonomiya baskiyan heta dewra Xanedana Bourbon ya sala 1812'an berdewam kir. Armanca Zanedanê Bourbon dewleteke lîberal und navendî bû. Piştî van li hemberî Karlisten dewlet bi dest xwe xistin (1876) ji tevda otonomiyê rakirin. Hikûmeta Spanya bazara Baskê ji hemû Spanyayê re vekir. Ji aliyê din de jî hikûmeta nawendî sazî, dibistan û karên fermî hemû bi zimanê Kastilan (spanî) meşandin. Piştî vekirina bazara welatên Baska ya ku gelek dewlemend bû, bi hezaran Spanî hatin welatê Baskê.

Piştî hatina Spaniyan, baskî di welatê xwe de bûn muhacir. Wendakirina çand û ziman, ji bo wan bû sedema tirseke mezin. Di encama van bûyer û tirsan de krîzeke kesayetiyê li gel baskiyan çêbû. Du derbeyên cûnta 1923 (Primo de Rivera) û 1937 (Franco) zordestiyeke giran li ser gelê Baskê kir.

Puhle jî modela Hroch ji bo netewperestiya baskê bi kar aniye. Li gorî wî qonaxa yekem yanî netewperestiya romantîk di sala 1870'an de dest pê dike û heta 1890'an berdewam dike. Rêberên vê dewrê nivîskar û rewşenbîr in. Qonaxa duyem ji 1890'an heta 1931'an berdewam dike. Di vê qonaxê de gelek navendên çand, komalên siyasî hatine sazkirin. Sabina Arena di vê demê de bingeha îdeolojiya netewperestiya baskiyan dagirt. Sabina yên ku di bin bandora netewperestiya Katalanan de maye Partiya Netewî ya Baska (PNV) bi ser lingan xist. Di vê dewrê de aktorên (rêber) tevgera netewî weke qonaxa yekem oldar, rewşenbîr û nivîskar in.

Tevgera netewî di sala 1931'an de berfireh dibe. Di hilbijartina 1931'an de diyar dibe ku Bask bi piranî bi hêstên netewî hisiyane û ji ber vê yekê piştgirî dan PNV'ê. Piştgirî bi piranî ji tebeqeya bingeh û navend in. Yanî ji hunermend, xwendekar, rewşenbîr, keşeyan heta karker û rêncberan gelek kes di tevgera netewî de cih girt. Netewperestiya baskiyan a nûjen xizmeta azadiya baskiyan dike. Netewperestiya wan bi piranî li ser faktorên etnîk yên wek ziman, dîrok û terîtoryûmê rûniştiye. Puhle û Waldman bi piranî netewperweriya baskiyan wek reaksiyoneke li hemberî zorê, li hemberî pergala navendî û bandora îndusriyalîzmê dibînin. Her çiqas bandora van tiştan jî hebe weke Röhmhilde jî dibêje, prosesên dîrokî û prosesên xwezayî weke hişyarbûnê rola xwe zêdetir in.

## Hevberî

Her çiqas wek tabloyeke li jêr hevberî hatiye kirin jî şîrovekirina nivîskî, bi taybetî jî qonaxa sêyem balkeştir dike.

Di îdeolojiya netewperestiya baskiyan de du xet hene: Yek xeta lîberal-nûjen û xeta kevneperest. Li gel ya baskiyan, di ya kurdan de xeta lîberal û çepên radîkal derdikeve holê.

Oldar di nava tevgerên baskiyan de roleke gelek mezin dilîzin; di nava tevgerên kurdan de di qonaxa yekem û duyem de xwedî roleke balkeş in, lê di qonaxa sêyem de xwe dûrî tevgerê digrin.

Netewperestên herdu gelan nêzikî hev dest pê dikin, lê netewebûna baskiyan pir zû dimeşe. Ji ber ku baskî di aliyê îndustrî, civakî û bajaran de zû bi pêş ve çûbûn. Xwendin û nivîsîn, medya jî di nava baskiyan de gelek belav bûbû.

Di qonaxa sêyem de wekhevbûnek heye; di tevgera netewî ya baskî û kurdan de armancên siyasî berî armancên çandî dimeşin.

BERHEVDANA PÊLÊN NETEWPERWERIYA LI KURDISTAN Û EUSKADI

| | 1. Qonax | | 2. Qonax | | 3. Qonax | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | **Kurdistan** | **Baskenland** | **Kurdistan** | **Euskadi (Baskenland)** | **Kurdistan** | **Euskadi (Baskenland)** |
| **Dem** | 1880-1920 | 1870-1890 | 1920-1960 | 1890-1931 | 1960....... | 1931.......... |
| **Aktor** | Oldar/Nivîskar | Nivîskar | Oldar/Serleşker | Oldar/Rewşenbîr/ Burjûwayên biçûk | Rençber/Xwendekar/ Proletarya | Tebaxa jêrîn û tebaxa navîn |
| **Pivanên Netewekirine** | Qebîle/Aşîret | Nîjad | Ziman/Dîrok | Ziman/Dîrok | Ziman/Dîrok | Ziman/Dîrok |
| **Pivanên Netewperweriya Bindestan** | Wêjeyi | Wêjeyi | Defensîv/Objektîvî/ | Defensîv/Objektîvî/ | Defensîv/Objektîvî/ Seperatistisch | Defensîv/Objektîf/Exklusiv û Seperatistisch |
| **Pivanên Netewperweriya Serdestan** | Wêjeyi | Wêjeyi | Offensîv/Sujektîvî/Exklusîv | Offensîv/Subjektîvî/Exklusîv | Offensiv/Subjektivistisch/ Exklusiv | Offensîv/Subjektîvî |
| **Navendên Netewperweriye** | Metropolên Osmanî | Metropolên Spanî | Bajarên bazirganiyê/Kurdistan | Bajarên Îndustriye/Baskenland | Heremên bazirganîye/ îndustriyê û gund | Heremên îndustriyê û heremên cotkariyê |

**Çavkanî**

- Anderson, Benedict. Die Erfindung der Nation. 2. Auflage Frankfurt/Main, 1996, S. 15.
- Barth, Fredrik. Introduction in: Barth, F. Ethnic Groups and Boundaries, Bergen/Oslo, 1969 S, 9ff.
- Bruinessen, Martin. Origins and Development of Kurdish Nationalism in Turkey, Berlin, 1981.
- Celil, Celilê. Kürt Aydınlanması(Kurdische Renaisance), İstanbul, 2001
- Cengiz, Canan. Die Entwicklung des kurdischen Nationalismus in der Türkei von den Anfängen bis 1945, Oldenburg, 1997.
- Clark, Robert. P. The Basques: The Franco Years and Beyond. Basque Study Program, Reno. Univ. of Nevada Press, 1979.
- Connor, Walker. Ethnonationalism: the quest for understanding. Princeton, 1994.
- Deutsch, Karl. W. Nationenbildung- Nationalstaat- Integration, Düsseldorf, 1972, S. 204.
- De Silva, M. M. The Basque nationalist movement. Massachusetts, 1972.
- Epstein, Arnold L. Ethos and Identity: Three Studies in: Ethnicity, London. Tawistock Publication, 1978.
- Franz, Erhard . Kurden und Kurdentum. Mitteilungen Hamburg, 1986.
- Greenwood, Davydd. Continuity in Change: Spanish Basque Ethnicity as a Historical Process, 1977, S. 81-103.
- Heiberg, Marianne. The Making of the Basque Nation. Cambridge, Cambridge Univ. Press, 1989.
- Hroch, Miroslav. Das Erwachen kleiner Nationen als Problem der komparativen sozialgeschichtlichen Forschung ,1985, S. 155ff.
- Izady, Mehrdad. Kürtler (Die Kurden) İstanbul, 2004
- Kutschera, Chris. Kürt Ulusal Hareketi (Le Mouvement National Kurde), Paris, 1979.
- Lazarev, M.S/ Mihoyan, S. X. Kürdistan Tarihi (Istoriya Kurdistana), İstanbul, 2001.
- Mc Dowall, David. The Kurds: A Nation Denied, London, 1992.
- Nebez, Jemal. Kurdische Zugehörigkeit: Wer ist Kurde? Stockholm 1987, S. 7.
- Nikitin, Bazil. Kürtler Cilt 1 (Kurden Bd. 1). İstanabul, 1976.
- Puhle, Hans. J. Baskischer Nationalismus im spanischen Kontext 1982, S. 51ff.
- Röhmhildt, Kerstin. Nationalismus und ethnische Identität im `spanischen` Baskenland. Münster/Hamburg, 1994.
- Smith, Anthony. The Ethnic Origins of Nation. Oxford 1986.
- Valandro, Franz. Das Baskenland und Nordirland. Innsbruck/Wien, 2001.
- Waldmann, Peter. Militanter Nationalismus im Baskenland. Frankfurt/Main. 1990.
- Zulaika, Joseba. Basque Violence. Reno, Nevada. Univ. of Nevada Press. 1988.

www.arsivakurdi.org

PİRTÛK

# Polonî û Cihû, ewqas nêz, ewqas dûr

DARIUSZ ZALEGA

Antî-semîtîzm û Şoa:* Dema ku mirov li têkiliyên di navbera Cihû û Poloniyan de difikire ev du peyv tên bîra mirov. Tevî ku vîzyoneke ne têr zelal a van têkiliyên bi sedan salan mijara gotinê ye heye jî (Polonya ya têr xweşbîn di serdema navîn de, ji bo bi hezaran cihûyan bûbû weletakî bijarte), Şoayê dawî li civaka cihû ya li ser erdê poloniyan bû anî û antî-semîtîzma piştî şer – ji ber hesabên siyasetmedarên îktîdara "gel" – kir ku bîranîna wê ji dîrokê bi wê de biçe. Rewş bi vî rengî bû, heta ku 1989'an, gava ku dîrokê xwe ji desthilatdariya îdeolojiya fermî rizgar kir.

Du pirtûkên ku li Fransayê nû hatine weşandin, guherîna vîzyona têkiliyên di navbera cihû û poloniyan de destnîşan dike. ''*Cihû û Polonî, 1939-2008*'', xebateke zanistî ya pevrayî, di bin rêveberiya Jean-Charles Szurek û Annette Wieviorka (1) de hat weşandin. Di dema şer de cihûyan bi çi çavî li poloniyan dinihêrî? Sedemên poloniyan çi bûn ku cihûyên veşartî didan dest? Hikûmeta Polonya ya di koçberiyê de û herwiha berpirsên gel ên Polonyayê li hemberî qirkirinê bi çi awayî tev digeriyan? Ev berhem hewil dide ku bersivan bide. Du pirsên girîng – di dema şer de û piştî wî, tevlêbûna rastgirên tundrew a ji bo kuştina cihûyan (ev rêbaza polîtîk niha li Polonyayê di rehabîlîtasyonekê de ye ji ber antîkomunîzma wê ya radîkal), û awayê tevgerîna Dêra Polonya di dema şer de li hemberî Şoayê – êdî pêwist e bi taybetî bên vekolîn.



Lîstikvan Rudolph Vrba û Alfred Wetzler di dîmeneke ji fîlmê "Escape From Auschwitz" de (http://pt.uen.org)

Nirxandina bingehîn di hizirîna li ser qirkirina cihûyan de, nirxandina "şahidê polonî" ye. Şahidekî ku li hemberî qirkirinê gelek caran bêdengiya xwe diparast, tevî ku carinan an bi alîkarîkirina qurbanan, an jî bi alîgirtina di qirkirinê de ji vê rolê derbas jî bûbe jî. Lê belê, herçend polonî dibûn şahid, ew herwiha qurban jî bûn – li ser erdê Polonyayê bi dehan gundên ji aliyê Naziyan ve hilweşandî dikarin bên dîtin, wekî Oradoursur-Glane. Ev dibû sedemeke mezin, ji bo bêdengiyê...

Ji xwe Jean-Yves Potel (2) di pirtûka xwe ya roportajê de behsa guherîna vê bêdengiyê û çîroka "bêsûciya poloniyan" dike. Ew li vî welatî dest bi gerra xwe dike – û her weha dest bi analîza xwe ya bîranîna poloniyan ya veşartî – li gundê Jedwabneyê. Ev gundê Polonyaya Rojhilat bû sembola têkoşîna ji bo bîranînê. Ha li wê derê, di tîrmeha 1941'ê de, niştecîhan bi hezaran cîranên xwe yên cihû di embarekê de bi saxî şewitandine... Pirtûk, nivîs û fîlmên li ser vê trajediyê, berî çend salan li vî welatî bahozeke rastîn rakir û vê yekê rê li ber şikandina gelek tabûyan vekir.

Nivîskar diçe Polonyayeke weha ku bi saya hewildana hin dilsozên vê meseleyê, hin cih ne bi tenê dest bi rapêçana bîranîna qirkirinê, lê herwiha dest bi rapêçana bîranîna rûniştevanên xwe yên cihû jî dikin. Dîsa jî ev têkoşîna ji bo bîranînê li herêmê hê jî dijwartirîn kar e.

Potel bi diyardeyên aktuel ên antî-semîtîzmê ya li Polonyayê mijûl dibe. Ev, antî-semîtîzmeke xwerû ye, ji ber ku êdî li ser vê erdê cihû nemane. Potel rola mezin a muxalefeta demokratîk a di zindîkirina dîroka cihûyan de destnîşan dike, lê rola veguherîna aborî a di cihvegirtina vê antî-semîtîzma li cem beşekî qurbanên vîraja neo-lîberal de ku mûxalefet ji vê bi temamî berpirs bû, hilnade dest. Dîrok dîsa jî nikare xwe ji polîtîkayê rizgar bike.

**Werger ji fransî**
**Aynur Bozkurt**

* Şoa: Ev peyva îbranî ku tê maneya "felaket"ê, organîzeya tunekirina cihûyan, a di Şerê Duyemîn ê Cîhanê de ji aliyê naziyan ve, tê destnîşankirin.

(1) Jean-Charles Szurek û Annette Wieviorka (di bin berpirsiyariya), *Cihû û Polonî, 1939-2008*, Albin Michel, Paris, 2009, 527 rûpel, 25 Euro.

(2) Jean-Yves Potel, *Dawiya bêgunehiyê. Polonya li hemberî raburdiya xwe ya cihû*, Autrement, Paris, 2009, 287 rûpel, 22 Euro.

SİYASET; EWRÛPA, TİRKİYE, KURDİSTAN

# YE û pirsgirêka kurd a li Tirkiyeyê

NEBÎ KESEN *

Pirsgirêka kurd ji bo bernameya siyaseta derve ya Tirkiyeyê her ku diçe girîngtir dibe. Ev pirsgirêk di heman demê de di gel pêvajoya endamtiya Tirkiyeyê ya Yekîtiya Ewrûpayê (YE) jî li hev bandor dikin. Ji aliyekî ve pirsgirêka kurd wek arîşeyeke navxweyî ya Tirkiyeyê dikeve bin bandora reformên YE'yê, ji aliyê din ve jî di çarçova peywendiyên Tirkiye û YE'yê de pirsgirêk bi xwe dibe hîmeke bitesîr.

Tirkiye bi berendamtiya xwe gihaye qonaxa dawîn a pêvajoya ku bi peymana yekbûnê di 1'ê rêbendana sala 1964'an de ji bo nêzîkbûna YE'yê dest pê kiribû. Mebesta dîdar û hevdîtinên ku di kanûna 2005'an de dest pê kirin ew e ku Tirkiye di warê hiqûqî, siyasî û aborî de ji bo armanca endambûnê ya amajekirî û ji her du aliyan ve xwestî amade bike. Li gel dîtina fermî ya Tirkiyeyê ya ku diangêje ku ev arîşe arîşeyeke terorîzma cudaxwaz e, pirsgirêka kurd di ser riya endamtiya Tirkiyeyê de ji ber alozî û asoya xwe ya navnetewî astengeke mezin e. Hewldanên 45 salî yên ji bo endamtiya YE'yê, hêj dikarin ji ber nearambûna rewşa welatî ya siyasî û aborî, ku sedema wê jî dijwariya pirsgirêka kurd e, têk biçin.


HASAN HÜSEYİN DEVECİ – "Mosaîk" (2004)

Çareseriya Ewrûpa ya pirsgirêka kurd a li Tirkiyeyê, di nav pêvajoya dîdaran de, vê gavê başkirina rewşa kurdan a civakî, çandî û aborî ji xwe re dike armanc. Bi sedema aloziya pirsgirêka kurd û karîgeriya wê ya li seranserê Tirkiyeyê, divê YE hêj di nav pêvajoya hevdîtinan de li derfet û amûran bigere da ku çareseriyeke aştiyane ya mayînde ji bo vê arîşeya siyasî peyde bike. Çawa be, pirsgirêka kurd nema meseleyeke Tirkiyeyê ya navxweyî ye, lê belê ji roja ku Tirkiye wek berendam hate destnîşankirin ve, yek ji wan pirsan e ku ji bo endambûna Tirkiyeyê, divê heta dûmahiya dîdarên endamtiyê bê bersivandin. Ji ber vê çendê pirsgirêka kurd her wisa xwezîyeke Yekîtiya Ewrûpayê ye jî. Bi qasî ku çi hêzeke din a navnetewî nikare, YE dikare bi yekserî alîkariya çareserkirina pirsgirêka kurd a li Tirkiyeyê bike. Têkiliyên dualî yên bi dehsalane, hevbeşî û daxwaza endamtiya Tirkiyeyê ya Yekîtiya Ewrûpayê, girîngtirîn bingeh in ku bandora YE'yê li ser çareserkirina arîşê hêsan û gengaz dikin.

## Guherîna stratejiyê pêwîst e

Yekîtiya Ewrûpayê hêj amade naxuye, bi têgeheke herêmî û li gel amadekariyên beşdariya Tirkiyeyê, ji bo pirsgirêka kurd stratejiyeke çareser darêje. Ji bo vê yekê divê du angaştên girîng bên kirpandin. Ya yekemîn, ji bo dabînkirina demokrasiyeke ewrûpî ya nûjen li Tirkiyeyê pirsgirêka kurd girîngiyeke mezin heye. "Dema ramanên heyî yên di der bare pirsgirêka kurd de bi awayekî tundraw biguherin, gelê kurd bi mafên xwe bê nasîn û bi çalakî bibe beşeke çareseriyê, bi tenê hinge li Tirkiyeyê demokratîzebûn û mafên mirovan gengaz dibin." Ya duyemîn jî, hem dabînbûyîna aştî û hevsengiya li Tirkiyeyê, hem jî ya li Tirkiyeyê, ewqas bi pirsgirêka kurd ve girêdayî ne ku, eger YE pirsgirêka kurd careke din paşguh bike, wê ziyan hem bigîje berjewendiyên derveyî û ewlehî, hem jî berjewendiyên aborî.

Dema hemû beşên girîng ên arîşeyê wekî hêzên herêmî û navnetewî û nêrînên cuda yên her du aliyan bên pêşçavkirin, bingehên strajiyeke rastbîn a YE'yê jî durist dibin. Di vî warî de ji şîretên gelemper wêdetir, bipêşvebirina çareseriyên rastbîn ji bo pirsgirêkê pêwîst e. Siyaseta YE'yê ya kurd a heta vê rojê, ji sedemên cur bi cur wek stratejiyeke (nû) ji bo çareserkirina pirsgirêkê ne bikêrhatî ye.

Ji aliyekî ve ji hêla saziyên YE'yê ve li pirsgirêka kurd bi giştî di çarçova mafên mirovan û mafên kêmnetewan de tê nêrîn. Girêdayî pirsgirêkên amadehiyên beşdariya Tirkiyeyê jî, pirsgirêka kurd bi tenê bi awayekî nerasterast tê bilêvkirin. *"Têgeha YE'yê ya çareseriya pirsgirêka kurd bi tenê dabînbûyîna mafên mirovan ên takekesî, misogerbûyîna mafên çandî û başkirina rewşa civakî mebest dike."*

Ji aliyê din ve jî hinek dewletên endam, dema peywendiyên xwe yên siyasî û aborî yên li gel Tirkiyeyê dikevin bin metirsiyê, di pirsgirêka kurd de bi dudilî tevdigerin. Kêmasiyeke din ya siyaseta YE'yê ya kurd jî ew e ku dezgehên YE'yê ji ber xatirê Tirkiyê, helwestên xwe dixin bin bandora wê. Her wisa destnîşankirina "Partiya Karkerên Kurdistan" (PKK) wek rêxistineke teroristî jî heye. Lê siyase-

* *Doktorê zanistiya siyasî, aborînas û lêkolîner.*

www.arsivakurdi.org

teke kurd a xweser û ji bin têkiliyên Tirkiyeyê serbixwebûyî, ji bo stratejiyeke serkeftî ya çareseriyê di mijara pirsgirêka kurd de jêneger e.

Tirkiye û kurd wê heta çi radeyê amade bin, xalên ku divê ji aliyê YE'yê ve bên avakirin, pesend bikin, bi şert û mercên hundirîn û navnetewî yên têkildarî arîşê ve girêdayî ye. Di vê têgehê de helwesteke stratejîk a YE'yê ya ku hemû bingehên girîng ên pirsgirêka kurd bihewîne, dikare bi awayekî erênî, heta bi awayekî biryarder jî bandora xwe li çareseriyeke dualî bike. Çawa be çareserkirina pirsgirêka kurd bi rûxandina tundraw a pergalê wekî li Îraqê, di demên pêş de ne gengaz e. Çareseriyeke ji çend gavên ku li ser hev ava dibin pêk tê, yekane rêka rastbîn e û divê ji stratejiya ewrûpî re mîna bingehekê bê danîn.

## Nasîn û destnîşankirina fermî ya hebûna kurdan li asta YE'yê

Di destnîşankirina stratejiya çareseriyê ya ewrûpî de cara pêşîn pêwîst e, têgeha YE'yê ya ku di pirsgirêka kurd bi tenê wek pirsgirêkeke mafên mirov û kêmneteweyan digihîje, bi şêweyekî bingehîn bê sererastkirin. Li gel rastiyên nijadî û erdnîgarî, gelê kurd gihîştiye wê qonaxê ku pêwîst e ji aliyê YE'yê ve wek gelekî serbixwe, ango wek netew bê nasîn. Tevî ku kurd heta niha nebûne dewlet û li Tirkiyeyê ji rewşeke fermî bêpar in, nabe ku Yekîtiya Ewrûpayê di der barê vê pirsgirêkê de bêdeng bimîne û nasnameya kurdan a netewî piştguh bike. Bi vê çendê rê li ber boçûna fermî ya Tirkiyeyê ya mandelekirina nasnameya netewî li asta Yekîtiya Ewrûpayê jî tê vekirin. Bi rastiya ku dezgehên YE'yê di hemû belgename û helwestnameyên xwe de ji bo binavkirinê li şûna Kurdistan yan herêma kurdan têgehên wek ''başûrê rojhilat û rojhilata Tirkiyeyê'' bi kar tînin, bi eşkere tê pêş çavan ku YE siyaseta xwe ya kurd dispêre bîrdoziya dewleta tirk a ku wekî hate peyitandin, yek ji sedemên pirsgirêkê ye.

Di gel nasîna kurdan a wek netew, encamên çareserane pêk tên. Wekî ku mafê her gelî ye, divê mafê xweseriyê ji kurdan re jî bê dabînkirin. Ev mafê xweseriyê dikare di nav dewleteke cuda de (cudakirin) yan jî di sazûmaneke federal de bê pêkanîn. Ev yek pirseke pir girîng û stratejîk e û divê YE helwesta xwe bigire, bêyî ku zêde bikeve bin bandora Tirkiyeyê. Ji xwe Tirkiye ne amade ye nasnameyeke kurdî ya netewî binase, ne jî amade ye kurdan li Tirkiyeyê wek kêmnetew binase. Dawiya dawîn pêvajoyeke dûr û dirêj û lihevkirina her du aliyan li nav Tirkiyeyê wê li ser awayê bikaranîna mafê xweseriyê biryar bidin. Eger YE helwesta xwe biguherîne û kurdan wek neteweyeke bi mafê xweseriyê binase, li gel hêrs û nerazîbûna Tirkiyeyê, YE dikare bi nêrîneke demdirêj siyaseta Tirkiyeyê ya kurd ber bi guherînê ve bajo.

Beşeke stratejiya nû ya YE'yê ya ku divê li ser nasîna nasnameya netewî bê honandin, ji têkiliyên li gel kurdan pêk tê. Piştî destpêka dîdarên beşdariyê jî, heta wê rojê derfetên rêxistinî peyde nebûne ku ji bo peywendiyeke yekser a di navbera YE û aliyê kurd de jêneger in. YE'yê heta niha, saziyeke ku xwe bi taybetî mijûlî kurd û pirsgirêkê bike, ava nekiriye. Lê belê ev yek her çiqas ji bo dariştin û çalakkirina stratejiyeke nû a ji bo kurdan pêwîst be, her wisa ji bo berpeyvgirtina kurdan a sazûmanî jî girîng e.

## Rêbazên çareseriyan ên YE'yê yên di pêvajoya guherînê ya siyasî û aborî de

Eger YE di stratejiya xwe ya nû de cih bide rêbazên çareseriyê yên taybet bi armanca ku dezgeh û saziyên fermî yên Tirkiyeyê cigahî bike û avakirina dewleteke federal gengaz bike (di beşa jêrîn de bi hûrgilî tê ravekirin), YE dikare piştevaniya çareserkirina pirsgirêka kurd bike. Ji ber ku helwestên Tirkiye û kurdan ên li ser pirsgirêka kurd hem di binavkirin û têgihîştinê de, hem jî di rêbazên çareserkirinê de gelek ji hev cuda ne, bi vê çendê biryardan û biserkeftina çareseriyeke ewrûpî jî zehmet dibe.

Îdeolojiya dewletî ya Tirkiyeyê ya ku pirsgirêka kurd wek pirsgirêka ''terorê'' bi nav dike û rê li ber mafên girseyî yên kurdan digire, di çarçova alîkariya YE'yê de, wek astengiya herî mezin dixuye. Her çiqas pêvajoya nêzîkahiyê çend mafên çandî li kurdan dibexşe jî, hêj têgihîştineke nû û guherînên di der bare pirsgirêka kurd de nayên dîtin. Ji hêlekê ve Tirkiye hez dike ku rewşa heyî di pêvajoya dîdaran de neguhere, ji hêla din ve kurd xwe ji bo çareseriyeke dualî ya bi endamtiya Yekîtiya Ewrûpayê ve girêdayî, amade nîşan didin.

Rola YE'yê wek navbeynkariya arîşê ji aliyê kurdan ve nayê mandelekirin, berevajiyê vê çendê tê xwestin. Bi vî awayî eger ji aliyê YE'yê ve nexşerêyek yan bernameyeke siyasî û aborî bê danîn, wê kurd û hemû şaxên Tirkiyeyê yên siyasî û civakî ku ji bo çareseriyeke aştiyane têdikoşin, piştgirî lê bikin. Hêjayî zanînê ye ku birêz Turgut Özal wek Serokkomarê Tirkiyeyê di serê salên 90'î de hewl da li beramberî kurdan siyaseteke dualî bimeşîne û di dezgehên dewletê de li ser pirsgirêka kurd nîqaşekê biafrîne, lê ji ber helwesta neyînî ya artêşê û hikûmeta Süleyman Demirel bi bin ket.

## Daxwazên kurdan

Bi guhertina stratejiya xwe ve, Yekîtiya Ewrûpayê dikare xwe bi daxwazên aliyê kurd ve mijûl bike. Aliyê kurd bi taybetî ji PKK û DTP'ê pêk tê ku vê gavê çareseriyan bi tenê pêşniyaz dike. Wek mînak mirov dikare daxuyaniyeke 200 kesayetiyên kurd a sala 2004'an bîne pêş çavan ku tê de nirxandin û daxwazên kurdan tên ziman.

Pêvajoya endamtiya YE'yê ji bo tirk û kurdan rê li ber gelek keysên mezin vedike û bi riya çareseriyeke aştiyane ya di nav sînorên heyî de, ji bo aştiyê gelek derfetan pêşkêş dike. Pêwîst e ku girîngiya vê firsendê baş bê zanîn.

Bi baweriya navîşkerên vê daxuyaniya jorîn yên ku rengên siyasî û çandî yên civata kurd dinimînin, ji bo lihevkirin û aştiyeke wisa pêdivî ye ku ev daxwaz bêne bicihanîn:

- Divê makezagoneke nû û demokrat ku tê de hebûna gelê kurd tê nasîn û perwerde, çapemenî û weşanên bi kurdî tên parastin, hebe. Divê her weha mafê damezrandina komele, sazî û hizbên ku wek nûnerên çand û siyasetê azadiya wan a ramanan misoger e, tê de bê bicihkirin.
- Wek rêbazeke bawerdêr, efûyeke siyasî ya gelemper pêwîst e, da ku her du alî li hev bên û bi awayekî mayînde dev ji tundî û şerê çekdarî berdin.
- Divê ji bo herêma kurdan li gel alîkariya Yekîtiya Ewrûpayê bernameyeke taybet a aborî bê danîn, da li ser vê hîmê gundên ku di salên 90'an de hatin hilweşandin, ji nû ve bên avakirin û kurdên mişextî ji bo vegerê bêne teşwîqkirin.

Daxwazên jorîn ên kurdan di warê çareseriya siyasî û aborî de ji bo Yekîtiya Ewrûpayê girîng in, lewra ev daxwaz yekîtiya komara Tirkiyeyê naxin metirsiyê û li gel dîtina raya giştî ya Tirkiyeyê jî ahengdar in. Divê nûnertî û serkeftina pêşniyazên çareseriyên bi vî rengî di rêya hevdîtin û dîdaran de bê dabînkirin. Her wisa wekî ji aliyê Parlamena Ewrûpayê hate pêşniyazkirin, eger YE civîneke di derbarê kurdan de bi rêbixe ku tê de hem Tirkiye, hem jî kurd û her wisa dewletên din ên mîna DYA û Îraq / Başûrê Kurdistanê beşdarî bikin, gengaz e ku YE navbeynkariyeke çalak pêşan bide.

## Stratejiya bihêzkirinê wek rêbaza siyaseta kurd a YE'yê

Her wisa stratejiya bihêzkirinê ya ewrûpî ku nemaze ji piştgiriya madî û bipêşxistina têkiliyên siyasî pêk tê, dikare ji bo biserkeftina pêşniyazên ewrûpî wek amûr bê bikaranîn. Divê bi taybetî alîkariyên madî yên ji bo beşdariyê bi şert û mercên amajekirî ve bên girêdan, da ku pirsgirêka kurd li gorî daxwazên jorîn bê çareserkirin û bipêşveçûna bakûrê Kurdistanê bibe peywira sereke ya Tirkiyeyê. Alîkariyên rasterast ên ji bo rêveberiyên heremî jî amûreke din ne ku divê bên domandin. Şaredarê Amedê, birêz Osman Baydemir, girîngiya vê alîkariyê ji bo herêmên kurdan wisa bi bîr tine: ''Veguhastina fonên ku di çarçova piştevaniyeke taybet de ji YE'yê hatin, ji bo armancên bipêşvebirina aboriyê û ji bo berfirehkirina desthilatiyên herêmî yên di warê bikaranîna van alîkariyan de, gelek watedar û girîng e.''

**Werger ji almanî**
**Emrah Kocahal**

**Çavkanî:**

• Baydemir, Osman. 2005. *Städtische und regionale sozioökonomische Probleme. Demokratisierung in der Türkei und die Kurdenfrage. Vorschläge und Erwartungen hinsichtlich des Türkei-EU-Verhandlungsprozesses*. Unveröffentlichtes Manuskript. Diyarbakir: 1.9.2005.

• Dietert, Amke. 2006. ''Menschen- und Minderheitenrechte: die Türkei und die europäischen Standards." http://www.bpb.de/themen/T3SFAJ.html, Zugriff am 16.05.2006.

• Europäische Kommission. 2005. ''Türkei. Fortschrittsbericht 2005" KOM (2005) 561 final. Brüssel. http://www.europa.eu.int/comm/enlargement/report_2005/package/sec_1426_final_de_progres_report_tr.pdf Zugriff am 30.03.2006.

• Gürbey, Gülistan. 1997. ''Autonomie-Option zur friedlichen Beilegung des Kurdenkonflikts in der Türkei." *HSFK-Report 5*/1997. Frankfurt am Main: Hessische Stiftung Friedens- und Konflikt- forschung.

• Gürbey, Gülistan. 2005. Außenpolitik in defekten Demokratien. Gesellschaftliche Anforderungen und Entscheidungsprozesse in der Türkei 1983-1993. Frankfurt am Main: Campus Verlag.

• Kesen, Nebi. 2009 a. Die Kurdenfrage im Kontext des Beitritts der Türkei zur Europäischen Union. Baden-Baden: Nomos Verlag

• Kesen, Nebi. 2009 b. Kurdenfrage in der Türkei – Eine aktuelle Bestandsaufnahme. *Orient III/2009, 37-47.* Berlin: Deutsche Orient-Stiftung.

• Kramer, Heinz. 2006. ''Unruhen im türkischen Kurdengebiet." *SWP-Aktuell* 20/2005. Berlin: Stiftung Wissenschaft und Politik.

• Navend. 2006. ''Deklaration: Was fordern die Kurden in der Türkei?" http://www.navend. de, Zugriff am 30.6.2006.

• Wedel, Heidi. 2006. ''Menschen- und Minderheitenrechte in der Türkei auf dem Weg in die EU." 2006. *Europa und die Türkei* hrsg. von Siegfried Frech und Mehmet Öcal. Schwalbach/Ts.: Wochenschau Verlag, 201-229.

www.arsivakurd.org

BİBÎRANÎN

# Du welat- Du komkujî

DOĞAN AKHANLI *

Ger ku ez koçî Almanyayê nebûma, bi îhtîmaleke mezin, min ê têkiliya di navbera pêşeroja xwe, bîranînên xwe, têkiliya di navbera pêşeroj û bîranînên kurd, ermenî, elewî, mûsewî û rûman de, fêm nekiribûya. Ne mimkûn bû ku min cudatiya di navbera wan de fêm bikiraya. Wê tu haya min ji mînaka “baxçevan-baxçe” tunebûya, min ê zû bi zû fêm nekira ku tişta bû sedema komkujiya ermeniyan a 1915’an “ne serhildana ermeniyan e”, berevajî vê, sedem projeya avakirina ‘’Dewleta tirk- misliman-sûnî” ya Jon Tirkan e. (Prof. Dr. Mihran Dabağ) Bi avakirina “baxçeyê” bi navê ‘’Komara Tirkiyeyê’’ re, min ê fêm nekiribûya baxçevan çima kulîlkên kurdan dişikêne, û min ê nikarîbûya komkujiya “Dêrsim 38” zû bi zû weke jenosîd qebûl bikiraya. Digel asîmîlasyona bêrehm û radîkal min ê zû bi zû fêm nekira ka Kurdan çima nedixwast bibin tirk û li ber xwe didan.

Dema ku min koçî Almanyayê kir, min di derheqê komkujiya 1915’an ku bû sedema qirkirina ermeniyan tu pirtûkeke ku derew tê de tune be nexwendibû. Lê min bi tecrûbeyên xwe dizanî ku civaka tirk hafizeya xwe wenda kiriye û “bîranîn qedexe kiriye”. *(Mithat Sancar)* Hêj di ser re zêde wext derbas nebûbû, di dema cûntaya 1980’yê de pêncsed hezar kes hatin girtin, hema hema hemû rastî îşkenceyê hatin, bi hezaran ji wan hatin kuştin lê digel vê yekê jî ev tişt li ber çavên herkesî dihatin înkarkirin. Lewre, digotin Tirkiyeyê peymana navnetewî ku îşkenceyê qedexe dike îmze kiriye û îşkence li gorî qanûnan qedexe ye! Lê em hêj li jiyanê bûn û me bîranînên xwe di quncikên nepenî yên binhişê xwe de veşartibin jî; mesela dema ku derî şidî tê girtin, an jî dema ronahî bê tefandin, yek çêrî yekî bike, dema ku di fîlman de şeqamekê li jinekê bidin, dema ku zaroka jineke ducanî ji ber wê biçe, dema ku dengê zarokekî ku digirî bê guhê me, dema ku mêrikek serxweş di otobosê de li kêleka me rûnê, em nikarin xwe li ber bîranînên xwe bigirin. Tu dixwazî bi riya bêhnê, dixwazî bi riya deng, wêneyan, dîmenên ku em naxwazin bêne bîra me, tim û daîm em ji cihê me dibirin û bi awayeke şilf û tazî diavêtin nava civakeke ku hemû mêr in û biyanî ne. Me nedixwest ku em bizanibin ku ev dîmen wê tu caran ji ber çavên me, ji hişên me neçin. Tekane riya berxwedanê jî ev bû; divê me hewil bidaya ku em bikaribin bi bîranînên xwe re bijîn. Almanyaya ku ez koçberî wir bûm û welatê jidayîkbûna min Tirkiye, bi sedan sal bûn ku dostên hev bûn. Dema ku Kraliyeta Prûsyayê, Mareşal Helmut Graf von Moltke di salên 1835-1819’an de artêşa osmanî modernîze kir, di heman demê de di têkbirina serhildanên kurdan de jî roleke sereke girtibû. Dema ku di Şerê Yekemîn ê Cîhanê de Cemiyeta Îttihat û Terakiyê li hemberî ermeniyan komkujiya ewil a sedsalê pêk dianî, Almanya dîsa dostê wan bû.

Di sala 1938’an de li Almanyayê zagonên nijadperest ji zû ve ketibûn merîyetê, roja 9/10’ê îlona ku bi navê “Şeva Krîstal” kete dîrokê, bi bernameya cihûyan, hatibû eşkerekirin ku li Almanyayê ji cihûyan re cih tune ye. Tam wê çaxê li Dêrsimê kurd rastî komkujiyan tên, zarokên ku malbatên wan hatine kuştin bi taybetî jî zarokên keç weke ewlad didin leşkerên payebilind û Atatürk “Mîsyonerên tirk” dişandin Rojhilatê. (1)

Pêşeroja herdu welatan jî bi travmayan tijî bû. Lê digel hevkariya sûcê dîrokî, di navbera herdu welatan de cudahiyên sereke jî hebûn. Almanya li ser sûcên xwe yên dîrokî disekinî, berpirsîyariya xwe bi cih dianî, ev rûyê wê yê xweşik bû. Lê digel ku komkujiya ermeniyan (2) li ser rûyê cîhanê ji du komkujiyan hebeke sereke bû û bi awayeke zanyarî pir baş hatibû lêkolînkirin jî Tirkiyeyê ev komkujî înkar dikir û nêzî rûbirûbûyinê nedibû. (3) Yên ku hewil didin Tirkiye bi pêşeroja xwe re rûberîhev be jî tê de, rewşenbîrên Tirkiyeyê jî xwe ji bikaranîna peyva “komkujiyê” bi dûr dixin. Halbûkî peyva komkujiyê ji hovîtiya bûyerê zêdetir, bi karekterê bûyerê re têkildar e. Ji ber vê yekê ye ku bûyera 20 milyon gundiyên Çînê ku di salên 1960’î de ji ber polîtîkaya Mao ji birçîna mirin, weke komkujî nehate binavkirin lê li Srebrenîcayê heft hezar bosnayî hatin qetilkirin, ev weke komkujî hate binavkirin. Piraniya hincetên kesên ku komkujî înkar dikin ev e; dibêjin Tehcîra ermeniyan beriya Peymana Komkujiyê ku di 1948’an de pêk hat qewimiye. Pir eşkere ye ku ev hincetek pir eletewş e. Çimkî Holocaust jî di 1941-45’an de pêk hatiye lê ev yek tu caran nayê hişê dîroknas, hiqûqnas û polîtîknasên tirk ku ji her tiştî haydar in. Rastî ev e; rave û peymanên komkujiyê bi vekolîna Komkujiya ermeniyan hatiye pêşxistin.



*Abideya komkujiya ermeniyan li Erîwanê (Taybet)*

## Têgeha komkujiyê û Lemkîn

Têgeha komkujiyê cara ewil di sala 1944’an de, ji aliyê Paphael Lemkînê polonî ve (1900-1959) ve hate bikaranîn. (4) Darizandinên ‘’Dîwan-i Harb’’ ku di 1919’an de li Stenbolê pêk hat û têgeha “Sûcê ku li dijî mirovahiyê hatiye kirin” li wir hate bikaranîn, hêj di nîvesalên 20’î de bala Lemkîn kişandibû. Ev darizandin di 5’ê Tîrmeha 1919’an de bi encam bû. Bersûcên ku dihatin darizandin, bi sûcê “Tirkiyeyê xistine nava Şerê Yekemîn ê Cîhanê û şikestek li ermeniyan xistine” hatin sûcdarkirin. Enver, Talat, Cemal Paşa, Dr. Nazım, li gorî paragrafa 1’emîn a xala 45’an bi sêdarê hatin mehkûmkirin. (Dr. Bahaaddin Şakir jî di Doza Xerpêtê de bi sêdarê hate mehkûmkirin.) Endamên din ên desteya wezîran her yek ji wan bi deh sal cezayê “bêrê” hatin mehkûmkirin. Sê kes ji wan hatin darvekirin. Nusredê Ruhayî, (Li Ruhayê navê wî li dibistanekê danîne) Qeymeqam Kemal (Li Boğazlayanê li ser navê wî abîde danîne), Fermandarê Cendirmeyan ê Erzinganê Hafiz Abdullah Avni (Hayran Baba). (5)

** Nivîskar, romanûs.*

www.arsivakurdi.org

Di sala ku Lemkîn dest bi xwendina xwe ya hiqûqê kir, organîzatorê nefîya Ermeniyan, Wekîlê Dahîliyeyê û Serokwezîr Talat Paşa di 15'ê adara 1921'an de li Berlînê, ji aliyê Tehlîrîanê Soghomon ve hate kuştin. Lemkîn, piştî wê bi salan di derbarê bûyerê de ev şîrove kir: "Doza Talat Paşa ya 1921'an pir tişt hîn kirin. Mêrikek ku dayika wî di komkujiyê de hatiye kuştin (Soghomon Tehlîrîan) Talat Paşa dikuje. Binêrin ez weke parêzerekî fikirîm ku, divê sûcek ne ji aliyê qurbanî ve ji aliyê dadgehê ve, ji aliyê hiqûqa netewî ve bê cezakirin." (6) Lemkîn, tesîra Tehcîra ermeniyan a li ser Peymana Komkujiyê bi van gotinan tîne zimên: "Êşa jin, mêr û zarokên ermenî ku avêtin çemê Firatê û di riya Der-Es-Sorê re hatin qetilkirin, bûn riya qebûlkirinê ya amadekariya Peymana Komkujiyê." (7) Têgeha komkujiyê di 18'ê Cotmeha 1945'an de, di angaştnameyên Dadgeha Nûrbergê de tê bikaranîn. Yekemîn belgeya fermî ku tê zanîn ev e. (8) Raphael Lemkîn ku têgeha komkujiyê bi kar anî û peymana komkujiyê bi saya serê wî çêbû, ji xeynî bira, birajin û du biraziyên xwe, hemû xizmên xwe di Holocaustê de ji dest da. Lemkînê ku salên xwe yên dawî di nava xizaniyê de derbas kirin, nekarî weşanxaneyek peyda bikiraya ku pirtûka wî ya sê cîld a bi navê "Dîroka Komkujiyê" çap bikiraya. (9) Li ser kêla Lemkînê ku di 1959'an de li New Yorkê di nava xizaniyê de mir, wiha dinivîse: "Father of the Genocide Convention / Bavê Peymana Komkujiyê".



*Abîdeya Holocaust ya cihûyan li Berlînê (LMD kurdî)*

## Tecrûbeya alman

Alman zû bi zû nekarîn bi Holacausta ku sûcê herî mezin û tevlihev ê li dijî mirovahiyê ye re bên rûberî hev. Di biryara 256 rûpelan a Dadgeha Nûrnbergê de ku sûcdarên şer ên Nazî tê de dihatin darizandin, li ser îmhakirina cihûyên Ewrûpayê tenê sê rûpel tê nivîsandin. Yanî di rûbirûbûyina almanan a bi dîroka xwe re, rola Dadgehên Nûrnbergê pir bi sînor e. Di 1952'an de ji bo ku Almanya ji perwerdehiya xwe ya civakî û pêşeroja xwe ya Naziyetê bifilite, "Bundeszentrale für politische Bildung" (Navenda Perwerdehiya Siyasî) tê avakirin. Ev navenda ku îro jî hebûna xwe didomîne, yek ji saziya herî sereke ye ku bi saya wê Almanya bi pêşeroja xwe re hate rûberî hev. Di 30'ê Nîsana 1958'an de, organîzasyona bi navê ASF- Aktion Sühnezeichen Friedensdienste li Berlînê hate avakirin. Ev organîzasyona ku hêj jî hebûna xwe didomîne, her sal ji bo welatên ku Almanya bûn sedema hilweşîna wan her sal "dildarên aştiyê" dişîne. Danezana Sazûmaniyê bi peyva "Em alman" dest pê dike: ''Di Şerê Duyemîn ê Cîhanê de, em bûn sûcdarên gunehên gelek mezin ku mirov nikare bi tu êşên ku mirovahiyê kişandiye re muqayese bike. Bi serhilderiyeke heramî em li dijî xwedê derketin, me bi milyonan cihû qetil kir. Yên ku vî sûcî nekirin jî ji bo astengkirina vî sûcî neketin nava hewldanên mezin." Di dawiya danezanê bangewaziyeke wiha cih digre: "Ji bo gelên ku di bin zordariya me de êş kişandine ji bo ku bibe aştiyeke biçûk, kefareteke biçûk, em ji wan ricayeke wiha dikin; destûr bidin ku em bi destê xwe, bi çavkaniyên xwe, ji bo we gundek, dibistanek, nexweşxaneyek, dêrek ava bikin an jî di karekî ji bo fêdeya cemaweriyê de bixebitin… Em rica dikin (Ji hikûmetan), van hewldanên me nenepixînin û weke tazmîna sûcên me fahm nekin. Em tenê dixwazin xizmeta me qebûl bikin û ji bo daxwaza me ya aştî û xwe efûkirinê bibin alîkar." (10) Ji salên 1960'î û bi şûn de rûbirûbûyin lezgîntir bû. Teza Fîlozof Walter Benjamîn ku ji tirsa ku wî teslîmê Naziyan bikin dawî li jiyana xwe anî rast derket. Çimkî wî digot ''ne tenê îro û sibê, mirov dikare dohê jî biguherîne.''

Alman hînê "şermê" dibin. Lê şerma Auschwîtz a vî welatê fîlozof û helbestvanan ewqas mezin e ku, çokdanîna Willy Brand a li ber abîdeya Berxwedana Gettoya Varşovayê têr nake. Bi lêborînxwestinê, bi hesasiyetên ku li hemberî Neo-Naziyan û rastgirên radîkal bi pêş xistine namînin. Biwêj û peyvên nijadperest ji zimanê almanî avêtin, lê dîsa nesekinîn û ev yek têr nedîtin. Kampên komelî ên Auschwîtz Buchenwald, Dachau, Chelmo, Majdanek, Ravensbürück, Belzek, Sobîbor, Trebîlanka, navendên pirsiyarîyê yên berê yên Gestapoyê, veguherandin peykerxane, goristana abîde û mûzeyan. Li ser rêyan kevirên ku li ser -bo nimûne- "Malbata Beharê rûdinişt / 12 Berfanbar 1942", bo Auschwîtzê hatin nefîkirin / Wenda bûn" dinivîse, raxistin û bi hezaran nivîsên wiha. Ji bo ku qurbanî û kesên nemirine rastî heqaretê neyên, her cure pêşîlêgirtinên zagonî digrin. Li Almanyaya ku veguheriye welatê bîranînê, kirin û perwerdehiyên rûbirûbûyinê yên li ser Holacaustê ne tenê li dibistanan, li hemû fîrmayên mezin ku berê bi Naziyan re hevkarî kirine, li klûbên sporê, heta parlamentoyê û heta hemû sazî û dezgehên civakê belav bûye. Ger îro li Ewrûpayê rayên herî kêm ên nijadperestiyê li Almanyayê têne sitandin, di vir de rola rûbirûbûyinê bi pêşerojê re heye, ev tecrûbe heye. Tecrûbeya bîranînê ya Almanyayê, mîsogeriya hafizeya erênî ya paşerojê ye û ne tenê ji bo Almanyayê, di asta gerdûnî de jî ev tişt girîng e.

## Tecrûbeya tirk

Di 5'ê îlona 1915'an de, nûçegihanê Kölnîsche Zeîtung ji Tyszkayê bo Wezareta Karê Derve ya Almanyayê re, ji Stenbolê bi mora ''pir nepenî ye'' vê peyamê dişîne: "Ji aliyê ermeniyan ve ji min re, rastiyên jêr ên derbarê taqîbata ermeniyan de tên vegotin. Ev agahî piranî teqez û bi temamî rast in. Li aliyê din jî di warê Pirsgirêka ermeniyan de tirkên ku mirov bikaribe bi wan re biaxive pir kêm in, mirovên zana ku dinya dîtine jî hemû kesî weke hev dinirxînin, weke naqaratê heman tiştî dibêjin û kîn û nefretê sor dikin: "Divê hemû ermenî bêne kuştin, ew xayîn in!" (11) Ev belge nîşan dide ku tecrûbeya tirk weke tehdît, nefret û înkarê maye. Eynî weke rojên komkujiyê, li hemberî mirovên me yên ku li Tirkiyeyê dijîn lê ne tirk û misilman in nefret li pêş e. Ev nefret, gotina "alman wê cihûyan ji ber Auschwîtzê tu caran efû nekin" a psîkanalîstê îsraîlî Zvî Rex tîne hişê mirov. Çimkî cihû kîtabeyên zindî bûn û tim sûcên almanan bi bîra wan dixistin. Alman digel kîtabeyên zindî bi awayekî pir hesas helwêstek bi pêş xistin, gavên girîng avêtin, digel Auschwîtzê, ji bo ku sûcên xwe yên li hemberî cihûyan telafî bikin ji xwe re rê dîtin, lê em hêj ji ber kampên koçberiyê, çolên Der-Es-Sorê, ermenî efû nakin. Dema ku ev ne efûkirin bi heriya înkar û derewê tê dagirtin, em ne tenê bi awayeke ruhî, em bi awayeke fîîlî jî kujêr diafirîn. Ji ber ku hesaba sûcê herî mezin ê dîroka modern a Tirkiyeyê nehate dayîn, ji ber ku mesafe nexistin navbera xwe û sûcan, ne tenê dewlet û saziyên wê, civak bi xwe jî tim vediguhere girseyeke ku kuştinan pêk tîne û ber bi xwekuştinê ve diçe. Hewil didin heman belgeyê bi awayekî din bixwînin. Di şûna peyva "ermenî" de, ger peyva "kurd" bê bikaranîn, wê bê wê wateyê ku pêşeroj nemirîye, bi gotina Faulkner, "Ne pêşeroj e jî", wê bi awayekî eşkere derkeve holê ku em behsa dîrokê nakin, behsa îro dikin.

---

[1] Ji bo detayan: Nezahat Gündoğan ile söyleşi, Sabah, 2 Ekim 2009; Ayşe Hür: ''Avar, Allahaşkına kızımı götürme!'', Taraf, 04.10.2009

[2] Mithat Sancar, Hafıza, Adalet ve yaşamın değersizliği, Taraf, 26.03.2009

[3] Mithat Sancar, Hafıza, Adalet ve yaşamın değersizliği, Taraf, 26.03.2009

[4] Lemkin, Raphael: Axis Rule in Occupied Europe: Laws of Occupation, Analysis of Government, Proposals for Redress. Washington D.C. 1944. Reseniya Pirtûkê, li Pirtûkxaneya Raphael Lemkin heye: Navnîşan: Allerwetshaus, Körnerstr, 77-79, Köln)

[5] H. V. Dadrian, Ulusal ve Uluslarası Hukukun Sorunları, Jenosîd, İstanbul Belge Yayınları. 96, û Akçam, Taner, Armenien und der Völkermord. Die Istanbuler Prozesse und die türkische Nationalbewegung. Hamburg 1996.

[6] Sassounian, Harut: Lemkin Discusses Armenian Genocide In Newly-Found 1949 CBS Interview. In: The California Courier Dec. 8, 2005., Îngîlîziya jêderê: ''The trial of Talaat Pasha in 1921 in Berlin is very instructive. A man (Soghomon Tehlirian), whose mother was killed in the genocide, killed Talaat Pasha. … So he committed a crime. So, you see, as a lawyer, I thought that a crime should not be punished by the victims, but should be punished by a court, by a national law. ''

[7] Kieser, Hans-Lukas: Die armenische Tragödie. In: Weltwoche, Ausgabe 42/2006. Jêdera almanî: ''Die Leiden armenischer Männer, Frauen und Kinder, die in den Euphrat geworfen oder auf dem Weg nach Der Zor massakriert wurden, haben den Weg für die Annahme der UN-Genozidkonvention vorbereitet.''

[8] Bahrt Boris, Genozid, C.H.Beck, München 2006), r. 8, her wiha binêre: Ternon Yves, Der verbrecherische Staat. Vilkermord im 20. Jahrhundert, Hamburg 1996, r.34

[9] Bahrt Boris, Genozid, C.H.Beck, München 2006, r.8

[10] Ji bo reseniya nivîserê: Aktion Sühnezeichen Friedensdienste, aber man kann es einfach tun, r. 12-13, Gabrielle Kamarer, Göttingen2008)

[11] ''1915-09-05-DE-001/Çavkanî: PA-AA/R 14087; A 27887, pr. 24.9.1915 p.m.; Nivîsa Taybet /

www.arsivakurdi.org




*G-20 tû bixêr nehatî! (Carlos Amedo)*

CÎHAN

# Govenda "G"' yan

Lihevzêdebûna "G" yan nayê wateya redkirina hatina hejîna globalî ya pergala kapîtalîst ku qeyranên aborî, diravî, enerjiyî, xwedîkirinî û hawîrdorî tenê perçeyê wê ne? Endamên G-20'ê, ku 24 û 25'ê Îlonê li Pittsburgê kom bûn, dibin rêveberiya nû ya gerdûnê. Wan ne rewatiya hewce dikin, ne jî projeyeke jinûveguhertuna şiklê rêxistinkirina dinyaya topavêtî hene .

**Bernard Cassen** *

Gava ku bahsa ''G''yê tê kirin, lîsteyeke dûvdirêj zêde dibe. Îroj ji G-2 virve, -eger mirov Asambelêya Giştî ya Rêxistina Netewên Yekgirtî jî (NY) tevlî bike,- berbi G-192'an diçe! Ev zêdebûn nêz e. Piştî wendabûna Yekîtiya Sowyetan, a rast, tekane koma berbiçav a navnetewî û bi vê pêşdîtina çapemeniyê, ji aliyekî ve, bû G-77, û ji yê din, G-7 bû G-8 (li ferhengoka jêrê binerin). Li ser kaxizê, tişt pir hêsan bûn: Li hember komeke welatan a mezin ku jê re dibêjin ''welatên li ser rêya pêşketinê'', yê hin welatên ku di bin darê zora Washington û milê wê yê leşkerî de Rêxistina Peymana Atlantîka Bakur (NATO), ewê biryara karên dinyayê bidin, bêyî ku kesekî tu wekalet dabe wan bixwe.

Nobedarê pergaleke aborî ku ji berjewendiyên dezgehên navnetewî û yê fînansa global pêk tê, G-8, hat cihekî ku dijminatiya giştî bikişîne ser xwe. Ne ev tenê, rêveberiyên ku ew hişmendiya polîtîk parve dikin, gihîştine wê encamê. Lêbelê bi taybetî tevgêrên civakî û hemwelatî jî derexlaqiya vê kulûba dewlemendan tînin ziman. Di Tîrmeha 2001'ê, li Genesê, dijberî bi zordestiya polîsên Birêz Silvio Berlusconi ku li pey xwe, miriyek û bi sedan brîndar hiştin, gihîşt asta bilindtirîn.

Heşt sal û qeyraneke pergalî ya kapîtalîzmê ya vê dawiyê, civîna G-8'an a vê tîrmeha dawîn ku dîsa li Îtalyayê pêk hat, nebû sedema tavgêreke mezin a dijminayî. Dawiya dawîn, her kes pê dihesiya ku destê wan hinekî kin bûye û ku karên dinyayê divê bi asteke temsîlê ya bilindir bê guftûgokirin. Li aliyê din, organîzatoran tevdîra vexwendina ''G''yeke dinê, G-5'ê (Afrîkaya Bakur, Brêzilya, Çîn, Hindistan, Meksîka), ji bo ku wek G-13 (8+5), bi beşdarbûna Misirê re bû G-14, civînê çêbikin, stendibûn. Ji bilî hesibandina hevdîtinên bi rêveberên pênc welatên Afrîkayê, û hinek bi welatên din re (Awûstûralya, Korêya Başûr, Danîmarka û Endoneziya) rasterast tev li hevdîtinên amadeyî yên Konfêransa Netewên Yekgirtî ya derbarê veguhertina hewayê ku pêkanîna wê 7 heta 18'ê Berfanbarê li Kopenhaginê hatibû.

Di navbera 30'ê Mijdar û 2'ê Berfanbarê li Cenevê konfêransa heftan a wezîrên Rêxistina Bazirganî ya Dinyayê (RBD) ewê pêk bihata, bi rengekî G-153'yan ku niyeta wê gihîştina armancê sala 2010'an, bi rêza hevdîtinên bazirganî ji sala 2001'ê li Dohayê (Qetarê).

Wek avaçûnê, bêjî encam, wendabûna G-8'an bêveger xuya dike, du ''G''yên nû amade dibin ji bo rêvebirina dinyayê: G-20 û, bi awayekî dizî kakilê wê yê qewîn, G-2. G-20 li gorî stratêjiya hilbijartinên G-8'an tev digere: Her çi dibe bila bibe, bi cilûbergên nû neqişandî, û bi pejirandina ji aliyê duwanzde welatên nû, parastina modêla nêo-lîbêralîzmê li ser rûyê erdê. Her sê civînên wê yên pêş ku bi beşdarbûna serokên dewlet û desthilatdariyan pêk hatibûn (Mijdar 2008 Washington, Nîsan 2009 London, 24-25 Îlon Pittsburg), bi danezaneke dûvdirêj ya li ser tevdîrên birêvebirina qeyranê bi dawî bû. Lê bêyî tu tevdîrên rastîn ku tiştekî li ser kesî ferz bike.

G-2 (Çîn û Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê) di van demên nêz de, bi zimanê rojnamegeriyê. Eger di van rojên radîkal de- ''Çîn-Amerîka" (1) tê gotin jî- hewce nake ku mirov radeya vexwendina hevdîtinên du-salane di navbera Washington û Pêkînê de, biçûk bibîne. Heta vê rûniştina wan a nêz a 27 û 28'ê

* *Profesorê Zanîngeha 8 ya Parîsê*

Tîrmeha 2009'an li Paytexta Amerîka, mijar ''danûstendina aborî ya stratêjîk'' bû. Vê gavê mesele danûstendineke ''aborî û stratêjîk'' e. Ev ''û'' ya ku teze kete navberê, hemî ferqiyê diyar dike: Tevayiya dosyayên dinyayê, li ser maseya hevdîtinên navbera her du hûtan in. Û eger ev G-2 li hev bike, ewê G-20'ê bê zahmeteke mezin li pey xwe bikişkişîne.

## NY, li derve ma

Ev yek bi zerara mezin a qalibên bêhempa yên Yekîtiya Ewrûpayê (YE), ku dil dikir ev G-2 veguhere G-3'yan... A ku bêgûman giraniya aborî ya yekîtiyê piştrast bike, lê ku bi yek dengî axaftina bêkapasîte ya xwe ya qalibî, bi polîtîkî qedexe dike. Dewletên endam herî girîng ji xwemaliya G-8 û G-20'ê dilxweş in. Tu mêla wan a li ser xwexelaskirina ji fikrên Estonya, Komara Çekê, Polonya û hwd. ku ewê wek zêdaya zêde, a atlantîsî pêk werin tune ye, wek ku demeke nêz de wezîrê karê hundur ê Alman, ji Filehên Demokrat (CDU) Peter Altmaier digot: ''Welatên berfirehbûnê, ji ber sedemên aborî tevlî Yekîtiya Ewrûpayê bûn, lê belê biryarên xwe yên polîtîk bi Amerîkayê re distînin (2).'

Eger ev noqte di navbera endamên G-2, G-8 û G-20'an yekdengiyê çêdike, ev eşkere daxwaza li dervehiştina şiklê herî pir-endam û bi tevayî hiqûqî tekane ye di qada navnetewî de: G-192, ango sed û nod û du endamên NY'ê ne. Demeke nêz qewimîneke sabotajî bi înisiyatîfa Serokê Asamblêya Giştî ya Rêxistinê, Peder Miguel d`Escoto pûşpera 2009'an, li New Yorkê, bi konfêranseke Netewên Yekgirtî derbarê qeyrana darayî û aboriya dinyayê û bandora wê ya li ser pêşketinê, pêk hat (3). Belê hevdîtineke li ser mijareke bingehîn û jê wêdetir bi raporeke ji aliyê komisyoneke ku serokê wê Joseph Stiglitzê xwediyê Xelata Nobelê ya Aboriyê ye, hatiye amadekirin. Ji bo çi, serokên dewlet û yên rêveberiyan, vexwendî beşdarbûnê, bikişînin ber ve ya G-20'an.

Lê belê, li gorî raporeke konfêransa ku li ber çavan pêk hatiye, ji van rêveberan yekî jî wext nedîtiye ku beşdar bibe.

Bi qismî ji ber vê boykotkirinê, rapora Stiglitz wekî din, ne bi qasî derketina derveyî sînorên lîbêralîzmeke nerm, eşkere neheq in bi gunehbarkirina ''mezinbûna ferqa navbera karê li gelek welatan'' wek yek ji sedemên bingehîn ên qeyranê bê nirxandin. Pirsa tabûyê bi vî rengî kiribûn: Eva teqîna newekheviyê, di serî de li Amerîkayê, navenda zelzelê ya ku mekanîzmaya wê bi awayekî berfireh hatiye ravekirin e (4).

Mirov dikare bi kurtasî wisa bîne ziman: Ev rawestî yan kêmbûna feydeya kar e – ''kêmkirina maaşan'' - li vî welatî, di heman katê de pêdiviya polîtîk ji bo bilindkirina maaşan, ku malbat hemû bi mebesta kirîna xaniyan êrîşî ser krediyan dikin. Bi rêya krediyên bi îpotek, mirov dibîne ku mal derdikeve pişt sînoran, dezgehên peran ''jahrbûna'' wê zû ferq dikin.

Dawiya mayî tê zanîn: Firîna kaxizên malan; topavêtina bankayên herî mezin, a soxîn, ji nûve meşandina wê ji aliyê bacdêr; têgerîna wê li tevayiya fînansa cîhanî, paşê aboriya reelhemî jî bi taybetî yên ku li ''modêla'' Amerîkî bahnandine (Spanya, Îrlanda, Brîtanya); paşketin, bilindbûna betaliyê; planên nû û hwd.

Eger destpêka agirê qeyranê bavêje ser `îpotêkan` û eger bankêr û bazirgan wek dînên agirberdanê tev bigerin, divê mirov ji bo têgihîştina sedema vê şewata giştîbêtir vecinîqe ser xwe. Ew tenê divê ji helwestên kesane, ku ew qasî hetîketî be, lê di qada veşirtî ya îdeolojîk, polîtîk û ya destûrî ku ji wan re dihêle, di ser de lê sor dike, û ku ev jî ji du stûnê mezin ê nêolîbêralîzmê tê: Guhertina serbest û serbestiya gera sermiyanan.

A pêşîn bi saya dezgehan e, bi eşkere ji aliyê pirnetewan, motora adetên civakî, bacdarî yê êkolojîk navbera welatan (ên nava Yekîtiyê jî tê de) û herêma dinyayê, wek bi cihguhertina dezgehên kar ên welatê pêşketî ber ve welatên meaş kêm, tiştê ku zoreke dewamî datîne ser berdêla kar; a duduyan, ber ve bihuştên bacê.

Ne G-8, ne G-20, ne jî rapora Stiglitz, xetên sor ên van her du sitûnên îdeolojîk dikin mijar, derbas nakin. Belê tersî wê, wan, wek sedemên ku ji ber krîzê derketine holê, dinirxînin! Di dema konfêransa wezîran a OMC'ê ku di nava encamên xerab de, asta danûstendinê jî wê bilind bibe, barkirin, afirandina gazên ku asîman gemarî dikin (5) hene. Ji bo wê biryarê didin. Bi rêçûneke yekser şîzofren re biryarê didin ji bo serketina Konfêransa Kopenhagenê li ser guherîna hewayê ku armanceke wê bêgûman sînorkirina vê afirandinê ye.

Mirov li vê derê radeya çeqoberîtiya rêveberên bêkêr ku nikarin problemên globalî yên girêdayî hev radest bikin, dipîve. Bi dehsalan e, ev utopiya bazareke ku ''rekabeta serbest û ne şaş'' e (Peymana Lîsbonê) ku, di bin parastineke bihîmet a aboriya navnetewî û komên endustriyê yên mezin, ku ji wan re rola pisûlaya polîtîk dilîzin, eger çi qasî wan car caran nigên wê jî xistibin ber wê. Ew lê hayil dibin ku, bi şiklê xwe yê rojane, kapîtalîzmê hêza xwe ya pêşverû pûç kiriye û dikare xwe, bi xwe jî, hilweşîne. Ji ceribandina amadekirina modêleke dinê bêtir, bêgûman wekhevîtir, pişgirttir û bi taybetî, kêmzerartir ji bo biyosfêrê, ew ber xwe didin ku gelekî piştgiriya wê bikin. Em bêjin –qewlekî mêrxasî ye- ku daxwaza wî û kapasîta wî ya ku ji nû ve bide dest hebe, em erê bikin ku karê wan ne hêsan e, gelek zordestî bi serê wan de hatiye, ji bo neguhetina tu tiştî hût in. Bi vî awayî, di govenda ''G''yan a bê bêhnvedan, çarnigek bi ser ê din de diçe, lê her tim, bi armanca vegera dora xeleka heman şerbikê nêo-lîbêralîzmê.

Tenê G-192, Asamblêya Giştî ya Netewên Yekgirtî, dikaribû bihişta dengê nakoseke dinê bê bihîstin ku ew jî bi dengê topên komî yên ''G''yê tê birrîn: Ew, dengê Hevgirtina Bolîvya yê Gelên Amerîka Latînî (ALBA) ye. Yekbûna heft welatên ku tê de bê gûman girniyeke xwe ya bipîvan heye li hember dinyayê, lê çawa ku ew bû navendeke rûmetê, û carina ya ber xwe kîşandinê, di aliyên dinyayê yên dinê de, a baş tenê berê trîbunan pê ve be.

**Werger ji fransî**
**Cemil Denli**



*Serokên G-20 li Pittsburgê (Oficial de la Cumbre del G-20 en Pittsburgh)*

**Ferhengok**

**G-2.** Têgeha ku pergaleke nû ya dinyayê nîşan dike ji her du navên Amerîka-Çînê pêk tê. Halê hazir, ji rêalîteyekê bêtir hîpotezek e.

**G-5.** Payîza 2003'an, di nava komcivînên OMC'ê ku li Cancunê (Meksîka) pêk hatin, Afrîkaya Başûr, Brêzilya û Hîndîstanê bi peymanekê G-3 destnîşan kirin. Ev kulûba ku ji welatê mezin ava bû, vê taliyê, bi Çîn û Meksîkayê firehtir bû.

**G-8.** Koma Heştan, ya xurttirîn aboriyên cîhanê, bi şeşan dest pê kir (Almanya, Amerîka, Îtaliya, Japonya, Fransa û Brîtanya), sala 1975'an, 1976'an fireh bû bi Kanadayê (G-7), paşê bi Rûsya re, 1998. Civîna bilind a dawîn li Îtalya, Li Aquilayê, di Pûşpera 2009'an de pêk hat.

**G-20.** Ji dewletên G-8'an pê ve, Afrîkaya Başûr, Erebistana Siûdî, Arjantîn, Awûsturaliya, Brezîlya, Çîn, Korêya Başûr, Hîndistan, Endonezya, Meksîka û Tirkiye, ji xwe Yekîtiya Ewrûpayê. Di rastiya xwe de, G-20 sala 1999'an hate damezirandin, dema civîna G-7'an li Washingtonê, lê, heta 2008'an, wê civînê xwe di asta wezîrên karên fînansê û rêveberiyên bankên navendî de pêk dianî. Îroj, di nava hengameyeke mezin a çapemeniyê de, di asta şêfên dewlet û hikûmetan de kom dibin.

**G-77.** Ev kom koalusyona komeke ji 77 welatên li ser rêya pêşketinê, sala 1964'an, di rûniştineke Konferansa Dewletên Yekgirtî ya li ser bazirganî û pêşketinê de, hate avakirin. Mezin bû heta roja îroj gihîşt sed û sih endamî.

**Hevgirtina Bolîvya ya Gelên Amerîkayê (HBGE).** Ji neh dewletan pêk tê: Sê ji Amerîkaya Başûr (Bolîvya, Ekwador, Venezûela); du jê ji Amerîkaya Navendî (Honduras û Nîkaragûa); çar jê ji Karaîbê: Kuba, Saint-Vincent-et-les-Grenadines, Domînîk, Antiga-û-Barbuda (ev her sêyên dawîn bi îngilîzî diaxivin). HBGE, ne li ser esasê rekabetê hate avakirin, lê li ser hevgirtin û hevtemamkirinê bi hesabê newekheviya navbera welatên endam. Ew dike yekitiya xwe bi perekî hevbeş, bi "şekir" pêş bixin,

[1] Martine Bulard, "le fantasme de la Chinamérique", Les blogs du ''Diplo", 29 Pûşper 2009.


[2] Di le Mondê de, 17 Pûşper 2009

[3] Br. ''Grand silence sur le G-192"

[4] Br. Jacques Sapir, ''le retour du protectionnisme et la fureur de ses ennemis", le Monde Diplomatique, Adar 2009.

[5] Di vî warî de, ketina bazirganiya navnetewî ya îro (% 10) nûçeyeke bêhempa ye.

# Têkoşîna me




*Grafîka firotina Le Monde diplomatique*

Çapemenî di nava nîqaşên civakê de xwedî roleke giring e. Gava ku dibîne ku hebûna wê di xeterê de ye, ew ji karkerê febrîqeyeke li ser girtinê zûtir li alarmê dixe. Ji bo ku ji xwe re piştgirî peyda bike jî, di cih de berê xwe dide wê formula navdar: “Gava ku rojnameyek wenda bibe, beşek ji demokrasiyê pê re dimire.” Ev, gotin esasen beradayî û bê wate ye. Ji bo ku mirov bibîne ku bi dehan weşan radiwestin, lê dîsa jî tu bandora wê li demokrasiyê nabe, hema mirov biçe rojnamefiroşekî bes e. Hêzên ewlekariya ideolojîk wê di ber re çend qereqolên xwe jî wenda bikin. Ev nayê wê wateyê ku xema rojnamegerên di vê rewşê de bê bingeh e. Lê belê, bi milyaran mirov ne mecbûr in ku ji bilî dayina maaşên wan ji bo parastina karê wan ji wan re wateyên din peyda bikin. Ev çend sal in ku îndûstriya çapemeniyê qels dibe. Rojnamegerî ji zû ve ye ku di rewşeke xerab de ye. Ma gelo naveroka nivîsan gellekî balkêş bû gava ku bîst sal berê rojname bûbûn çenteyên reklaman û mekîneyên pereyan. Lê gava ku li Amerîkayê, şahên çapemeniyê, New York Times Co., Washington Post Co., Gannett, Knight Ridder, Dow Jones û Times Mirror ji dema Watergatê, ku bûye sembola muxalefetê (1), bîst qat zêdetir qezenc dikir?

Gava ku ewqas derfetên wan hebûn û pişta xwe dabûn zêdebûna salane ya ji % 30'î, carinan jî ji % 35'î, gelo rojnamegeriya wan dîsa jî ewqasî guh dida ciddiyet û afirînerî û serxwebûnê? Lê, li Fransayê, gava ku nûçeyên rexnegiriya desthilatdariyê ketibû pêşiya hertiştî û grûbên Lagardère û Bouygues li ser bidestxistina TF1'ê şer dikir? Lê, gava ku televizyonên taybetî yên ku di warê bêastiyê de qayiş bi hev re dikişandin her roja ku diçû weke nanê Încîlê zêde dibûn û maaşên ecêb didan hin rojnamegerên ku berê nîşan dabûn bê qumaşê wan çend bi qalîte ye?

Niha gellek berpirsên rojnameyan li hember tofanê pişta xwe dane hevûdu û ji bo alîkariya aborî digirîn û vê alîkariyê ji kesine weha hêvî dikin ku di rewşeke din de wan ê navê “şîrê dewletê” lê bikiraya. Le Monde diplomatique ya ku serkeftinê ji wan re dixwaze, baş dizane bê ka para wan ya di vê xizaniya wan de çi ye. Lê belê, ji bo ku bikare têgihiştineke rojnamegeriyê ya ji ya wan cuda biparêze, ew pêşiyê bangî xwendevanên xwe dike.

Herçend guherînên medyayî ne xema beşekî fireh yê raya giştî be jî, raya giştî ji xwe re fikrêk çêkiriye: Hilkirina ala “azadiya ramanî” gellek caran bi kêrî parastina berjewendiyên xwediyên alavên ragihandinê tê.

Li gora Alexander Cockburn, yek ji avakirên malpera muxalif Counter-Punch.com weha dibêje: “*Ji gellek dehsalan û bi vir ve ye ku rojnameyên mezin yan xwe ji hewlên baştirkirina rewşa me ya civakî û polîtîk re kerr dikin, yan jî rêyê li ber wan digirin*” (2).

Lêkolîn û hevpeyvînên ku çapemenî dide pêkanîn, ji xwe roj bi roj kêmtir dibin, wê derfetê didin ku rojnamegeriya lêkolînerî li ser lingan bimîne, lê di ber re di rûpelên din de bûyerên rojane, portre, beşên bazirganiyê, yên rewşa hewayê, yên sporê û yên xal û xwarzêtiya wêjeyî xuya dibin. Divê em ji bîr nekin ku hin karkerên ku karê wan di xeterê de ye jî hene ku bi tenê nûçeyên ajansan kopî dikin û dikin nûçe.

Mamosteyê zankoyê Robert McChesney'ê amerîkî, balê dikişîne ser û dibêje “*Bifikirin ku hikumet biryarekê wergire û mecbûr bike ku cihê bûyerên navnetewî yê di çapemeniyê de di cih de kêm bibe, mecbûr bike ku buroyên hevkarên wan yên wan deveran bên girtin, an jî derfet û butçeya wan bi awayekî ciddî bê kêmkirin. Bifikirin ku serokdewlet fermanê bide medyayê ku ji skandalên derdora desthilatdariyê zêdetir bala xwe bidin ser kesên navdar û derdora wan. Di hîpotezeke weha de mamosteyên rojnamegeriyê wê greva birçîbûnê bidin destpêkirin û zanîngeh wê ji ber xwepêşandanan bêne girtin. Lê belê, gava ku berjewendiyên taybet yên ku hema hema çapemenî di destê wan de ye biryareke nêzîkî vê yekê bigirin, helwêsteke bi vî awayî nayê wergirtin.*” (3)

McChesney lojîka xwe ya ekolojiya hişmendî bi vê pirsa jêrê dewam dike: Madem tim û daîm behsa demokrasiyê dibe, kengî gelo me bi awayekî giştî biryar daye – bi sedema çi? û di kîjan hilbijartinan de? – ku komikek şîrketên gellekî mezin yên ku bi reklaman têr dibin û xema wan tenê ew e ku kara xwe zêdetir bikin, bibin çavkaniyên sereke ji bo nûçeyên me?

> Înternetê rojnamegerî ne kuştiye, ew ji berê de li ber sikratê bû

Sala 1934'an, birêvebirê fransî yê radîkal Edouard Daladier “du sed malbat” bi tûndî rexne dikirin, ji ber ku van malbatan “hevalên xwe dixistin nava desthilatdariyê” û “bandor li raya giştî dikirin ji ber ku çapemenî di destê wan de bû.” Heftê û pênc sal bi şûn de ji bîstan hindiktir mîrekî xwedî heman bandorê ne, lê belê hêza wan di qada cîhanî de heye. Desthilatdariya van mîrekiyên nû yên mîratxwir – Murdoch, Bolloré, Bertelsmann, Lagardère, Slim, Bouygues, Berlusconi, Cisneros, Arnault… (4) Gellek caran ji desthilatdariya hikumetan jî xurttir e. Eger *Le Monde diplomatique* girêdayî yekê ji wan bûya, gelo wê behsa kontrola weşanan ya Lagardère bikiraya? Lê, qedera ku Arnault tîne serê karkerên xwe? Karên ku Bolloré li Afrîkayê dike?

Gava ku behsa çûyina xwe ya ji *Libération*'ê dike, Serge July ê ku piştî ku Edouard de Rothschild sermayeya rojnameyê kêm kir ji wê rojnameya ku wî bi xwe ava kiribû derketibû, weha dibêje: “*Edouard de Rothschild (...) qebûl dikir ku barê rojnameyê yê aborî hilgire ser xwe, lê şertê wî ew bû ku ez dev ji karê xwe berdim û ji rojnameyê bi dûr bikevim. Rêyeke din li ber min nebû. Min di cih de qebûl kir.* (5)” Gellekî ecêb e ku yê ku li ser daxwaza patronî ketiye dewsa wî dixwaze bide bawerkirin ku ew li qada azadiya çapemeniyê ye.

Tê gotin ku hemû xerabiyên ku niha hene ji wê mîqrobê, ji wê înterneta heram tên. Lê belê, ya ku rojnamegerî kuştiye, ne tora înternetê ye. Ji zû ve ye ku rojnamegerî ji ber guherînan, marketînga nivîskaran, biçûkdîtina xelkê û ji ber desthilatdariya milyarder û reklamdaran di rewşeke xerab de bû. Ya ku di dema Şerê Kendavê de (1991) li tembûra Hêzên Hevpeyman dixist û di dema şerê Kosovayê de (1999) li ber tayê Rêxistina Peymana Atlantîka Bakur (NATO) direqisî, ne înternet bû. Herweha eger medyaya mezin nikarîbû agahdarî di derheqê îflasa banqeyên Amerîka (1989) bidaya, û nikarîbû bifikiriya ku welatên paşdemayî wê ji rê derketana û axir nikarîbû agahdarî di derheqê vê qrîza xaniyan ya ku deynê wê ket stûyê me hemûyan de bidaya, mirov nikare gazindan ji înternetê bike. Tawanbariyên ecêb yên pedofîliya doza Outreau ou antî-semîtîzma RER D jî ji înternetê nedihatin. Hingê, eger “rizgarkirina çapemeniyê” bi rastî jî pêwîst e, wê baştir be ku pereyên dewletê biçin ji kesên ku agahdariya cihê baweriyê pêk tînin re, ne ji kesên ku fesadî û paşgotîniyan dikin re. Hevkarên razêndêran û bazirganiya “mejiyê amade” dikarin çavkaniyên xwe ji deverine din jî peyda bikin. (6)

Di nava gazindên ku ji înternetê tên kirin de, ji bilî xema mafdar ya li ser guherîna awayê bidestxistina agahdariyê û veguheztina agahiyan, tim di binî re tiştekî din jî dixuye: Tirsa ku desthilatdariya çend axayên nirxandinan bi dawî bibe. Ji ber hêza xwe ya feodal, van kesan ji

www.arsivakurdi.org

xwe re hin war vegirtibûn û dora xwe safî kiribûn. Wan karîbû li gora xwe wezaret û navdarî “çêbikirana” an jî “xerab bikirana.” Xelkê hema bi yekdengî hemû bergemên wan yên erzan û ramanên wan yên ku xewa mirov dianîn, qebûl dikirin. (7) Hin rojnameyên ku kesî nikarîbû bi wan li derdorê weke sembola kelehên fetihkirî tev digeriyan. Lê rojekê hin mêrxas hatin ku klavye di destên wan de bûn…

Divê em li xwe mikur bên ku, ji vê heyama agahdariya jihevketî ya ku bi jinûvesazkirineke radîkal ve pêk hat (nûçeya jêrê bixwînin), me jî para xwe wergirt. Piştî hewleke bêdawî ya di navbera 1996’an û 2003’an de, heta sala çûyî jî belavbûyina *Le Monde diplomatique* ya li rojnamefiroşan bi awayekî gellekî berbiçav kêm bûbû; lê belê, hejmara aboneyan tim zêde dibû.

Di warê tîraja wê de, hejmar dîsa jî rastiyê dibêjin û em daketin heta tîraja xwe ya sala 1995’an, ya beriya ku rojname bi hev ve bên girêdan. (Li grafîkê binerin)

Cihê dilrehetiyê ye ku bala xelkê zêdetir dikeve ser eger mirov heftê û sê weşanên vê mehnameyê yên navnetewî lê zêde bike (ya yekem li Îtalyayê, sala 1994’an dest pê kir) û bi bîr bîne ku ji du milyonan zêdetir belav dibe û bi sed hezaran jî xwendevanên malpera me hene.

Lê belê, xwendin û karkirin du tiştên cuda ne. Firotin û abonetiya rojnameyê yên heyî qet nikarin bibin du çavkaniyên sermiyanê me yên sereke. (8) Internet bi tenê alîkariya bandora rojnameyê dikin, ew nikarin wê li ser lingan bigirin. Hin ji wan jî hene ku em tiştekî ji wan kar nakin, lewre bi qaçaxî tên û li ser hesabên kesên ku heqên xwe dane dijîn. (Li dabeşkirina kara me ya jêrê binerin).

Ji bo ku li ser lingan bimînin, gellek rojnameyan xwest zêdetir cih bidin daxwazên xwendevanên xwe yên texmînî. Tercîha wan eşkere ye: “*Ew gotarên kirt û nûçeyên ku wan alaqedar dikin tercîh dikin. Li ser înternetê, li tiştên ku jiyana wan hêsantir dikin digerrin. Tekstên dirêj yên li ser polîtîkaya navnetewî hingî ewqasî kêm bala wan dikişînin, internot bi tenê sernivîsên wan dixwînin. Li* Zero Hora *ya ku rojnameyeke brezîlî ya koma RBS’ê ye, beşê belavkirinê rojnameya wê rojê ji sedî bîst xwendevanan dipirse. Raporek saet di 13’an de tê ji birêvebirê wê Marcelino Reich re: “Bi giştî bêtir beşên li ser medbexê û li ser emlakan dixwazin û hêvî dikin ku gotarên li ser Hizbullah û erdhêjan jî kêmtir bibe*” (9). Divê em qebûl bikin ku *Le Monde diplomatique* wê bi îhtimaleke mezin nebe rojnameya ku ew lê digerrin…

Kêmbûyina kirrînê ya ku hatiye serê rojnameya me herweha dikare bi vê jî were nirxandin ku xelk dibînin ku eşkere û zelalkirinên ku em li ser rewşa civakî û navnetewî dikin zêde bandora xwe li sîstemê nakin. Helwêsta aciziya “ma bi kêrî çi tê?” hêdî hêdî kete şûna “ka pêşniyara we çi ye?”, lê di rewşa me de, kesek nikare gazindan ji me bike, lewre bi salan fikir û pêşniyar di van rûpelan de hatine rêzkirin (paqijkirina deynên welatên paşdemayî, reforma dezgehên navnetewî, baca Tobîn, netewîkirina banqeyan, parêzgeriya ewrûpî, “giyotîna bacî” ya ji bo hin karkirinên sermayeyê, pêşxistina aboriya hevgirtinê û ya çembera ne bazirgan û hwd.).

## Mehnameyeke ku kes pêşniyarî kesî nake

Eşkere ye ku têkçûna altermondîalîzmê ji yên din bêtir xurt bandora xwe li me kir. Hegemonyaya bîreweriya lîberalîzmê hate rexnekirin, lê belê wê mertalên xwe zû xurt kirin. Lewre, eger rexne têrê neke, pêşniyar jî têrê nake: Sîstema civakî êdî ne teksteke weha ye ku xerabkirina wê bes be ji bo ku ew bikare xwe ji nû ve ava bike; gellek fikir derdikevin beyî ku dîwarek jî xerab bibe. Lê carinan hêvî ji me tê kirin ku bûyer li gora dilê me hemûyan tev bigerrin. Û eger weha nebe jî, em bi reşbînkirinê ve tên tawanbarkirin…

Hema çi be jî, gava ku behsa pêşeroja vê rojnameyê dibe, em xweşbîniya xwe li ser baweriyekê ava dikin, baweriya ku em dizanin ku hûn li pişta me ne. Emê ji ber wê niha bihayê xwe bilind nekin. Li welatên xizan Emê herî erzan bikin. Emê hevkariya weşanên navnetewî dewam bikin û wê derfetê bidin wan ku di destpêkê de mafê me bi awayekî kêm bidin me. Emê tim teknolojiya multîmedyayê taqîb bikin, nemaze ji bo ku em xwe bigihînin ciwanên nû û nirxên rojnameya xwe yên entelluktuelî û polîtîk bidin wan. (beşê “Agahdarî”yê bixwînin). Emê bi berdewamî daxwaza hevpeyvîn û lêkolînên mezin, yên rojnamegeriyê, yên zanistî, yên mîlîtaniyê jî bikin ku li ser şerên heyî, li ser krîzan, li ser alternatîfan û ceribandinan bin.

Lê belê, dewamkirina vê rêya me bi pirranî bi piştgiriya we ya fînansî ve girêdayî ye. Kirrîna daîmî ya ji rojnamefiroşan, abonetî, diyariya abonetiyan ya ji bo xwendevanên potansiyel, endametiya komeleya *Hevalên Le Monde diplomatique*: Rêyên we yên alîkariyê gellek in. Ev demeke kirt e ku rêyeke din jî saz bûye. Ev jî wê derfetê dide ku hûn ji % 66’ê alîkariya ku we bi rojnameya me ve kiriye ji baca xwe ya sala ne bikujin. Bi vî awayî, pereyên civatê êdî, piştî ku alîkariya banqeyan kir, dikare bi kêrî lêkolîna li ser xerabkariyên wan jî were…

Gava ku em bidin ber rojnameyên din, ziyana me ne zêde ye (330 000 euro sala 2007’an û 215 000 euro jî sala çûyî). Lê, dîsa jî tu karmendên banqeyê yê ku derfet ji dest çûye û ji bo lîstina li ser pereyan diqirqile wê alîkariya girtina vê ziyanê pêşniyar neke. Di rewşa rojnameyeke weke ya me de ku karmendên wê razandêrên wê ne, û herweha xwendevanên wê jî xwediyê beşekî sermayeya wê ne, û abonetiya piştgiriyê dide pirtûkxaneyan û girtîgehên kêmderfet, û birêvebirê wê tê hilbijartin, wê bi îhtîmaleke mezin ewqasî bala wan nekişîne.

Pirsa ku ji me hemûyan tê kirin hêsan e: Ji bilî me, kî wê fînansa rojnamegeriyeke weha bike ku kara herkesî tê de be, kî wê du rûpelan bide kêmtemenên Zambiyeyê û deryayiyên Çînê û civata Lettonî? Ev mehname ne bê qisûr e, lê piştgiriyê dide nivîskarên ku dikevin rêyê, lê dikolin, ji mala xwe derdikevin, guhdar dikin û bala xwe didinê. Rojnamegerên ku wê pêk tînin ji bo şîv û şevbihêrkên mezin nayên vexwendin, ew li ser hesabê lobiya dermanfiroşan û şîrketên ambalajan tev nagerrin, ew bexşîşê ji medyayên mezin wernagirin. Ji xwe ew medya tim her “formuleke nû” ya rojnameyeke din ji ber digirin û “rapora medyayê” ya xwe dikin xaneke weha ku tim ji pênc an şeş navan re vekirî ye, ew nav jî tim eynî ne, xwe bi taybetî ji *Le Monde diplomatique*’ê re kerr dikin ji ber ku bandoreke wê ya navnetewî ya bêhempa heye. Di eslê xwe de, heqê bêhempabûna me jî ev e.

Lê, gellek heval û hogirên me li derve hene: Komela *Hevalên Le Monde diplomatique* ku hebûna wê hêzê dide serxwebûna nivîskarên wê û her meh bi dehan guftugoyan di derheqê mijarên ku em pêşkêş dikin de saz dike; rojnamefiroşên ku bala wan lê ye ku rojname baş xuya bibe û carinan wê pêşniyar jî dikin; mamosteyên ku wê bi şagirtên xwe ve didin naskirin; çapemeniya alternatîf ya ku pişta xwe dide agahiyên me û hin nivîskarên wan yên ku sirf ji gotarên me werdigirin; gellek miraqdar, rojnamegerên bêtirs, hin şexsiyetên xerab…

Û hûn hemû, beyî we tiştek jî ne mimkun e.

SERGE HALIMI

**Werger ji fransî**
**İbrahim Seydo Aydoğan**

## Agahdarî

Ji sibata 1995’an ve ye ku *Le monde diplomatique* li ser malpera xwe gotarên herî nû diweşîne. Ew, bi vî awayî, bû yekem rojnameya fransî ya li ser înternetê. Lê, arşîva wê ya ku diçe heta damezirandina rojnameyê ya sala 1954’an, hê jî ne vekirî ye. Bi tenê hin pirtûkxane koleksîyona xwe ya kaxezî pêşnîyar dikin ku ew jî êdî pirr kevin bûye. Ji ber van sedeman, ev çend sal in ku em li ser projeyeke parastina bingehên “dîplo”yê dixebitin. Ji ber ku êdî qeydkirî ye, hejmarên ji sala 1973’ê heta îroj dê di demeke nêz de li ser malpereke taybetî bên vekirin û motoreke lêgerrînê û îndekseke coxrafîk û tematîk jî dê tê de hebin. Ev arşîv dê hêdî hêdî bigihîje heta hejmarên kevintir, lê herweha çapên wê yên navneteweyî jî, teva lînkên nivîsan ku derfetê bide ku mirov bikare gotarekê teva wergerên wê yên cuda jî bixwîne. Karekî dûr û dirêj e ku ne bi tenê divê mirov hejmarên Kevin skaner bike, lê herweha îndeksa wan derxe û naverokên wan jî bi hev girê bide.

PHILIPPE RIVIERE

[1] Eşkerekirina Washington Post’ê ya pêkhatina diziyên avahîya Partîya Demokrat yên ji sala 1972’an û bi wê de ku li paytexta federal rû dabûn, bû sedema ku di tebaxa 1974’an de, serokê komarîst Richard Nixon îstifa bike. Di navbera 1975 û 1989’an de qezenca The Newyork Times Co ji 13 milyon dolaran firîya 266 milyon dolaran. Di heman dewrê de, The Washington Post Co. bi xwe jî ji 12 milyon dolaran çû 197 milyon dolaran. çavkanî: Howard Kurtz, “Stop the Presses”, The Washington Post National Weekly Edition, 3 Gulan 1993.

[2] Alexander Cockburn, *The Nation*, New York, 1 Hezîran 2009.

[3] Çavkanî: *Columbia Journalism Review*, New York, Çileya Paşîn-Sibat 2008.

[4] Di Gulana 2008’an de, M. Bernard Arnault, yê ku duyem dewlemendtirînê Fransa ye û serok û birêvebirê LVMH û xwedîyê rojnameya aborî Les Echos’ê ye, kurê xwe Antoine kir endamê “Lijneya Serxwebûna Edîtoryal” ya koma Les Echos’ê. Berî wê jî, M. Antoine Arnault birêvebirê Luois Vitton’ê yê agahdarîyê bû.

[5] Serge July, Jean-François Kahn et Edwy Plenel, *Faut-il croire les journalistes?,* Mordicus, Paris, 2009, p. 67.

[6] Ji Çiriya Pêşîn a 1984’an û pê ve, Claude Julien (berpirsê *Le Monde diplomatique* yê ji 1973’an heta 1991’ê) pêşniyar dikir ku alîkarîyên dewletê yên çapemenîyê, ku dibû ji % 10’ê kara wî warî, bi tenê biçûya ji şîrketên nebazirganî re. Ev şîrket “nikarin qezenckirina pereyan û dabeşkirina kara wan ji xwe re bikin armanc”. Kara wan dê “di warê berhemeke civakî de were bikaranîn. Rojnameyên ku tercîha xwe di vî warî de bikin, dê qet bala razandêran jî nekişînin.

[7] *Çavkanî:* “L’imposture Bernard-Henri Lévy” li ser malpera me www.monde-diplomatique.fr

[8] Sala 2008’an, weşanên navnetewî 350 000 Euro bi *Le Monde diplomatique*’ê dane qezenckirin ku ev jî dibe ji % 3’ê kara wê.

[9] “More media, less news”, *The Economist*, Londres, 26 août 2006.

www.arsivakurd.org

# Avakirina nû ya bingehîn,


SERGE HALIMI

Bifikirin ku dinya êdî ji aliyê alavên bazirganîyê û bihayê wan ve neyê birêvebirin. Hingê, tu sedemên girîng wê nemînin ku rojnamegerek bixwaze ku nivîsên wî hê jî li ser kaxezan bên çapkirin, û bi dû re, bi qemyonan ber bi belavkarên çapemenîyê ve bên veguheztin, an jî bi rêya posteyê ve ji aboneyan re bên şandin. Bi xêra înternetê, derfeteke weha wê bi destê wî bikeve ku agahî û nirxandinên xwe bi xwendevanên seranserê cîhanê par ve bike; di nava kêlîkekê de bigihîje armanca xwe, bêyî ku tu mesref lê biçe û bikare li gora daxwaza xwe deng, dîmen û referansan jî lê zêde bike.

Lê belê, ji hêlekê ve jî, eger weha bike, ew ê bibe sedema kêmkirina refleksîyona ku bi awayên xwendinê, yên fikirînê û yên vegirtinê ve girêdayî ye ku ev awa li ser ekranekê û li ser rûpelekê ne weke hevdu ne. (1) Ji hêleke din ve, heta ku bihuşta belaşîyê xwe negihîne seranserê civatê, mirov nikare hesabê modela aborî jî neke ku ji ber teknolojîyên nû di rewşeke xeternak de ye. Tew gava ku ji bo nuha ji bêndereke çavkanîyên hatinîyên paşerojê ya ku bi motoreke lêgerînê ve tê û pê ve tu çareyên din jî di dest de nebin - ev motora lêgerînê jî şîrketeke taybetî ye, di borsayê de ye û hema hema di rewşa monopolekê de ye. (2) Ev Google'a zîrek ku xebatên xelkê nîşan dide, herweha mezintirîn para kara van xebatan jî werdigire.

Bazara naveroka medyayî her sal ji % 30 zêdetir dibe: Hejmara televizyonên ewrûpî di nava deh salan de sê qat zêde bûye û hejmara kovaran di nava bîst û pênc salan e bûye çar qat. Gellekî xwezayî ye ku tîraja her weşanekê kêmtir bale dikişîne.(3) Lê belê, ji xwe, beşê ku xelk ji butçeya xwe bidin çapemenîyê kêmtir dibe û berê wê butçeyê diçe axavtinên bi telefonên destan re, diçe televizyonên bi pereyan û diçe înternetê. Bi vî awayî, li Fransayê, malbateke normal rojê ji 50 qirûşê Euroyan kêmtir dide kirrîna rojnameyekê. Ew bêtir yên erzan tercîh dike û tew belaş be, xêra Xwedê ye.(4) Rewşeke weha pirsgirêka hebûnê ya rojnamegerên profesyonel jî zelaltir dike, lewre maaşê van rojnamegeran bi qedera şîrketa wan ve girêdayî ye. Ji ber ku tîraja rojnameyan û hatinîyên wan yên ji reklaman bi hev re dikevin. Weke mînak, hatinîyên *Le Monde*'ê yên ji reklaman berî niha bi çend salan di navbera ji % 60 û ji % 70'ê kara wê de bû; Îro tu hemûyan bide ser hev nake ji % 25 jî.

Rojnameyan pêşîyê da pey xewna ku weşana naveroka wan ya bê mesref li înternetê wê hejmara muşterîyên wan zêde bike û ew ê jî bikarin bi xêra wê hejmarê, mesrefa xwe ji reklaman derxin. Paşê, hatin ser hişê xwe: Înternet li ser wan bûn gêrîk, lê tu kar ji wan nehat kirin. Her cara ku rojnameyek muşterîyekî an jî aboneyekî çapa xwe ya kaxezî wenda dike, reklamîst şertê peydakirina deh înternetan datînin ber wan ku bikarin butçeya reklaman wergirin. Divê bê zanîn ku kara îlaneke fînansî ya rûpeleke *Les Echos*'yê ji kara hemû hejmarên wê yên ku li firoşgehan tên firotin bêtir e. Raporeke van demên dawîn ya li ser rewşa medyaya Amerîka mercên ku medya tê de ye baş eşkere dike: Rojname divê rêyeke weha peyda bikin ku "*berî ku dahata wan yên ji kaxezê bi temamî kêm bibe, bi wê rêyê bikarin zêdebûna muşterîyên li ser înternetê veguhezînin pereyan û têra xwe karê jê bikin ku bikarin li ser lingan bimînin.*" (5)




*Homo-media (Illustrations: LMD kurdî)*

Ji aliyê kara wan ve, ji bo rojnameyan tiştekî ku bi qasî kêmbûyina dahatên ji reklaman giran be tuneye (li Amerîkayê, di dewra duyem ya 2009'an de, li gora sala borî, ji % 29 kêm bûye). Ji ber ku êdî derfetên xurttir û erzantir yên gihiştina muşterîyan di destê wan de heye (mina înternet, telefonên destan û "bicîhkirina berhemên xwe" ya li ser fîlmên aksîyon û rêzefîlman), reklamîst weke berê guh nadin çapemenîya nivîskî ya ku xwendevanên wê êdî pîr dibin. Lê belê, îroj bi xwe jî, reklam hê jî bi giştî ji % 43.8'ê dahatên kovar û rojnameyên fransî ye, li hember ji % 32.6'ê hatinîyên wan yên ku ji firotinê û ji % 23.6'ê hatinîyê wan yên ku ji abonetîyan tê. (Çavkanî: Grafîka jêrê her weha xweserîya *Le Monde diplomatique*'ê ya di vî warî de jî nîşan dide…).


Telqîna hin kovar û rojnameyan ji zû ve hatiye xwendin; Qedera hinekên din jî nêzîk bûye. Li Amerîkayê panzdeh hezar rojnameger sala borî ji kar hatine derxistin û ji van bêtir kesan jî qebûl kiriye ku maaşê wan kêmtir bibe. Ji bo ku li ser lingan bimîne, *New Yok Times*'ê bi faîzeke ji % 14'an pere ji Carlos Slim deyn kir ku dewlemendtirîn kesê Meksîkayê ye. Gellek bajarên mezin (Detroit, Seattle, San Francisco…) hindik maye ku rojnameyên xwe yên mezin yên herêmê ji dest bidin; ji cerga ku *Chistian Science Monitor*'a navdar dev ji çapa xwe

# reklam serbest e

ya kaxezî berdaye, weşana wê ya înternetê jî têk çûye. Ji aliyê din ve, çapemenîya Spanya ji sî hezar kesên ku di vî warî de dixebitin du hezar çarsed kes di nava salekê de ji kar derxistine.

Piştî ku hejmara karkeran daxistin û hejmara rûpelan jî kêm kirin, xwedîyên rojnameyan hêvî dikin ku bi zêdekirina bihayê rojnameyê ve barê kêmanîya firotinê sivik bikin, lê belê, bihakirin tim belavkirin û kirrîna wê jî kêmtir dike. Ji bo niha, yên ku ber bi vê tofanê neketine, ne bi tenê Asya û welatên ereb in.

Dahata me ji kuderê tê?




Dahata sala 2008'an (Ji bilî dahata weşanên navnetewî û firotinên tiştên wek DVD uhw.)

Ma mirov çawa dikare karên rojnamegerîyeke biha fînanse bike (lêkolînên dûr û dirêj, hevpeyvînên li derveyî welêt, xwendin û pejirandina tekstan ya ji hêla edîtoran ve, sererastkirina wan) gava ku çavkanîyên heyî wenda bibin? Bersiva yekem: Dev ji fînansekirinê berde. Hingê, di cih de çember digerre: Çapemenî qels dibe, para qelsîya rojnamegerîyê jî di vê de heye, û ev qelsî hêvîya rojnameyên rojnamegerîyê jî kêm dike. Û wan mecbûr dike ku serî zêdetir li ber dahatên ku servîsa marketîngê peyda kirine bitewînin: Meseleya gotarên kirt, mijarên ku "civak jê hez dike", servinîsên belloq ji bo bûyerên berradayî, gotinên xwendevanan, mijarên "nêzîkî xelkê".

Gellek teknîk hene ku mirov ji ber kêmbûna firotina rojnameyekê neêşe û bi awayekî di ser re firotina wê zêdetir bike. Ev teknîk pirr biha ne, lê wateyeke wan ya fînansî jî heye; eger mirov bikare bi xêra reklamîstên ku gava ku çav li hejmara muşterîyan dikevin av bi ser devê wan dikeve "xwendevanên" nû bike pere.

Eger mirov bihayê abonetîyan piçekî kêm bike û hin diyarîyan jî di ber re bide, mirov ji kovareke bêvilbilind re kirasekî jîndar peyda dike. Roja 25'ê çileya paşîna 2002'an, heftenameya *Le Point*'ê haydar dikir: "*Em nakevin pêşbazîya abonetîyê ya ku bi salan e ku beşekî kovaran bi dest xistiye û sînor nehiştiye û hey diyarîyan dide xwendevanan*." Di van demên dawîn de, *Le Point*'ê li ser abonetîyeke deh hejmaran ya ku 15 Euroyan dike, mekîneyeke hesaban ya pirrhêl an jî saetek diyarî dida. (6)

Rêyeke din ya qurbankirina naverokê ya ji bo biserketinê ew e ku mirov rojnameya xwe diyarî şîrketên balafiran bike, bide muşterîyên marketên luks, bide hotelên mezin, li parkîngên dewlemendan û xwendekarên dibistanên mezin belav bike. Ev yek wê belavkirina wê ya di nava xwendevanên xwedî derfet de bilind bike ku ev xwendevan armanca reklamîstan ya sereke ne. (7) Pêşkêşkirina formulên endustrîya çapemenîyê ya ji bo çareserkirina pirsgirêkên wê yên aborî, bi awayekî din, wê derfetê dide ku mirov taybetmendîya wê mehnameyê jî bibîne. Taybetmendîya wê ew e ku li seranserê cîhanê belav dibe û heftê û sê çapên wê yên navnetewî hene. Yanî, *Le Monde diplomatique* nakeve bin nîrê reklamîstan û ew ji welatê ku navenda wê lê ye zêdetir, bala xwe dide welatine din.

Birêvebirê *Le Figaro*'yê yê niha, gava ku hê cigirê serokê TF1'a mezintirîn televizyona Ewrûpayê bû, dijberê wê digot: "*Em ê cihê ku em didin mijarên navnetewî li gora wê diyar bikin bê ka fransî çiqasî bala xwe didin wan. Di vî warî de, her ku kanalên kabloyî û yên satellitê zêde bibin, rojevên giring yên polîtîkaya navnetewî wê bibin mijara kanalên tematîk*". (8) Roja 30'ê Tebaxa 2009'an, nûçeyên saet 20'an li gora vê fermanê hatin pêşkêşkirin: Hilbijartinên Japonya piştî hivdeh deqîqeyan bûn nûçe û bi tenê bîst sanîyeyeyan behsa wan bû. Pêşkêşvana wan behsa vê "bûyera giring" kir bê ku tu dîmen an jî nirxandin lê zêde bibin. Têkçûna partîya konservator ya piştî pêncî salên desthilatdarîyê, ji ber wê ye ku piştî nûçeya mirina şeş gerrokan a li çiyayê Savoie ket nûçeyan. Ev bûyer, bûbû yekem mijara nûçeyan.

"*Her êvar, di televizyonê de, zilamekî rût ku neçar maye derdikeve û digirî*". Ev formul kapîtalîzma çavdêrîyê û civata wê ya temaşevanîyê têra xwe baş şirove dike. (9) Piştî nirxandineke weşana êvarî ya şeş kanalên fransî yên sereke (TF1, France 2, France 3, Arte, Canal+ û M6), Enstîtuya Netewî ya Radyo û Televizyonan (INA) lê warqilî ku "*bûyerên rojane roj bi roj zêdetir dibin, sala 1999'an şessed û sîh mijarên weha hebûn, lê sala 2008'an hejmara wan bûye hezar û hefsed û deh. Mirov dibêje qey armanca edîtorên televizyonan ew e ku dramên şexsî di ser dramên giştî re bigirin*". (10)

Medyaya nivîskî jî ji zû ve ye ku ewqasî guh nade rojeva navnetewî. Ew bawer dike ku sebeba her tiştî -û ya ku wan tev li hev jî dike- globalîzm e. Lê belê ji 2002'an heta 2006'an hejmara hevkarên rojnameyên Amerîka yên li welatên din ji % 30 kêm bû. (11) Ev "gundê global" bi tenê li ber xwe dinere. Lê belê, kanalên kabloyê û satelit hene? Cigirê birêvebirê nûçeyên TF1'ê berî niha ji deh salan zêdetir weha rê bi ber xelkê dixist: "Hûn nûçeyên li ser Venezûelayê dixwazin? Li televîzyona Venezûelayê binerin. Li ser Sûdanê? Li kanalên Afrîkayê binerin. (12)" Hêjayî gotinê ye ku tu hevkarên TF1'ê yên daîmî ne li Afrîkayê û ne jî Amerîkaya Latîn hene.

Bê guman, eger îroj bûya, wî yê bigota: "biçin ser înternetê!" Lewra teknolojîyên komînîkasyonê yên nû delîleke bêhempa daye destê konetîya redaksîyonan û tiralîya entellektuelîyê. Ji ber ku înternet heye, medyayên giştî êdî dikarin bêî dudilîyê buroyên xwe yên hevkarîyê yên li derveyî welêt bigirin û cihê mijarên din kêm bikin û bêtir cih bidin mirina Michael Jackson, "*qedera Marina'ya biçûk ya dilêş*", bûrka, fantazîyên evînî yên Valery Giscard d'Estaing û zayina Rachida Dati'yê. (13) Gava ku li Srî Lankayê dewlet xwe tûj bike, rojnameger wê berê xwendevanên xwe yên ku bala wan dikişîne bi tenê bidin malpera *Times of India*… Ma gelo bi xêra înternetê em her yek ji Arîsto zanetir nebûne, ji ber ku em bi rêya telefonên xwe yên destan dikarin bikevin arşîva numerîk ya "pirtûkxaneya navnetewî"?

Me fêm kiriye ku di nava vî şerrê xaçperest yê rojname û televîzyonan de, yê me, em di nava munafiqan de ne. Eger em bi awayekî din bibêjin, cihê şerrê me li deverine din e.

**Werger ji fransî**
**İbrahim Seydo Aydoğan**

[1] Bixwîne: Cédric Biagini û Guillaume Carnino, "Le livre dans le tourbillon numérique", *Le Monde diplomatique*, Îlon 2009; û Nicholas Carr, "What the Internet is doing to our brains. Is Google making us stupid?", *The Atlantic Monthly*, Washington, DC, Tîrmeh 2008.

[2] Tîrmeha 2009'an, ji % 67,5'ê lêgerrînên înternotan yên li seranserê cîhanê bi rêya Google ve hatiye kirin. Yahoo ya duyem e û bi tenê ji % 7.8 wergirtiye. (*Les Echos*, Paris, 2 îlon 2009)

[3] *Etats généraux de la presse écrite*, Livre vert, 8 çileya paşîn 2009, r. 37, www.ladocumentationfrancaise.fr

[4] Di eslê xwe de marqeyên mezin fînansmana van rojnameyan dikin û heqê wê jî bi buhakirina bazarê ve dîsa ji pişta muşterîyan derdixin.

[5] Pew Project for Excellence in Journalism, "The state of the news media 2009", www.stateofthemedia.org

[6] *Challenges* makîneyek hesaban û du saetan dide kesên ku bi bihayeke erzan abonetîya salekê bistînin.

[7] Êdî yên ku herî zêde berê xwe didin vê rêyê ne kovar in, lê belê rojname ne. Di nava wan de, sala 2007'an, çar rojnameyan ji % 20'ê tîraja xwe bi awayî difiroşt: *La Tribune* (29,56 %); *Le Figaro* (24,8 %); *Les Echos* (24,4 %); *Libération* (22,22 %).

[8] Hevpeyvîn li gel Etienne Mougeotte, *Le Figaro*,Paris, 15 Çirîya Pêşîn 2003.

[9] Collectif Retort, *Des images et des bombes. Politique du spectacle et néolibéralisme militaire*, Les Prairies ordinaires, Paris, 2008.

[10] "Le baromètre thématique des journaux télévisés", *INA Stat*, n° 13, Bry-sur-Marne, hezîran 2009.

[11] Paul Starr, "Goodbye to the age of newspapers", *The New Republic*, Washington, DC, 4 adar 2009. Herweha "Un journalisme de racolage", *Le Monde diplomatique*, Tebax 1998.

[12] Jean-Pierre Pernaut, *Télérama*, Paris, 9 Çileya Pêşîn 1998.

[13] Roja 10 Çileya Paşîn a 2009'an, digel ku hê li Gazayê şer dewam dikir û îstatîstîkên aborî bi lezeke ecêb xerabtir dibûn û Ewrûpa jî ji ber pirsgirêka gaza di navbera Rûsya û Ukraynayê de ketibû xema peydakirina gazê, rojnameya fransî *Libération*'ê pêwîst dîtibû ku di rûpela xwe ya yekem de bi dosyayekê û edîtoryalekê ku Laurent Joffrin'ê birêvebirê wê bi xwe jî tev lê bûbûyê behs bikiraya ku Mme Dati ya ku wê demê hê wezîra fransî ya adaletê bû bi tenê pênc rojan piştî zayina xwe vegerîyabû ser karê xwe .

www.arsivakurd.org

# Komkujiya “

Li gorî belgeyên Netewên Yekgirtî, tacirê Hollandî Frans van Anraat, di navbera salên 1984-1989’an de hezar û 117 ton alavên kîmyewî yên jahrî firotibû rejima Baasê. Li gor delîlên parêzeran, bi van alavên kîmyewî ku vî bazirganê çekan firotibû Îraqê, 8 gundên Kurdistanê, hatibûn hilweşandin û bi hezaran însan hatibûn qetilkirin.

Heman dadgeha ku qetlîamên rejima Îraqê yên li Kurdistanê wekî “komkujî” bi nav dikir, 360 Euroyên ji bo serê mexdûran, ku qurbaniyan ji tawanbar dixwestin, red kiribû. Herçî van Anraatê ku yarmetiya kuştina bi hezaran kesî kiribû, 16 sal cezayê hepsê lê hatibû birîn. Piştî ku ceza lê hate birîn, van Anraat diyar kiribû ku wî, piştî rûxandina rejima Saddam ya sala 2003’yan, bi rêxistina îstîxbarata Hollandayê re jî hevkariyê kiriye.

Li Almanyayê jî derketibû holê ku gelek şîrketên ku alavên kîmyewî hildiberandin, gazên jahrî firotine rejima Saddam, yarmetiya kuştina bi hezaran kesî kirine, berpirsiyarên ku jahr û gaz radestî kujeran kirine, li gorî sûcên xwe yên gelek giran, cezayên gelek sivik wergirtibûn.

Berpirsiyarê sereke yê Enfalê, fermandarê artêşa Baas General Hesen Elî Mecîd, hê jî li danişînên nixumandî yên dadgehên Îraqê tê darezandin. Lê hevparên wî yên tawanbar, hîn jî derneketine holê.

Tariq Remezanê pîlot, di sala 2005’an de li Mûsilê hatibû girtin. Remezan, li xwe mikur hatibû ku wî wek pîlotê nêçîrvan parastina fîloyên ku Helebçeyê dane ber gazên kîmyeyî kiribû. Pîlotê Helebçeyê, ji girtîgeha bajarê Silêmaniyê ya Kurdistanê, bi marîfeta rêveberên herêmî hatibû revandin û çûbû Brîtanya. Gava em bala xwe didin doza penaberiya wî ya ku li Îngilîstanê kiriye, em pê dihesin ku Enfal di rastiya xwe de komkujiyeke “bêbext” e ku nayê xwestin kirdarên wê bêne darezandin!

Di serdema me ya ku sûcdarên komkujiyên li welatên wekî Rûanda, Yûgoslavya, Kamboçyayê hê jî têne dadgehkirin de, hevparên sûcên Enfala li Kurdistanê hê jî bê ku cezayê tawanên kirine wergirin, jiyana xwe berdewam dikin.

Enfala ku di Qûrana pîroz a Musulmanan de navê ayetekê ye, her weha navê kod a komek operasyonên leşkerî ye ku ji 23’yê Sibatê heta 6’ê Îlona 1988’an ji hêla rejima Baas ve li Kurdistanê pêk hatine, bixwe ye. Kampanya Enfalê ku di erebî de tê wateya “bahozê”, ligel ku hevgirêdana wê bi merhaleya dawî ya şerê Îran-Îraqê ya 1980-1988’an heye, nebû yek ji encamên vî şerî. Di rastiya xwe de, şerê li dijî Îranê, bi nêzîkbûna dawî lê anînê, bi şertê ku Îraqê avêtin holê re, derfeta pêwîst da rejima Baas ku êrîşê bibe ser kurdan.

Enfal, bi rayeyên awarte yên Elî Hasan El Mecîdê xizmê Serokdewletê Îraqê Saddam Huseyîn û Sekreterê Giştî yê Şaxê Bakur ê Partiya Baas a Ereb Sosyalîst a Îraqê hat meşandin. Ji 29’ê Adara 1987’an heta 23’yê Nîsana 1989’an, rayeya ku li herêma bakur ji bo General Mecîd hatibû dayîn, di mistewa rayeyên Saddam de bûn. El Mecîdê ku ji hêla kurdan ve wekî “Elî Kîmyewî” tê naskirin, faîlê komkujiya kurdan bû. Du lîvayên sereke yên artêşa Îraqê, Midûriyeta Emniyetê (Müdüriyat al Muhaberat al-Ameh) û Îstîxbarata Leşkerî (Muxaberat) di bin fermana El Mecîd de bû. Cerdevanên kurd ên ku bi navê Cahş, Fursan an jî “Yekîneyên Parastina Netewî” dihatin binavkirin jî, di vê tevkujiyê de rolên girîng lîstin. Ji bo “çareseriya kêşeya kurd û qetilkirina pêşmergeyan” saziyên leşkerî, ewlekarî û sivîl ên dezgeha dewleta Îraqê û tevahiya derfet û çavkaniyên din xistibûn bin emrê El Mecîd.

## Qonaxa yekem (An kurd an ereb!)

Yekemîn kiryara rejima Îraqê ya ku ji bo tesbîtkirina komên ku wê qira wan bîne serjimariya nifûsê ya di 17’ê Cotmeha 1987’an bû. Di navbera qadên ku pêşmergeyên kurd rizgar kiribûn û herêmên di bin kontrola artêşa rejimê de bi awayeke fiîlî herêmeke tampon pêk hatibû. Beriya serjimariyê, Partiya Baas, fermanê da şêniya li herema di bin rêvebeiya pêşmergeyan de û got; “Vegerin nav refên netewî.” Wateya vê fermana ku ji balafiran bi ser Kurdistanê ve dihate darijandin û di radyo û TV’yan de dihate weşandin ev bû; çûna nav kampên komelî ya di bin kontrola hêzên Îraqê; an jî windakirina hemwelatîbûna Îraqê û dîtina mûameleya qaçaxiya leşkeriyê bixwe bû.

Di Tebaxa 1987’an de, Konseya Fermandariya Şoreşa Îraqê, bi biryarnameyekê îlan kiribû ku kesên beşdarê serjimariyê nekin, wê wek qaçaxê leşkeriyê bêne hesibandin û cezayê mirinê li wan were birîn. Beriya serjimariyê bi kirtedemekê, El Mecîd koma ku wê bê hingavtin, bi awayeke eşkere diyar kiribû.

Elî Kîmyewî, ferman da mûxaberatê ku derbarê malbatên “muxerîb/sabotajkar” hê jî li herêmên kontrola hikûmetê de ne, dosyayan amade bike. Piştî temambûna van dosyayan, hejmareke mezin jin, zarok û pîr bi darê zorê bo herêmên çolter hatin koçberkirin. Îdîayên derbarê wan de û ev kiryara koçberkirina nifûsê ya ku yek bi yek endamên malbatan dihatin lêpirsîn pêk dihat, bû yek ji taybetmendiyên sereke yên serdema Enfalê bê ka di vê kiryarê de wê kê bijî û kê bê kuştin. Ji bo ku netewa xwe diyar bikin, tenê du rê danîbûn pêşiya beşdarên serjimariya nifûsê. Li gorî vê yekê, kesên dihatin hejmartin divê an “kurd” bûna an jî “ereb.” Ev alternatîf an bê alternatîfbûn, kir ku Xirîstiyanên asûrî û keldanî jî, bi rewşeke erjeng re rûbirû bimînin.

Li hêla din sadaqata bi rejimê re, ji bo rizgarbûna ji qetlîamên El Mecîd têr nedikir. Alîgiriya hikûmetê ango Cahşbûn bixwe jî ne çareyek bû. El Mecîd gef li serekên cerdevanan jî xwar û got ku heger ew gundên xwe neterikînin, wê bi gazên kîmyewî bêne bombebarankirin. Koka nîjadî û devera lêbicihbûnê, di vê planê de sedema tasfiyebûnê bixwe bû. Ev her du diyarde, dema ku di sala 1988’an de komkujiyên girseyî pêk hatin, bi hevre hatin nirxandin.

Di sala 1987’an de valakirina gundan û koçberkirinên li Kurdistanê, bi tenê li herêmên di bin kontrola hikûmetê de ne pêk hat. Bi gotineke din, tu têkiliya van operasyonan bi çewisandina serhildana kurd



*Abîde û goristana ko*

www.arsivakurdi.org

# pîroz": Enfal



omkujiya Halebçeyê (Rûdaw)

tunebû. Şêniya van herêman, eger mayîna li herêmên girseyî yên ku hikûmet dixwest lê bimînin red bikira û xwe bispêrta herêmên rizgarkirî yên di bin kontrola pêşmergeyan de, -gelekên ji wan wiha kir- wê bi operasyonên Enfalê bihatana îmhakirin. Heman kiryar li ser komên etnîk yên li Kurdistanê jî hate kirin.

Di serjimariya ku di sala 1987'an hate kirin de, gelek Xirîstiyanên asûrî û keldanî zexta rejimê ya bi rengê "an hûnê bibin kurd an bibin ereb" red kir. Kesên ku xwe wek "ereb" bi nav nekir, çawa ku "kurd" bin mûamele dît. Di Enfala dawî ya li herêma Duhokê ku piraniya Xirîstiyanan lê dijîn de, wan jî ji hêla tabûrên mirinê yên General Mecîd ve, wekî ji zilma ku kurdan dît, para xwe wergirt. Hejmareke kêm ji tirkmenên ku xwe spartin qadên pêşmergeyan, ''wek kurd' hatin hesibandin û rastî heman mûameleyî hatin. Piştî ku toz û telaza Enfalê belav bû, zêdetirî wan jin û zarok bi sedan asûrî û keldanî wekî qurbanên din ên tevkujiya li Kurdistanê winda bûn. Sûcên wan ew bû ku ne ereb bûn û li Kurdistanê dijiyan.

Di mehên havîna 1988'an de gelek Xirîstiyan û tirkmenên ku ji Enfalê ber bi Bakur û Rojhilatê Kurdistanê ve reviyabûn û li "kampên pêşmergeyan" bi cih bibûn, mînakên "bişans" bûn ku ji "bahoza" Elî Kîmyewî rizgar bibûn. Min ew li van kampan naskiribûn.

## Qonaxa Duyem: Bidestxistin

Di sala 1987'an de, piştî ku Saddamê dîktator rayeyên awarte da pismamê xwe General Mecîd û pê re, "operasyonên çewisandina serhildanê" ku li dijî kurdan carcaran pêk dihatin, veguheziya kampanyaya îmha û rûxandinê. Nûçeyên erjeng ji Kurdistanê belav dibûn. Di vê pêvajoyê de kurd, di şerê Îran û Îraqê de bibûn qurbanê helwesta Rojava ya alîgirê Îraqê. Rojava, li beramber şerê dijî radîkalên şoreşa Îranê, sûcên Saddam ên li nav welêt nedidît!

Artêşa Baas ku bi çekên konvansiyonel û gazên kîmyewî, bajarên Îrana (piranî Rojhilatê Kurdistanê yên wek Serdeşt) ku di şer de ye bi erdê re dikir yek, wê li qadên ku şerwanên kurd diparêzin çi nekirana? Şerwanên kurd jî ku derfeta wan a bergirîdanê kêm bû û tenezûlî bersîvdana bi heman şêveyê rejimê nedikirin.

Rejima Baas ku bêdengiya dinyayê jî dabû dûv xwe, dest pê kiribû Enfalê bi teknîka endezyariya tunekirinê û bi sebir pêk bîne. Wekî nîşaneyeke xerîb a qederê, li gorî îdîayên hin rojnamegerên popûler, Saddamê ku kurê Hîtler bû û li Libnanê hatibû dinyayê, her wekî "bavê xwe" yê ku li Ewrûpayê li Cihûyan kiribû, wî jî li Kurdistanê li kurdan dikir.

Her wekî di komkujiyên beriya wê de hate dîtin de, ji bo jiholêrakirina komekê; ewil car pêwîst bû ew kom bihata tarîfkirin, berhevkirin û tunekirin. Di tevkujî/Enfala kurdan a di navbera salên 1987-1989'an de rejima Baas, heman rêbazê bikar anî. Sekreterê Giştî yê Şaxê Bakurê Îraqê yê Partiya Baas Ali Hasan El Mecid, di navbera sibat û sê mehên li pey wê de, dest bi pêvajoya ''tarîfkirina'' koma ku di Enfalê de wekî hingav bê hilbijartin kir û tevgerên çewisandina li dijî kurdên li çolteran dijîn zêdetir kir. Bi biryarnameyekê, mafê kirîn/firotina milkan ji destê pêşmerge û malbatên wan stand; mafên zagonî yên kesên li deverên rizgarkirî û tampon ku qedexe îlan kiribû dijîn ji holê rakir, fermana kuştina sivîlên brîndar, "rûxîneran" û malbatên wan ên sereke da ku Mûxaberat wan wekî dijberên rejimê kifşe kiribû.

General Mecîd, di Hezîrana 1987'an de, li ser şêweya tevgera hêzên Îraqê yên li ser Enfalê û rabirdûya piştî wê du ferman da. Li gorî Elî Mecîd, gelê kurd ê ku li herêmên qedexe dijiya, li gel pêşmergeyan tevdigeriya, lewre ew jî dijmin bûn ku divê bêne tunekirin. Fermana yekem a El Mecîd, qedexekirina jiyana li deverên qedexe bû. Wateya vê qedexeyê, îmhakirina her tiştên biliv yên li wan deveran bû.

Di maweya 20'ê Hezîrana 1987'an de, bi belgeyeke duyem, fermana tevkujiyên girseyî dihate dayîn û kitekitên vê yekê dihatin rêzkirin. Di xala 4. a fermanê de, li berpirsê yekîneyan ferman dihate kirin ku "herkesê di qada qedexe de dijî, ji bo bi awayeke girseyî bêne kuştin, şev û roj ji beja û hewayê ve bêne bombebarankirin." Fermana din a El Mecîd wiha bû; "Kesên li wan gundan bêne girtin, divê bêne lêpirsîn, kesên temenê wan di navbera 15 û 70 de ne, divê bo navendê bêne veguhestin, piştî ku agahiyên pêwîst ji wan hatin wergirtin, divê bêne gulebarankirin."

Li gorî sîstematîka tevkujiyê, piştî bidestxistin û berhevkirinê wê îmha destpê bikira. Koma di hedefê de bû, hatibû hilbijartin. Dor hatibû tarîfkirina kesên di nav koma hatiye hilbijartin: Ew kesên wisa bûn ku divê bêne kuştin. Ev merhale hêsantir bû! Li gorî fermanên El Mecîd ên ku di Hezîrana 1987'an de hatibûn ragihandin, her mêrê li herêma Enfalê ye û destê wî çek digire, wê bihata kuştin. Artêş û Mûxaberat, lîsteyên ku navê kurdên girtî, cinsiyet, temen, devera lê dijîn û devera hatine girtin lê hatibûn nivîsandin, amade kiribû. Navendên serwîsa leşkerî, di 15'ê Adara 1988'an de vebûbûn. Di serê nîsan û gulanê de jî windabûnên girseyî destpê kir.

Piraniya kesên hatin binçavkirin, bo Topizawayê hatin birin ku biryargeha Elî Kîmyewî lê bû. Ev der kampeke artêşa Îraqê bû û li nêzîkî Kerkûkê bû. Hin kesên ku bi awayeke girseyî hatibûn neqilkirin, bo leşkergehên li Tikrîtê hatibûn veguhestin. Jin û zarok, bi kamyonan biribûn kampeke li bajarê Dibisê. Herçi girtiyên navsere bûn, bo girtîgeha Nugra Salmanê hatin şandin ku li Başûrê Îraqê ye û ji îngilîzan maye. Ji van 8 hezar navsereyan, bi sedan kes ji ber sedema sersarî û nexweşiyan mirin. Di dema Enfala dawî ya di meha îlonê de, sivîlên li Behdînanê hatibûn girtin, bi kiryareke heman rengî re rûbirû hatibûn hiştin. Piraniya wan li navendeke fireh a artêşê ya Duhokê dihatin hiştin. Jin û zarok bo kampên Selamiyeyê yên li nêzîkî çemê Dîcleyê hatibûn veguhestin. Piraniya jin, zarok û navsereyan, piştî efûya 6'ê Îlonê serbest hatin berdan, lê tu zilamek bi paşve venegeriya.

Piştî azadiya Kurdistanê û rizgarbûna Îraqê ji destê rejima Saddam, ji lêkolînên ser cesedên ku ji gorên tomerî hatine derxistin, diyar dibe ku winda-

www.arsivakurdi.org

hiyên Enfalê, bi awayê girseyên mezin hatine gulebarankirin û li derveyî Kurdistanê hatine binaxkirin. Heta salên dawî cihê sê gorên ku qurbaniyên Enfalê bi awayeke tomerî lê hatine veşartin, diyarbûne. Yek ji wan, li li bajarê Ramadiyê ya li ber qeraxê bakurê çemê Firadê, yê din li herêma Xedrayê ku li başûrê Mûsilê ye, yê din jî li çola bajarê Semawayê ye. Di 3 salên dawî de jî, li Çiyayê Hemrînê, di navbera Kerkûk û Tikrîtê û li rojavayê bajarê Tuzxurmatuyê jî gorên tomerî hatine dîtin. Cesedên ku ji çend mehan carekî ji van goran tên derxistin li Kurdistanê li gel merasimên xemgîn careke din li ser xaka xwe tên veşartin.

Li Kurdistanê hê jî bi dehezaran jinên kincreş ên ku şînê dikin, bi hêviya ku wê rojekê cendekên xizmên wan ên winda ji gorên tomerî derkevin, ji "Wezareta Xizmeta Malbatên Enfalkirî û Şehîdan" ku di bin banê Hikûmeta Federe ya Kurdistanê de hatiye avakirin, li benda agahiyekê ne.

## Qonaxa dawîn: Qirkirina sivîlan

Enfalê, bi kiryara yekem a merhaleya yekem ango 4 meh piştî serjimariyê, şeva 23'ê Sibata 1998'an, bi êrîşa li dijî baregeha YNK'ê ya li gundê Sergelo-Bergeloyê dest pê kir. Enfal, di 8 merhaleyan de pêk hat ku 7 ji wan, li herêmên jêr kontrola YNK'ê de bû. Enfala yekem ku biryargeha YNK'ê kiribû hedefa xwe mehekê ajot. Pêlên din ên kampanyayê bi piranî kurtir ajotin. Enfala duyem ku li herêma Qeredaxê pêk hat, ji 22'ê Adarê heta 1'ê Nîsana 1988'an; Enfala sêyem ya ku li herêma Germiyanê pêk hat, 7-20'ê Nîsanê, Enfala çarem ya ku li herêma Zê pêk hat û ya herî kirt ajot, di navbera 3-8'ê Gulanê de pêk hat.

Herêma jêrdestê PDK'ê ku diket bakur-rojavayê Başûrê Kurdistanê, ji ber ku ji sînorê Îranê dûr bû, li gorî Baasê kêm xeter bû. Ev herêm, bû hingava Enfala dawî ya ku di Tebax û Îlona 1988'an de pêk hat.

Yekîneyên artêşa Îraqê, di demên van kampanyayên tevkujiyê de, bi tenê di dema Enfala pêncan de ku 15'ê Gulanê, li qadên çiyayî yên Hewlêrê pêk hat de, rastî berxwedaneke dijwar a pêşmergeyên YNK'ê hatin. Li ser vê yekê, artêş demeke kirt navber da operasyonê. Bi fermaneke ku ji ofîsa Saddam hat, Enfalên şeşem û heftem, di mehên tîrmeh û tebaxê de du caran pêk hat. Paşê, di 26'ê Tebaxê de, herêma dawî ya di kontrola YNK'ê de, wek heremên "paqij" hatin îlankirin.

Di heman demê de Îran, piştî ku şertên ku Îraqê yên ji bo dawîlêanîna şer pejirand, gelek yekîneyên Îraqê ku ji eniyê hatin vekişandin û berê xwe dan herêma Behdînanê. Enfala dawî, sibeha 25'ê Tebaxê dest pê kir û di nava çend rojan de bidawî bû.

Di 6'ê Îlona 1988'an de, rejima Îraqê ji bo kurdan efûyeke giştî îlan kir, bi awayeke eşkere serkeftina xwe îlan kir. Tevkujiyên li Kurdistanê, serkeftinên ku Baas di "Şerê Qadisiyeyê" de li dijî Îranê bidest xistibû dihatin pirozkirin. Heta rejima Saddam rûxiya jî, ragehadina dewleta Îraqê û medyaya wê ya fermî heman hovîtiyê berdewam kirin.

Rejima Îraqê, bi avakirina strukturêke zagonî û burokratîk, bûbû yekem dewleta ku bi bombeyên kîmyewî êrîşê welatiyên xwe kiriye, derbasî dîrokê bû. Balafirên Îraqê di 15'ê Rêbendana 1987'an de bi gazên jahrê êrîşê ser navenda PDK'ê ya li Zewa Şakana bi ser bajarê Duhokê ku li ser sînorê Tirkiyeyê û gundên Sergelo-Bergelo yên bi ser bajarê Silêmaniyeyê kiribûn. Di 16'ê Rêbendanê de, gundên Balîsan û Şêx Wesan rastî êrîşên kîmyewî hatin. Di van tevkujiyan de, zêdetirê wan jin û zarok, ji sedî zêdetir sivîl hatin qetilkirin. Bi dehan kesên ku di van êrîşan de birîndar bibûn, ji nav nivînên xwe yên li Nexweşxaneyên Hewlêrê hatin derxistin û qetilkirin. Ev êrîşên hanê, bûn destpêka 40 rêze êrîşên ku 18 meh berdewam kir û bû sedema kuştinên cemawerî.

Rejima Baas, bê ku jin û zarokan cûda bike, hedef û struktura xwe ya kuştina kurdan a girseyî îlan dikir. Di navbera mehên Nîsan û Hezîrana 1987'an de, bêhtirî 700 gundên li ser riyên bajaran ku di bin kontrola artêşê de bûn hatin şewitandin û piraniya niştecihên wan hatin kuştin. Merhaleya sêyem a operasyonê, ji ber kêmbûna derfetên artêşê ji ber tengasiya di şerê Îranê de, hate taloqkirin. Lê ev merhale, wê bi Enfalên ku piştre pêk werin, hatin telafîkirin.

Piştî êrîşa yekem piyadeyên Îraqê û Cahşan, dor li herêma ku hatibû destnîşankirin pêçan, tevahiya navendên jiyanê ruxandin, malan talan kirin paşê jî yekîneyên rûxînêr dihatin û agir bi malan dixistin. Bi destpêka rûxandinê re, pêvajoya "berhevkirin û bidestxistina" cemawera kurd ku di hedefê de bû bipêş diket. Yekîneyên Îraqê, herêmên zindî yên Kurdistanê ku jiyan lê hatibû qedexekirin, tarûmar dikirin.

Dema ku qamyonên leşkerî yên artêşê, gundiyan bi karwanan ber bi navendên komkirinê û kampan ve dibirin, Cahşan jî ji bo kesên ku li çolteran belav bûbûn desteser bikin, li herêmê digeriyan. Yekîneyên Cahşan ku ji endamên eşîrên herêmê hatibûn berhevkirin, alîkariya kurdên sivîl dikirin ku ew ji qadên operasyonan derkevin û bi saya wê alîkariyê jiyana bi hezaran sivîl rizgar bûbû.

Di vê navberê de, Muxaberata ku sihêtiyeke tund li bajaran kiribû, li gelek deveran operasyona girtina qaçaxên Enfalê pêk dianî. Rejim, bi îlanên efûyê yên xapînok, nêçîra kesên ji Enfalê filitîne dikir.

## Taktîkên cêwî: Nazî û Baasê

Ligel ku Enfal bi awayeke anormal û hovane dihate meşandin jî, heta vê merhaleyê, hinek taybetmendiyên çewisandina dewletan yên li ser serhildanan nîşan dida. Li gorî belgeyên fermî yên Îraqê ku piştî destkariya Amerîkayê ya sala 2003'yan derketin holê, dide xuyakirin ku armanca sereke ya artêşê çewisandina serhildana kurd bixwe ye. Lê ev armanc, rastiya ku Enfal tevkujiyek e ji holê ranake. Lê di navbera çewisandina serhildanekî û tevkujiyekî de ferqeke taybet tuneye. Di rastiya xwe de, yek ji wan, ji bo bikaranînê alîkariya ya din dike. Di mînaka Kurdistanê de jî, ya ku pêk hat ev bixwe bû. Mirov dikare wiha bibêje: "Di dema diyarkirî de, artêşa Îraqê serhildana kurd ango bi gotineke rastir ji bo berxwedana kurd biçewisîne, tevkujî pêk aniye."

Partiya Sosyalîstên Nasyonal yên Alman (NAZÎ), li Ewrûpayê qetlîamên girseyî û rejima holocaust ya li dijî cihû û dijberan wek "bergîdanên awarte, çalakiyên taybet, jinûvebicihkirinên li Rojhilat" binav dikirin. Herçi Baasî bûn, tevkujiya kurdan wek "bergîdanên girseyî û jinûvebicihkirinên li Başûr" bi nav kirin. Sûcê rejima Baas yê ku li dijî kurdan pêk dianî û di bin van binavkirinan de hewl dida veşêre, serdanpê dişibe ravekirina tevkujiyê ya bi rengê; "Niyeta tunekirina tevahî an jî qismî ya komên netewî, etnîkî, nîjadî, an jî olî."

Sîstema Baas a kampan, ligel ku yek ji awayên tevkujiya Naziyan dianî bîra mirovan; rêbazên kuştinê yên ku kurdên ji tevkujiyê rizgar bûne digotin, dişibe çalakiyên "Einsatzgruppen/Komên tevger" ango "Yekîneyên seyar ên kuştinê" yên Naziyên li Rojhilatê Ewrûpayê. Komên Tevgerê, li Almanyaya Naziyan, navê yekîneyên seyar ên înfazê bû. Ev dezgeha artêşa Alman ku di bin kontrola Heinrich Himmler û Reinhard Heydrich de bû li deverên dagirkirî mal bi mal digeriyan; cihûyan, romanan û komûnîstan dikuştin. Tê texmînkirin ku Einsatzgruppen di navbera salên 1941-1945'an de bêhtirî 1.3 milyon cihû gulebaran kiriye û kuştiye. Bi navê A, B, C û D'yê 4 tîmên Einsatzgruppenê hebûn û her yekîne ji 600-1000 leşkerî pêk dihat.

Her teknîkên standart ên tunekirinê ku Komên Tevgerê yên Naziyan bikardianî, li Kurdistanê ji Elî Baasiyan ve hatine bikaranîn. Li gorî vê yekê hinek komên girtî hatin rêzkirin, ji pêşve hatin gulekirin û bo gorên girseyî ku berê hatibûn kolandin, hatin dehfdan; kesên din, di çalên ku bi dehfdanê ketinê de bi teqeyêb tifingên otomatîk hatin kuştin. Kesên mayî çawa ku masiyan davêjin ser hev, li ber kesên ku nû hatine kuştin, hatin dirêjkirin û gulebarankirin; hinekên din bi hev re hatin girêdan, li ber keviya çalên xwe ji paş ve hatin kuştin. Paşê buldozeran, komên cesedan bi ax û qûmê nixûmand. Li hinek qadên gorên girseyî, bi dehan çal hatine tespîtkirin. Li van deran, cesedê bi hezaran qurbanî hatine veşartin. Li gorî çavkaniyên kurd, di pêvajoya Enfalê de 182 hezar kes, li gorî hinek dezgehên ihtîyadkar herî kêm 50.000 gundiyên kurd hatin kuştin.

Komkujiya Burokratîk Li gorî xala 1. a Peymana Tevkujiyê; "Tevkujî, di dema aştî û şer de, di bin banê peymanên navnetewî de sûc e." Înfazkirina bêdarez ya endamên girtî yê komeke etnîk-netewî yê ne şerwan-çekdar, şêwaza nakokiyê çi dibe bila bibe, di şer de an jî çewisandina serhildanê de, wekî tedbîreke yasayî nayê pejirandin. Gelek taybetmendiyên operasyonên Enfalê yên Baasê, li dervayê awayên tefandina serhildana ye. Qewimînên piştî ku operasyonên leşkerî digihêjin armanca xwe pêk tên, sedema vê yekê bi awayeke zelal eşkere dike. Bi awayê girseyî qetilkirina bi dehezaran kesan an jî windakirina wan, bi awayê avêtina gazên kîmyewî bo bi dehan deverên kes lê dijîn û kuştina bi hezaran kesan û bi awayeke erjeng reva gelek kesên din ji cih û warên xwe; texrîbkirina mulkiyeta malbat û civakê û tevahiya berhemên çandiniyê yên aboriya kurdên li çolteran; cezakirina bi hezaran jin, zarok û kesên pîr-kal ên di nava şertên girtina hovane de û di encama vê yekê de mirina bi sedan ji wan… Enfala ku wekî hewldaneke burokratîk a dewletê dihate rêxistinkirin, wekî tevgera çewisandina serhildanê jî, xwediyê merhaleyên xas e. Bicihanîna wê bi destê Cahşan û yekîneyên leşkerî yên ku girêdayê artêşa nîzamî bûn. Sivîlên ku di operasyonên Enfalê de hatibûn berhevkirin, ji bo ku bêne tarîfkirin, tasnîfkirin û di pêvajoya dawî de bêne tunekirin, bo aparateke din dihatin dewirkirin. Dezgehên cuda yên wekî Mûxaberat, emnîyet, Cahş û Partiya Baas di Enfalê de rol lîstibûn. Kampên berhevkirinê û qadên tunekirinê, gelek dûrî Kurdistanê hatibûn avakirin. Qetilkirina kesên girtî û komkirî, di hevdema merhaleya leşkerî ya çewisandina serhildanê re pêk nehat. Komên berhevkirî-girtî, piştî ku tevgera yekîneyên leşkerî qediya, gelek paşê hatin îmhakirin. Belgeyên fermî yên hatine bidestxistin, dide xuyakirin ku dewleta Îraqê qetlîamên girseyî, windabûn, koçberkirin û kampanyayên din ên li dijî kurdan bi awayeke hûr-

www.arsivakurdi.org

bînî plan kiriye. Tevî ku ev çalakî bi awayeke navendî dihat birêvebirin, tevgera navborî, bi koordînekirina gelek dezgehên fermî; ji qesra Saddam heta yekîneyên artêşê û Cahşên li dereceya herî dawîn ve dihate birêvebirin û Enfal bi koordînas- yona hemû dezgehên dewletê û di hemû astan de hatibû pêkanîn. Hemû merhaleyên Enfalê, kêm-zêde xwediyê heman taybetmendiyan bû. Êrîş, ji hewayê bi bombebarana li dijî hedefên sivîl û pêşmergeyan û bi operasyonên leşkerî yên li dijî senger û baregehên şervanên kurd dest pê kir. Xerdel û kokteyla mirinê ya gazên jahrî, ji pêşmergeyên ku hinek ji wan maskeyên gazê bidest xistibûn û bi rêbazên jirêzê xwe diparastin bêhtir, li ser sivîlan bandoreke kujînertir dikir. Di êrîşên bi gazên kîmyewî de, di Enfala duyem a li gundê Sayw Senanê ji 80'yî zêdetir kes, di Enfala çarem a li Goktepeyê ji 150'yî zêdetir kes, di Enfala pêncem a li Warayê 37 kes mirin.

Di 16'ê Adarê de, li bajarokê Helebçe di encama êrîşa gazên kîmyewî de, bi qasî 5 hezar sivîl hatin kuştin. Di rastiyê de dibe ku Helebçe, di kampanyaya Enfalê de xwediyê hingaveke taybet nebû. Ev êrîş, li dijî bidestxistina Helebçeyê ji hêla pêşmergeyan ve bergirîdanek rejimê bû. Lê ev êrîş bi her awayî parçeyek ji tevkujiya kurdan û lûtkeya wê bû.

## Hertim Enfal

Enfal, bi awayê leşkerî, di 6'ê Îlona 1988'an de bidawî bûbû. Li gorî generalê Enfalê, Elî Kîmyewî ku niha li Bexdayê, di zindanekî de girtiye û ji bo neyê îdamkirin, di rûniştanan de lavayî dadgeran dike, "Kêşeya Kurd çareser bûbû, rûxîner ji holê hatibûn rakirin." Bi ser de rejim, efûyeke giştî îlan kiribû. Lê feraseta qetlîamkar a rejimê li holê mabû. Ji bo kesên ji zindanan hatin berdan û kesên ku di çarçova efûyê de ji sirgûnê vegeriyan bi gotineke din kesên ku tevahiya derfetên wan ên madî hatibûn tunekirin, bi tu awayî piştgirî û tazmînatek wernegirtin. Ew li qadên komelî hatin bicihkirin. Sivîlên ku xwestin alîkariya wan bikin, ji hêla Mûxaberatê ve hatin şopandin. Enfalzede, li ser axa zelûl a Hewlêrê li kampên ku ji bilî têlên rêsayî û bircên çavdêriyê pêve tiştek lê tunebû, hatin avêtin. Li vê derê bi sedan kes ji ber nexweşî, birçîbûn, serma an jî tunebûna xwarinê û bandorên gazên kîmyewî ku paşê derketin holê, jiyana xwe ji dest dan.

Piştî îlankirina fermî ya bidawîbûna Enfalê, dawiya 1988'an û di 1989'an de bi dehan gundên Cahşan jî hatin şewitandin û rûxandin. Yekîneyên leşkerî, bajarokê Qeladizê rûxandin û dorhêla wê "herêma qedexe" îlan kir. Di bin rejima Partiya Baas a Saddam de polîtîkayên kuştin, îşkence û şewitandina gundan, wekî pariyeke ji jiyana rojane berdewam kir.

Piştî merhaleyên dijwar ên Enfalê jî, girtin û îdamkirin berdewam kir, di nav kesên hatin îdamkirin de, kesên ku di dema efûyê de girtî bûn jî hebûn. Sê bûyerên îdamê yên girseyî ku di dawiya sala 1988'an de pêk hat, di raya giştî ya cîhanê de deng veda. Di yek ji van bûyeran de 180 kurd hatin kuştin. Piştî serhildana 1991'ê ku Kurdistan bi saya wê azad bû, li gorî belgeyên ku di avahiyeke Mûxaberatê de hatin bidestxistin, di heşt mehên destpêkê yên sala 1989'an de 87 kes hatibûn sêdarekirin. Di nav qurbaniyên rejima Baas de, mamosteyê lîseyê Dilşad Merîwanî, ku bi hinceta "fêrkirina kurdî bi tîpên latînî" hatibû tawanbarkirin jî hebû.

Û ez bi hevpîşeyê xwe rojnamevan Mustafa Çuwarteyi ku yek ji şagirtê mamoste Dilşad bû, di heman buroyê de, hewl didin bîranînên Enfalê zindî bihêlin, windahiyên wê, tiştên ku ji me bir, bibîr bînin û yadaştên wê zindî dihêlin…

FAYSAL DAĞLI



HASAN HÜSEYİN DEVECİ – "Serçav" (2008)

**Jêder:**
- George Black, (Genocide in Iraq: the Anfal campaign against the Kurds / Li İraqê Jenosîd / Li dijî Kurdan kampanya Enfalê) Human Rights Watch. ISBN 1564321088.
- David McDowall, A Modern History of the Kurds, (Dîroka Nûjen ya Kurdan) (2004). I.B. Tauris. ISBN 1850434166.
- Robert Paul Bartrop, Samuel Totten, Jacobs Steven L. (Anfal; Dictionary of Genocide / Enfal; Ferhanga Jenosîdê) Greenwood Publishing Group, (2008).
- Maggy Zanger, (Refugees in Their Own Country / Penaberên welatê xwe) Middle East Report (2002).
- Çend raportên din yên; Amnestry International / Rêxistina Efûya Navnetewî, Human Rights Watch / Rêxistina çavderiya Mafê Mirovan, Middle East Watch / Rêxistina Çavderiya Rojhilata Navîn di derbarê Enfalê de.

www.arsivakurdi.org

YARÎ Û QAZANC

# Gladyatorên mîlenyûma sêyem

Gelek dewr û dewran buhurîn di ser wê çaxê re ku li Romayê gladyatoran ji bo kêfa dilê qerebalixan bi rêwresmekê heta kuştinê şerê hev dikirin. Piştî rabûna van pratîkan, şêwazên şer yên birêzik û bisîstem derhatin. Ji palewaniyê heta boksê û di wir re heta digihe hunerên şerî (judo, karate, kendo). Heta ku di salên 1990'an de, şîrketên medyayê, çav li sûdwergirtina ji bazarên nû, yariyên meydanî dîsa dadihênin: Şampiyonayên şerê nihayî dîsa li meydanê ne.

MAARTEN VAN BOTTERNBURG
JOHAN HEILBRON *

12 Mijdar 1993'an, Gerard Gordeau yê holendî, kîk-boksor (kick-box: hunereke şer e ku boks û karateyê têkel dike) û karatekayê (yarîkerê sporta karateyê) full-contact (temasa temamî), ji bo "şerekî nihayî" li dijî Teila Tuliyê palewanê sumoyê yê ji Hawai'yê dikeve nav qefesa heştgoşe, ku di nav McNicholas Meydana Sportê li Denverê (Colorado) de hatiye bicihkirin. Her ji destpêka berêkaneyê, palewanê sumoyê ku nêzîkî 80 kîloyan ji reqîbê xwe girantir e, hemleyan dibe ser Gordeau. Grodeau vedikişe, xwe ji êrîşan diparêze û bi vî awayî berî ku bihêle reqîbê wî lê nêzîk be hêz û taqeta wî dibire. Tuli dilikume û dikeve ser berrikê û rûniştî disekine. Hinekî muşewiş bûyî, li jorê dinihêre. Gordeau bilez pehînekê bi piştpêyê xwe li nav çavên wî dikute. Diranek ji nav tîrikên qefesê difire û di nav temaşevanan de berze dibe. Çengek xwîn ji çeneya Tuli dirije. Ji nişkê ve, û li derveyî rêzika ku dibêje "ti rêzik" nîne, hakem şer radiwestîne. Şerê wan bîst û şeş çirkeyan kêşabû.

Şerê nihayî qediya. Bi xêra kanalên xwe yên Pay Per View (PPV, sîstema ku temaşevan serê bernameyê pere didin) heştê hezar malên amerîkî hazir bûn li pêş şerî. Piştî hingî, ew wê bibînin ku Gordeau careke din qazanc dike, tevî destekî şikestî û brîneke li pêyê xwe, û paşî wê têk biçe di fînalê de li hemberî jujitsukayê (yarîkerê jujitsuya kevne-sporta japonî) brezîlî Royce Gracieyê ku 50.000 dolaran (34.000 eruo) werdigire beramber serkeftina xwe ya di yekem şampiyonaya şerê nihayî de (Ultimate Fighting Championship, UFC).

Di van cûre şeran de, ji bilî gezkirin û çavderxistinê, her tişt serbest e; derbên mist û pehînan, xwe gava reqîb li erdê û bêparastin be jî; fetisandin, porkêşan; cot-qufil (teknîkeke şer ye ku şervan bê derban bi rêya zeftkirina movikeke reqîbê xwe wî bêtesîr dike), derbên enîşkê, serlêdan... Mêr bi destên rût şer dikin –bê senifandina li gorî giraniyê, ne raund (her dewreke boksê), ne sînoreke wextî, ne lijne, ne xal. Tenya rêya derketinê knock-out (KO) (nakawt) an jî ji reqîb re serşorkirin e. Boksor, palewan, judoka û kîkboksor radibin têne hember hev da ku bersivê bidine pirseke bi qasî dinyayê kevn: Kî, ji wan ên ku di vê an wê dîsîplînê de hosta ne, bi rastî bihêztirînê herî bihêzan e?

Di pêşkêşkirina van berêkaneyan a bo cemawerê de ti pêwendî digel cîhana sportê an jî digel her çi berêkaneyeke birêzik nayê danîn. Wekî ku bergên vîdeo kasetên tûrnûwaya yekem eşkere dikin, *"ti rêzik nînin"; "mirovên herî xeter ên cîhanê şerê hev dikin da ku sax bimînin li ser rînga mirinê ya heştgoşe. Ti rêder nîne. Li ser rîngê, ti cihê xweveşartinê, ti cihê xwespartinê nîne."*

Şerê nihayî an jî "şerê di qefesê de" tavilê ji xwe re ciheke baş peyda kir di nav qada hunerên şerî yên full-contact de. Belavbûn û navdarbûna wî ya ji nişkê ve kir ku gelek cûreyên wê derbên li dinyayê. Wekî di mînaka *vale tudo*'ya ("bedela her tiştî") brezîlî de, ev tûrnûwa bi xêra rêzeke biwêjan gelek binavûbang lêhatin, ku berêkaneya wan biwêjan di qada navneteweyî de bi rê ve diçe: *absolute fighting* (şerê mutleq), *extreme fighting* (şerê tund), *cage fighting* (şerê di qefesê de), *world combat* (şerê cîhanî), free fight (şerê serbest), *warrior combat* (şerê şervanan), *pancrase, cage wars* (şerên qefesê), *millenium brawls* (qirênên mîlenyûmê), *ultimate combat* (şerê nihayî). Biwêja *"no holds barred"* (NHB) –"hemû derb serbest"– pareke hevbeş a hemûyan e.

Gava ku ev diyarde ji çarçova kovarên hunerên şerî û kovarên mêrane yên wekî *Playboy* û *Penthouse* derket, gengeşeyeke giştî/cemawerî gurr bû: *"Wan heyamên dawî min kurê xwe li pêş bernameyeke telewîzyonê dît ku navê wê "Ultimate Fighting Championship" bû; ez pir heyirîm. Mirov hema bêje ji bo kuştinê şerê hev dikin. Çima destûr didin belavkirina bernameyeke wiha li ser telewîzyonê? Gelo ma qanûnî ye?"*, dipirsin bihêrsane gelek kesên ku nameyên gazindan ji Kovareke emerîkî re dişînin (1). 1996 û 1997'an, rêxerên wan tûrnûwayan tûşî kêşeyeke mezin dibin gava ku gelek ji wan kanalên bikablo, ji ber fişara siyasî, nema şeran belav dikin; hingî bazara bixêrûbêr a PPV dike îflas bike.

Li Hollandayê, welatê nisbeten girîng di warê sportên şerê full-contact de, sekretera dewletê ji bo karûbarên sportê Erica Terpstra, di bihara 1995'an de, eşkere dike ku nabe navê sport li van *"berêkaneyên kirêt"* bê kirin û herwiha diyar dike ku ew bi xwe rê nade wan. dndamên parlamenê banga reaksiyonên hişk dikin li hemberî berêkaneyên NHB'yê; federasyonên sportê xwe mecbûr dizanin dijayetiyê lê bikin; şervan û rêxer bi xwe jî qebûl dikin ku tundiyeke zêde heye di karê wan de. Dotira roja şîroveya stî Terpstrayê, Gordeau şerê di qefesê de wek *"qira bimerasîm"* wesf dike. Thom Harinck, rahênerê kîk-boksê yê pir binavûbang, di wê derê de *"sergermiyeke cemawerî ya barbar"* dibîne. Lê belê, herdu jî li dijî qedexekirinê derdikevin.

## "Karate têra xwe aksiyonê nade"

Çawa ev mesele gihîşte vê qonaxê? Hemû vedigere salên 1970'an. Heyamên ku di nav cîhana hunerên şerî yên naskirî de –judo, karate, tekwando, hwd.- hesta nerihetiyê mezin dibe beramber şert û mercên hişk ên ku federasyonên sportan li ser wan ferz dikirin, herwiha dîsa di wan heyaman de dîsîplînên şikûdartir, wekî kîk-boks û tai-boks (2), pêş diketin. Kovarên pispor rexneyên xwe zêdetir dikin li ser sportên heyî: *"Karate têra xwe aksiyonê nade ji bo cezbkirina bala mirovan* (3)*."* Li ser vê yekê, çend hostayên hollandî şêwazeke berwext a hunera şerî ya têkel durist kirin, navê "barokai" lê kirin: Terkîbeke rewtên cihê, û ne şêwazeke bi çêja şerê kolanan: *"Em hîç naxwazin navê me digel pankras* (4) *an jî 'sportên' şerî yên manend bê hildan, ji ber ku armanca wan birêkirina reqîb bo nexweşxaneyê ye di rêyeke kirt re. Di her hal û karekê de divê em rê li ber vê hindê bigirin. Barokai divê heta heta wekî sporteke baş û dilsoz û bêkêmasî bimîne* (5)*."* Lê belê, dawiya çîroka hewla wan dibe têkçûn.

Demeke dirêj rêzik û nîzama piraniya hunerên şerî li gorî elaqe û hêviyên tevahiya yarîkeran dihatine diyarkirin. Lê belê, berev dawiya sedsala XX'an, berêkaneyên sportê her zêdetir qerebalixan li dora xwe berhev dikin, lewma birêkxistina wan jî bêtir li gorî daxwaz û elaqeya temaşevanan çêdibe.

Di salên 1990'an de, bazara telewîzyonê, bi xêra dahênana kablo û peykan ji bo weşanan, şahidiyê li berfirehbûneke bilez dike. Mezintirîn torên emerîkî (ABC, NBC, CBS, FOX û ESPN) mafê xweşdivîtirîn rûdanên sportê di destê xwe de digirin;

** Bi rêzê, profesorê sosyolojiya sportê li zanîngeha Utrecht'ê (Hollanda) û lêkolîner di Navenda Sosyolojiya Ewrûpayî de (Centre national de la recherche scientifique, CNRS). Versiyoneke gelek dewlemendtir a vê gotarê –"Dans la cage. Genèse et dynamique des "combats ultimes""- berdest e di wê hejmara Actes de recherche en sciences sociales de ku ji bo babeta "Pratiques martiales et sports de combat" hatiye terxankirin (n° 179, Paris, Îlon 2009).*

www.arsivakurdi.org



*Şûrê gladyatoran hîn jî tûj e! (Swords of Fantasy)*

şîrketên herî biçûk, wekî SEG, li bazarên nû digerin. Yên ku herî zêde tesîrê li ser şêweyê şerên qefesê bike ew şîrketên telewîzyonê ne. Ji ber ku armanc ew e ku her çi zêdetir bala xelkê bikêşin, teknîk û şêwaz nema têne pêş çavan, ya girîng ew e ku hest û heyecan bilind bibe bi xêra numayişa wan şeran –ew hest û heyecan jî bêguman bi xêra berçavkirina tundî û şideteke her zêdetir û qestî pêk tê.

Çawa ku di salên 1980'an de derketina manyetoskopê belavbûna pornografiyê hêsan kir, telewîzyona PPV jî vê şêwaza nû ya bezm û sergermiyê tîne. Coş û peroş bi rêya derbaskirina sînorên asayî dixuliqe, bi rêya nakawtên dramatîk, bi tundiya "rasteqîne", anku bi rêya wî tiştê ku gelek caran dûrîdest û qedexe ye.

Li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê, şampiyonayên şerê nihayî tavilê cihê xwe digirin di nav bernameyên PPV'yê yên herî navdar de; her berêkaneyek di nav kurtedemekê de zêdetir ji 10 milyon Dolaran (6,7 milyon Euro) tîne. Yekem şampiyonaya şerê nihayî ya li derveyî Dewletên Yekgirtî li Japonyayê hate birêkxistin, û li wê derê, mezintirîn qerebalixa ku heta niha ji bo tûrnûwayeke hunerên şerî hatiye tomarkirin berhev bû. Vîdeokaseta yekem UFC'ya bi îngilizî, ji hemû kasetan zêdetir tê kirêkirin. Serkeftina wê ya tucarî eşkere ye, lewma şîrketên din ên medyayê hespê xwe dixurin û ji formûla UFC'yê berhemên nêzîkî wê durist dikin. Pêşî, Peters Entertainment Group, World Combat Championship'ê belav dike. Battlecade, ku şaxeke General Media Internationalê û çêkerê *Penthouse*'ê ye, berêkaneyeke din bi navê Extreme Figthing belav dike.

Birêxistina wan, motîvasyonên tucarî bi eşkereyî nîşan dide. Hakem, dawer û yên ku xalan dihejmêrin, bi kesên ji endûstriya medya û entertainmentê (bezm û şahî) hatine guhertin: Serokê yariya UFC'yê reklamkarekî kevn e; dîrektorê hunerî John Millus derhêner e; produktor û belavkar ne rêxistineke sportîf e, lê şîrketeke telewîzyonên PPV ye.

Herçend serê pêşî şampiyonayên şerê nihayî wekî berêkaneyên stîl û şêwazên cihê hatibûne sêwirîn jî, berpirsên belavkarî û pêşxistinê zû pê hesiyan ku ti girîngiya vê nîne li ber çavên muşteriyên temaşevan. Bi ya serokê UFC Art Davie'yê piraniyeke zor a cemawera PPV'yê pêk tê ji *"zilamên ku hez ji fûtbola NFL'yê* (National Football League) *dikin, les* truck pulls (6) *û palewanên pîşeyî –ew aksiyonê dixwazin. Zêde rengê wê hindê nade ku ew dê bala xwe bidine ciyawaziyên hunerên şer û stîl û şêwaza şervanan qet li ber guhê wan nabe* (7)*"*.

Ew kesên ku dikevine ber cezabeta wê tundiya ku ji jiyana rojane vederkirî ye, hez ji wê coş û peroşê dikin ku bi rêya derbaskirina rêzikên asayî û bi temaşekirina wan berêkaneyan digihinê, lewre ji bo wan ew berêkane zêde ne dûr in ji rastiya şerekî kolanan.

Palewanên ku hemû çav li ser wan in, bêguman xwedanê vîzyoneke din in. Ji bo wan maç têne wateya qazanca ji rîsk û xeterên rasteqîne lê diyarkirî. Çima xwe li wê xeterê didin? Ji bilî perewergirtina ji beşdarîkirinê, û di dawiyê de bidestxistina pereyê xelatê, berêkanekirin wan navdar dike û ji wê derê re jî serkaniyên din ên dahatê bi dest dikevin: ders, numayiş, girêbestên ji bo şerine din, rol di fîlm û reklaman de (ji bo navendên hunerên şerî ku ew digel dixebitin jî wan karan dikin). Atletên herî ciwan û yên di lûtkeya kariyera xwe de, ku haydar in ji rîsk û xeteran, xwe ji berêkaneyên wisa diparêzin. Brînek dikare wan malwêran bike.

Hema bêje hemû palewan kevne-şampiyonên wan sportan in ku tê de kêm pere heye. Kariyera wan nêzîkî dawiya xwe dibe, lewma wextê wê hindê ye ku sûdê ji "sermiyanê xwe yê fîzîkî" wergirin. Berêkane paye û rêzdariyê dide wan di nav cîhana hevpîşeyên xwe û cemawera hunerên şerî de. Çûna nav qefesê de hereketeke pir dilêrane ye û fîzîka wan a sersûrker, hêza ku ew didin ber projektor û kamerayan ditirsîne û diheyirîne.

Yek ji wan hestên xwe yên têkel wiha derdibire: *"Ji her çi hunera şerî bêtir, ev şerê kolanan e. Min jî ew şer kir. Ez di wê qefesê de bûm. Min dorrand lê min tiştek ji dest neda, rast e. Lê ez dibêjime we: Rojekê yek wê xwe bide kuştin. Ewê li vir be, dirêjkirî li ser rîngê, mirî. Wekî sportkarekî, ev ezmûneke seyr e ku mirov divê carekê bijî. Ji ber ku tu dixwazî bizanî. Ev dike ku tu bi paş ve vekişî, lê te serbilind jî dike. Tu dikarî ji xwe re bêjî: 'Min carekê kir.' Lê, wekî sportkar û wekî mirovekî, ez ji we re dibêjim, şerê nihayî bi rastî gelek xeşîm e. Bi min ev ne heqê ti kesî ye ku pehînan li serê zilamekî li erdê bide. Me divê bêjin: 'Baş e, zilamno, em bi tenê dikarin ji xwe re şerekî kolanan derxin' "*.

## Bêtir atletên li dawiya kariyera xwe

Beramber kampanyayên qedexekirinê yên li hinek dewletên Amerîkayê, Kanada û li Brîtanyayê, berpirsên şîrketan stratejiyên xwe diguhorin. Rêxerên ji şîrketên herî biçûk, bi dizî ve, dûrî çavên medya û meydana siyasî, bi awayekî hema bêje deryasayî berêkaneyan amade dikin. Bo nimûne, rêxerê şeran yê li Hollandayê, "cihê xwe diguhore" ji bo birêvebirina bernameya xwe bêyî ku bala rayedaran bikêşe ser xwe; ji bo wê hindê diçe dûrgeya hollandî ya bi navê Aruba li Karayîban, û Saint-Petersbourgê li Rûsyayê. Komeke din hewl dide ku şeran bi awayekî cihê û nermtir bi rêk bixe da ku wan wekî "sport" bide qebûlkirin, destûra birêkxistina wan wergire û mafê têketina nav bazara PPV'yê dîsa bi dest bixe. Ev rêya berpirsên UFC'yê li DYA'yê.

Di her hal û karekî de, telewîzyona bipere, bazara DVD'yan, dabarkirina li ser înternetê û herwiha *streaming* (debarkirin û temaşekirina hevkat) rê didine firotin û belavkirina wan berêkaneyên ku mekanîzmayên kontrolê yên netewî û navnetewî jê re nema bi kêr tên. Li vir, mîna warên din ên jiyana sosyal ku hest û xeyal lê li kar in, ti tişt bi qasî tiştê ku wekî rastiya nihayî tê pêşkêşkirin peroşîner nîne.

**Werger ji fransî**
**Ergin Opengin**

[1] *Parade Magazine*, 10 kanûn 1995, raguhestina Lawrence A. Wenner, *Media-Sport*, Routledge, Londres, r. 252.

[2] Sportên şerî yên edetî, her wekî palewanî an boksê, xwedanê rêzikên xwe yên hişk in, û tundûtîjî jî sînordar e.

[3] *Zendokhan*, n° 4, Amsterdam, 1985.

[4] Sporta ku di Antîkîteya Yûnanan de dihate kirin û, derbên kujende jî tê, de hemû derb serbest bûn.

[5] *Zendokhan*, n° 4, Amsterdam, 1985.

[6] Numayişên ku tê de kamyonên pir mezin barên giran dikêşin.

[7] Clyde Gentry, *No Holds Barred: Ultimate Fighting and the Martial Arts Revolution*, Milon Books, Preston (Brîtanya), 2005.

www.arsivakurdi.org


ÇÎN

# Vegera şoreşa çandî

Gava ku di 1'ê Cotmeha 1949'an de, Mao Zedûng Komara Çîn a Gel îlan kir, welat bêhal ketibû. Şêst salan şûn de, piştî gelek hilpekînan û li hember kujertiya dewletê, pêşiya dika aborî ya cîhanê zeft kiriye. Xizanî heye, lê belê birçîbûn wenda bû, newekhevî pir e, lê % 90'ê çîniyan dizanin bixwînin û binivîsînin... Di sala 1966'an de Şoreşa Çandî dest pê kir, lê belê ji aliyê rêveberan ve wekî "bobelata netewî" hate binavkirin.

SOLANGE BRAND *

www.arsivakurdi.org



ZHANG XIAOGANG, (Bloodline Big Family No. 9, 1996)

Pêkîn, 1'ê Cotmehê 1966. Salvegera hivdana damezirandina Komara Gel ya Çînê ye. Milyon û nîv, du milyon leşkerên artêşa sor li pêşiya trîbuna berî li qada Tîananmanê, li pêşiya dergeha Bajarê Qedexe, bi merasimekê, piştgiriya xwe ji bo şoreşê û ''rêberê'' xwe nîşan didin. Li derdora wî, ew çar kesên ku wê paşê wek ''çarçete'' (1) bihatina binavkirin kombûne. Mao Zedûngekî kalbûyî, ji ber sedema têkçûna ''Hilpekîna Mezin'' bervepêş, tê gengeşîkirin (2). Ew bi alîkariya dezgehên pesindanê yên artêşa di bin destê Lin Biao de ji bo serketina desthilatdariyê rabûye ser pê. Û, bi mebesta dorpêçkirina partî û saziyan, bangê li qirnê ciwan dike li ser navê şoreş, têkoşîna li dijî burokrasiyê, axatî û bûrjûwabûnê, ji bo sewsîbûna ''berê'' ji holê rake. Û heman demê divê, ji bo bandora Qedenê Mezin, hemî talûkên şoreşa ''sowyetî'' bide aliyekî, û ''Riya Şoreşa Çînî'' veke.

''Êrîş li ser bargeha bingehîn!'' Kîjan ciwan dikarin li ber vê bangê rabin? Dahkek li seranserî welêt, lê belê manîpulasyonek ku bi konetî rexnan li hinek rêveberan digire jî (3). Ji bihara 1966'an de, amadeyî û zaningehî, destpêka bilindkirina xwepêşandanên mezin, bi slogan, gong û zengil, bi eşq hatibûn tevrakirin. Sor xwe berdabû ser bajarê gewrik û xopan ku ew Pêkîn bixwe bû. Meha Tebaxê, xwepêşandanên bêserûber li pey hev li Meydana Cheng An û li ya Tiananmanê ku Mao bi heşt êrîşan ''zeft''kiribû, pêk hatibûn; bi milyonan ciwan ji çar aliyên welêt, bi mebesta ku hurmeta xwe nîşanî wî bidin, hatibûn. Li her derê amade, jiberkirî, bi komî xwendî, Pirtûka Biçûk a Sor ku ji ''ramanên serok Mao'' pêk dihat, fikr û tevgêra civakê bi rê ve dibir.

Lê tu celebên vê "1'ê Cotmehê" yê dinê tune ye. Ne merasima leşkerî, ne debabe, ne jî pêşandaneke rengerengî: bi saetan, bê bêhnvedan tenê defîleyeke yekîneyên sor, bi pazûbend, qutikên şîn an keskik, îşlikên spî; jinên bişal ku gulîkên xwe teze qusandine. Hemû, Pirtûka Sor, pêla sor ku li ser ala sor û bandrola ji heman rengî li ser li ba dikeve, li gorî dengê sloganan radikin hewayê. Ji bo kesên beşdarbûyî, halê wan, mîna ku di cencerê de her bizîvirin.

Û paşê hema li pey, li ser navê girîngtirbûna civakî, bêhawetî, sîxurtî, rexne, zordestî û kaos diqewimin. Ji sala 1967'an a kuştinê bi vir de, ji bo ku liv û tevgerê bi dawî bike, bang li artêşê hate kirin. Bi milyonan zaningehîyên bajêr ewê ji bo gundan bihatina birêkirin ji bo rafihandina ''gotinên xweş'' û ji nûve bên ''perwerdekirin'', bi awayekî ku dawî li xwîngerbûna wan ciwanan bînin û wan wekî ''qirnên ciwanên xwende'' (4) bi nav bikin. Xerîbî, malbatên jihevketî, jiyanên şikestî... ''deh salên wêranbûnê'', ewê bi vî hawî bihatina binavkirin salên paşîn.

Sala 1949'an, diviya welatekî lipaşmayî bihata hişyarkirin, bersîva talûka pêdiviyên bingehîn bihata dayîn, ji rewşa birçîbûna ku pişta gelek hemwelatiyan dişikand (5) bihata derketin. Mînak, ''bijîşkên pêxwas'' tevdîrên hêsan ên hijyenê stendin û muayena heta nava gundan, birin.

* *Nivîskarê pirtûka ''Pekîn 1966-Dîroka Şoreşa Çandî''*

Di warê tendurustî, xwendinnivîsandin, perwerde, wekheviya mafên jinan de, gelek tişt hatin temamkirin. Bi berdêla zora polîtîk û civakî ya dijwar, halê hazir, dizî, qumar, toltî, bertîl qediyan. Ev çendsalên Çîna ''şoreşger'' -di navbera împaratoriya milyarkesî û felateke bê frên asêmayî, ji dawiya sedsala XX'an de- ji statuya hêza mezinyek ji qetandinên herî mezin ku mirovatiyê dîtiye, bi taybetî di vî warî de, ev e.

Tenê di çel salî de, şeş sed milyon mirov celî nava neteweyan bûn (6). Perçebûyî, biçûkxistî, xwînwendakirî ji dahnê pêşîn ê sedsala XX'an ku bi şerê navxweyî, bi destê hêzên rojavayî, bi yê Japoyayê, Çîn, -hivde salan piştî serxwebûna xwexwe her tim tenêhiştî dît di nava şerê dinyayeke dubendî. Bi piranî wisa tê şîrovekririn ji aliyê neteweperweriya îroj û ji yê serbilindiya bidesketî ve. Wisa bêhawe. Û Mao jî jê îstifade kir. Piştî mirina wî, partiya komunîst kiryarên wî ''% 70 rast, % 30 şaş) nirxand: gotina kurt, derfet dida xelefên wî ji desthilatdariyê û ji bo qedexekirina gengeşiyên derbarê rewşa wan a taybet.

Şoreşa çandî, bû sedema bobelatên mezin ên netewî. Bi fermî, berpirsiyarî xistin ser milên ''çarçete'', ê ku xwest berpirsiyariya Qedenê Mezin bincil bike. Deng Xiao-Ping ev pêvajo kir mînakeke xerab ku bi mebesta polîtîkaya xwe ya derdikeve ser bazara serbest, spartibûyê; heta dema wî bixwe, bi fikrên qirnên vê dawiyê zor lê hatiye, ê wî, tenê qîma xwe bi bersîva gotina ''xwe dewlemend bikin'' aniye (7).

---

[1] Jiang Qing, jina Mao Zedûng, Zhang Chunqiao, Wang Hongwen û Yao Wenyuan, sembolên Şoreşa Çandî û ji rêderxistina wê, mehekê piştî mirina Mao, 6ê Cotmeha 1976'an hatin girtin.

[2] Destpêk 1958, Hilpekîna Mezin bervepêş xwedîtiya şexsî rakir û bi darê zorê dest bi industrîkirina welêt kir. Têkçûna wê bi hewaya nexwş kifş bû, li gorî texmînan dora panzde û sî milyon mirî hişt li pey xwe.

[3] Bêgûman Deng Xiaoping û Liu Shaoqi alîkariya qulipandina rûpelên Hilpekîna Mezin bervepêş kiribûn.

[4] Michel Bonin. Le mouvement d`envoi des jeunes instruits à la campagne en Chine, 1968-80, Ecole des hautes études en science sociale, Paris 2005

[5] Rejîmê yê sala 1979'an polîtîkaya zarokê tenê bi cih bikira. Bi meriyeta wê, pirbûna şêniyan hat sînorkirin lê tesîrên wê yên xerab mîna kalbûna civakê, daxwaza ji bo zarokê kur, derket.

[6] Her çi qasî Fransayê hebûna Çînê sala 1964'an qebûl kiribe jî, Rêxistina Neteweyên Yekgirtî heta 1971'an ew ew qebûl nedikir.

[7] Derbarê raperîna 1989'an de br. Wang Hui, ''Aux origines du néoliberalisme'', dans manière de voir, no 85, ''Jusqu`où ira la Chine?'', Février-mars 2006



*HE DUOLING (En Ai Xuan x)*

## Mêjû

**1949.** Damezirandina Komara Gelêrî ya Çînê (KGÇ) 1'ê Cotmehê, ji aliyê Mao Zedûng ve. Tchang Kai xwe avête dexlê Taiwanê.
**1957.** Adarê, destpêka gengeşiyên bi navê "sed kulîlk" ku pûşperê êrîşeke antî-rastgir li dijî Rojnameya Gelêrî pêk hat, bi dawî bû.
**1958.** Destpêka Hilpekîna Mezin a bervepêş: avakirina komikên gelêrî, rakirina mulkiyeta şexsî...
**1959.** Lui Shaoqi bû serekdewletê KGÇ'ê. Li Tîbetê zordariya mezin, Dalaî Lama reviya Hindistanê.
**1964.** Qebûlkirina ji aliyê Fransayê.
**1966.** Destpêka "Şoreşa Mezin a Çandî û Proletêrî.''
**1967-68**. Şandina bi milyonan ciwanan bo gund û çolê.
**1971**. Yek ji kesên bingehîn ji bo Şoreşa Çandî, mirina Lin Biao, 13'ê Îlonê. 25'ê Rêbendanê, ji dêlva Taîwanê, qebûlkirina Çînê ji aliyê Netewên Yekgirtî.
**1973.** Rêhabîlîtasyona reveberên dema Şoreşa Çandî ji şoreşê qetiyayî.
**1976.** Mirina Zhou Enlaî, 8'ê Rêbendanê, li Pêkînê xwepêşandan. Mirina Mao, 9'ê Îlonê.
**1977.** Ji nû ve desthilatdariya Deng. Bidawîbûna fermî ya Şoreşa Çandinî.
**1989.** Bihara Pêkînê.
**2002.** Hu Jintao bû serokdewletê KGÇ'ê.
**2007-08.** Çîn, di cîhanê de bû mezintirîn aboriya sisiyan. Li Tîbetê Raperîn û zordestî.
**2009. L**i Xinjiangê teşqeleyên nav kêmneteweyan.

# Li hember dîrokeke veşartî

Qirnê "fedaî'' yê Şoreşa Çandî îroj, bi awayekî giştî li ser rêveberiya welêt e. Ew in, yên ku ber ve hêla mîratxwurên meşa mezin guhertinê pêk bînin û fesalê bidin Çînê... ya jî ewê hesabê "deh salên reş'' bidin.

Li Çîna "komunîst'' a îroj, şoreşa çandî pir hindik tê bîra mirov. Dîsa jî çîrok bi fermî qediyaye li welatê ku berê xwe daye dahatûyê, xwe daye ser bextewariyê, zewqa pêşketin û xerşkirinê. Û wekî her demê, gava bûyerên trajîk gelekî him dike aktor, him jî qurban. Çêbûna kesayetê pêk nayê – ya jî xerab tê. Dijwar e ku mirov êşa weritandina îdealên têkçûyî, xapandin, xumam û hemî tiştên ku di bîr de, di vê dema veguherînê de, ragire. Eger mirov agirekî di navbera serxweşbûna azadiyê ku her tişt lê mimkûn xuya dike (cihguhertin, trênên belaş, derfeta axaftinê, ji dê û bavan û ji mezinan serbest) û wêranbûna malbatan, zordestî û kuştinê, hesab bike. Bîranînên dostaniyê, hevgirtina ku hemû qirnên ciwan nîşan didin û carinan jî xwe sûcdarkirin li hember perwerdekaran, cîranan û carcaran li hember malbata xwe bi xwe.

Îroj bi pêşkêşkirina van sûretan ji bo çîniyan, mirov wan bi demeke dîroka wan a veşirtî re tîne cem hev û dîbîne ku bi xweber dibin şehadên wê. Ji bo kesên ku di nava van bûyeran de jiyane, matmayîbûn û heyecan tên famkirin; pêşî bêdengî yan jî çend gotin li ser "dînîtîya'' vê serdemê, malavayî kirin ji bo dîtinê - bi taybetî ji yekî biyanî hatibe.- Carina hişyarbûna hesta xwe "li wir'' dîtinê û belkî hewl bide ku xwe tê de nas bike? (yan jî serbilindiya ji bo beşdariya bizavê wek leşkerekî artêşa sor (û dema çîroka xwe ya bi êş û azar a şexsî ji!). Gelek jê, dibêjin, bi fikara ku ewê dê û bavên xwe biêşînin, newêrin pirsan jê bikin. Hin jê, ji kal û pîran dipirsin tiştên ku bincilbûne û dîroka fermî û pirtûkên dibistanê di ser re derbas dibin.

Çi hesteke taybet e dîtina helwesta qirnên ciwan, carcaran çi ji min re, yan jî tenê bal li rûyên sûretan, lê bi piranî bi ne bawerî ji ber ku ne agahdarkirî, mana wan a şaş û matmayî li hember vê dîroka xwe ya ku jê ne haydar. Pir caran tê eşkerekirin, awayekî berbiçav, pêdivî bi lêkolîna wê, xwedî derketina li wê heye.

**Werger ji fransî**
**Cemil Denli**

www.arsivakurdi.org

ÎMTÎHANA SOSYAL-DEMOKRASİYÊ

# Ewrên tarî li ser bihûşta Danîmarka

**Danîmarkî biguman in. Danîmarka bi sîstema xwe ya ku wekî “serbest û ewle” dihate terîfkirin navdar bû. Lê belê îro ew rewş û serbestiya wê her ku diçe firehtir û ewleyiya wê kêmtir dibe. Digel qeyrana aborî, hevbîriya piştî-şerî ya li ser yeksaniyê berev derizînê diçe. Rastgirên tundrew, ku gelek bihêz in, hewl didin ku derbarê meseleya penaberan de, bi taybetî di warê civakî de, şert û bendên sext bi cih bikin. Çînên navîn jî doza daxistina bacan dikin û nerihetiya xwe derdibirin sebaret bi “peredana” ji bo xizanan. Serqise, modêla bakurî, ku heta duh gelek dihate hebandin, îro ber gefên mezin e.**

JEAN-PIERRE SERENI *

Gava ji welatên din ên Ewrûpayê re lê tê nihêrîn, sexaweta dewleta-dabînker [berevajî dewleta jendirme, ew awayê dewletê ye ku girîngiyê dide xizmetên jiyana civakî û takekesî] a mirovî diheyirîne: her zaroka ku ji dayik dibe piştî ku dibe şeş mehî, xwedanê mafê bicihbûna li kreşekê ye; xizmetên tenduristiyê bêpere ne; sexbêriya li malan ji bo pîremêr û pîrejinan gelek belave ye; ciwan pênc salan ser hev alîkariya darayî werdigirin ji bo tewawkirina xwendina xwe, di ser vê hindê re jî, rewşa malbata wan çawa be bila be, her ciwanê ku hez bike dikare salekê navberê bide xwendina xwe ji bo dîtina cihine din li sertaserê cîhanê an jî salekê amadekariyê bike ji bo serkeftina di ezmûna têketina zanîngehan de…

Lê belê, ji cerga qeyrana aborî ve, mûçegirên danîmarkî biguman in. Formûla “serbest û ewle”, dermanê mûcîzewî li dijî bêkariyê, ku li ba wan û li Ewrûpaya mayî gelek dihate hebandin, dê bikare wan li dijî vê dijwartirîn kesadiya aborî biparêze ku piştî qeyrana mezin a salên 1930’an tê serê qraliyeta wan?

Li ser kaxezê, kurteya vê nûterma nemunasib [rêbaza aboriyê ya serbest û ewle] formûleke seyr e ku ji bo herdu layenan jî ya herî baş dixwaze, wate, serbestî ji karderan re û ewleyî ji karker û mûçegiran re. Patronê danîmarkî, herwekî hevpîşeyên xwe yên emerîkî û brîtanî, dikare, çi di çarçova qerebûyê de çi di çarçova plansaziya civakî de, tavilê karkerên xwe ji kar derxe. Beramberî vê yekê, mafê karkeran teqezkirî ye ku bi kêmî çar salan qerebûyeke bikêr a bêkariyê wergirin. Herwiha, heke pêwîst be dikarin perwerdeya pîşeyî ya taybet wergirin, an jî, wekî ku di ajansa damezrandina karkeran a Sydhavnenê de li Kopenhagene’ê dibe, qerebûya xwe bi şêweyê îstîfadekirina ji klûba wê ya sportê wergirin.

Heta par, sîstema navborî gelek baş û hema bêje bêkêşe bi rê ve diçû û bêkarî pir kêm û kêşeyeke demkurt bû. Mogens Lykketoft, danerê vê sîstemê gava ku wezîrê darayî bû di hikûmeteke navend-çepî de –niha endamê parlamenê ye ji bereya sosyal-demokratan li Folketingê (Parlamena Danîmarka)-, pir qetî diaxive: *“Ev serkeftin e, şîrket nema dudiliyê dikin di kardanê de ji ber ku dizanin ku dikarin bi rihetî, bê muhlet û bêyî dana heqeke zêdeyî beramberî keda karkeran, wan ji kar derxin û barê xwe sivik bikin.”*

Ya rastî, heyama detpêka sepandina vê sîstemê, sala 1994’an, li Danîmarkayê sê sed hezar bêkar hebûn (10 % ji nufûsa ku dikare kar bike); piştî heft salan hejmara bêkaran ji sed hezarî kêmtir e; di hezîrana 2008’an de, berî ku qeyrana global li peravên Baltîkê bide, hejmara bêkaran dikeve bin çil û heft hezaran. Şîrketan, ne tenê yên danîmarkî, bi piraniyeke mezin rêbaza “serbest û ewle” qebûl kir û bi xêra vê yekê Danîmarkayê rêzên yekem di lîsta rûmetî ya patronên navneteweyî de xistine bin pavanê xwe.

IMD, zanîngeheke mezin a di warê bazirganiyê de li Lausanne’ê, îsal ji bo salnameya xwe ya bi navê *World Competitiveness Yearbook 2009* pirs ji çar hezar biryargirên ji pênceh û neh welatan kirin: Danîmarka bi dereceyeke 100 xalan (28,4 ji bo Fransayê…) di serî de tê û rengê bihûşta patronan dide ji ber lîberaliya hikûmeta xwe, hewayê aram ê di warê bazirganiyê de û huzûra civakî li vî welatî. Govara Amerîkî *Forbes* (1), li gorî encamên raya hejmareke serokşîrketan, welatê navborî wekî *“the best country for bussiness”* (*“baştirîn welat ji bo bazirganiyê”*) destnîşan dike li pêş Amerîkayê.

Digel vê hindê jî karker nerihet û aciz nînin. Bi ya sondajeke sala 2006’an a Eurfondê, saziyeke li Brûkselê ku rewşa civakî ya li welatên Yekîtiya Ewrûpayê vedikole, mûçegirên danîmarkî, ji nav bîst û heft welatên endam, yên herî “memnûn” in ji rewş û jiyara xwe.

Em fêm dikin bê çima wiha memnûn in. Hema bêje herkesî karekî tam-demî heye, mûçe bi lez zêde dibin (berî qeyranê, bi rêjeya 4 %) û em dilniya ne ku em dê cihê xwe li ba şîrketeke din peyda bikin heke em bi patronê xwe re li hev nekin an jî bixwazin ji bo kêfa dilê xwe berê xwe bidin karekî din… *“rêbaza serbest û ewle di çaxê mezinbûna aboriyê de hate pêşxistin, ev yek ji binasên serkeftina wê ye”* dibêje Holger K. Nielsen, serokê Socialistisk Folkepartiyê, ku partiyeke ji sosyal-demokrasiyê çepgirtir e û di hilbijartinên Ewrûpayê yên dawî de dengên xwe zêdetir kirin.

Qeyraba aborî tê… Rêbaza serbest û ewle bi hilpekîn rê ve diçe; serbestî zêde ewleyî kêm dibe. Biçûktir ji herêma Midi-Pyrénées [herêmek li Fransayê] û bi nufûsa xwe ya pênc milyon şeşsed hezar kesî kêmnufûstir ji herêma Rhône-Alpes [herêmek li Fransayê], Danîmarka pir bestî ye bi bazirganiya navneteweyî ve. Lewma, bi husn-î te’bîra rewacdar a şîrketa keştîsaz A. P. Moller-Maersk, grûba herî mezin a welatî û derece yeka cîhanî di warê barguhêziya bikonteyner de, welatê wan gelek nazik e beramber *“kesadiya global a derasayî”*.

Di 2007’an de, welatî nîvê hasilaya xeyrî-safî ya navxweyî îxrac dikir. Klaus Rasmussen, berpirsê Danish Industry’yê, rêxistina bingehîn a patronan, rave dike ku *“Îxracat ew beş e ku notayan dide yên din di guftûgoyên civakî de”*. Mûzîka wê ne tu xweşawaz e ji bo mûçegirên beşetaybetê, ku herî zêde karker di wê beşê de hene. Ev salek e ku firotina di îxracatê de bi rêjeya nêzîkî 20 % daketiye, hejmara îflasan meh li dû mehê digihe rekorên nû. Heta niha îflasa herî mezin, şîrketa hewayî ya erzan Sterling Airways (bîst û neh balafir) bi erdê ve mîx kir. Lewma, ne tenê şîrketên ragihandina hewayî lê gelek şîrketên din jî, alavan kêmtir dabîn dikin, dikevine dû mesrefên ku bi fuzûlî têne zanîn (li ser nîv-milyon keştiyên aîdî Maerskê, ji 1’ê Çileyê ve deryavanan nema mafê bikaranîna destmalkaxeziyan heye) û hejmara karkeran pir kêm dikin. Ji havîna par ve rêjeya bêkaryê du caran ji ya Fransayê bi leztir zêde dibe. Hejmara bêkaran di salekê de du qat zêdetir lêhat û di tîrmeha 2009’an de gihişte sed û heft hezaran, ku herî zêde karker li ber ketin.

Di beşa avahî û karên giştî de, ku beşeke felaketzede ye, 13 % ji karkeran (du qat ji par vî çaxî zêdetir), 27 % ji hostayan, 13 % ji boyaxkaran bêkar in bi ya Federasyona yekgirtî ya karkerên danîmarkî –Fagligt Foelles Forbund, bi navê xwe yê kurt “3 F”, ku ji Çileya 2008’an ve 4 % ji endamên wê jê kêm bûne. Agahdariyeke asayî ji bo postê resepsiyoniyê li bajarekî biçûk, zêdetir ji neh sed muracaat berhev kirin. Bi ya Ajansa kar a netewî, di nav heşt mehan de hejmara bêkarên ji 24 salî ciwantir çar qat bilind bûye. Lê belê, mafê wan ê qerebûyê heye ji ber ku wan jî pişkdarî kiriye di yek ji çil maseyên bêkariyê de, ku ew mase gişt girêdayî sendîkayan in.

Li Danîmarkayê, herwekî li Swêdê, kevnemodêla Ghent (3) ya dilxwaziyê hêj jî tê sepandin: abonetiya bo sîgorteyeke bêkariyê ixtiyarî [ne mecbûrî] ye. Netîce, ji ber ku di hengava xêr û bêra salên 2000’an de hema bêje herkes xwedankar bû, gelek ji ciwanan sîgortekirin bi fer û girîng nezanîn. Dawiya yekem çaryeka 2009’an, şanzdeh hezar ji wan bêkar û bêsîgorte bûn, yanî sê qat zêdetir ji

*(*Rojnamevan)*

www.arsivakurdi.org

ciwanên bêkar ên qerebûgir. Mecbûr in qîma xwe bi alîkariyeke giştî ya pir kêm bînin ku ew alîkarî nêzîkî heqdestê asgarî yê li Fransayê ye.

Guftûgoyên li ser mûçeyan ku adara borî dest pê kirin ti nîşanên xêrê nadin. Bi ya serkaniyên patronan, sala 2009'an di beşetaybetê de mûçeyê yek ji du mûçegiran nayê zêdekirin, yek ji sêyan dê qîma xwe bi heqdestê saetekê yê niha bîne. Konseya aborî, saziyeke fermî lê serbixwe, destnîşan dike ku ew rewş dê bibe sebebê ketineke bi rêjeya 2 % di hêza kirînê de. Ji bo gelek malxwêyên ciwan ku qerz wergirtine da ku xaniyekê bikirin –nêzîkî du ji sê pişkên danîmarkiyan xwedanên mala xwe ne-, ev yek felaketek e: gulana borî, hejmara hecizan bi ser rekora berê ya panzdeh salî ket.

Bi ya Danske Bankê, girîngtirîn banka welatî û duyema Skandînaviyê, bihayên xeyrîmenqûlan, ku ji 2007'an ve dadikevin, reng e di 2009'an de hêj jî dakevin *"bi rêjeya 10 % di xaniyan de û du qatê wê jî di daîreyan de (4)."* Li Ewrûpayê, piştî Brîtanya û Irlandayê, daketina herî mezin di bihayên xeyrîmenqûlan de li Danîmarkayê tê dîtin. Wezîrê budceyê yê ciwan, Kristian Jensen, sêyem kesê girîng di hikûmetê de, qet nehate meslehetê. Kabîne dê ti tiştî neke ji bo xwedanxaniyên nerihet: berpirsên fermî dixwazin bidin famkirin ku *"ew mecbûr in bi xwe çareyekê ji xwe re bibînin"*.

Li ber çavên vê civaka ku demeke dirêj e fêrî sexbêriya "ji landikê heta darbestê" bûye, ev yek nîşaneke dîtir e ku êdî dewleta dabînker û bixêrûbêr a danîmarkî nema ya berê ye. Ji bo hikûmeta navend-rastgir a desthilatdar ji 2001'an ve, gefa giran berî her tiştî darayî ye. Li gorî hesabên desthilatê, ku berî qeyranê hatibûne encamdan, sala 2015'an dor 15 milyar Kron (2 milyar Euro) dê kêm bibana ji bo qetandina mesrefan. Pîlana wî, bi navê Aborî 2015, ku li ser bingeha "ne-ne" yekê (ne zêdekirina bacan ne kêmkirina alîkariyan) hatiye dariştin, li dijî qeyranê li ber xwe neda. Reforma wî ya malî, amadekirî ji bo 1 Çile 2010'an, bacên rasterast dadixe, lê belê zêdebûnê paş ve dide bo demeke nediyar û pîlan ew e ku vê hevkêşeyê ji "bacên kesk" ên li ser elektrîkê, sîstema germkirinê, kamyonan, gazên bi tesîra serayê ji bilî CO2, avên bikarhênayî, trimbêl û hwd. fînanse bikin. Ewqas barê bacên zêdeyî ku dê bikeve ser milên malxwêyan, ku ji xwe li baca bihayê komkirî (BBK) ya bi rêjeyeke 25 % deyax dikin, dê salê çekeke nefsbiçûk a 100 euroyî bi serê mezinan û yeke 40 Euroyî bi serê zarokan ji kîsê malxwêyan kêm bike…

Aşkera ye ku ev reforma malî ya seyr, dewleta dabînker naziktir dixe, lê belê bi qazancekê: Dilxweşkirina hilbijêrên rastgir û birêvebirina konjonktûreke pir xerab bi rêya pifdana 15 milyar kuronan (zêdetir ji 2 milyar Euroyan) bo nav aboriya welatî di 2010'an de û 8 milyaran (1,1 milyar Euro) di 2011'an de. Paşî, hêj dê wext hebe ji bo dîtina hilbijartinên parlamenê, ku qewl e herî dereng mijdara 2009'an bêne birêvebirin…

Hikûmeta Loekke Rasmussen, ku pêk tê ji wezîrên lîberal û muhafezekar, mînorîte ye di parlamenê de. Bîst û pênc deng jê re divên… ku wan jî Dansk Folkeparti (DF), Partiya gelê danîmarkî, jê re tîne. Partiya navborî fraksiyoneke rastgir ya tundrew e ku bêşermane gotareke biyanîtirs [kzenofob] belav dike, dijminiya Yekîtiya Ewrûpayê û berevaniya xanenişînan dike. Morten Messerschmidtê 28 salî û serokê lîsta partiyê di hilbijartinên Ewrûpayê yên 7'ê Hezîranê de, ku portreyên wî li hemû kolan û çirayên kolanên Kopenhagenê hilawistî bûn di heyama kampanyaya hilbijartinên Ewrûpayê de, koçberiyê bi aşkerayî wekî mezintirîn gefa li ber modêla civakî ya danîmarkî destnîşan dike: "Divê em wê [modêla civakî] biparêzin lewre em dewleteke biçûk in û nasnameya me xweser e", dibêje di şeveke çalakiya hilbijartinê de ku ji aliyê *Berlingske Tidende* ve, rojnameyeke muhafezekar, ku berî bi du sed û şêst salan hatiye avakirin, dihate birêvebirin û wê şevê piştgiriyeke mezin û teqez lê berhev dibû. Ev, ew berendam e ku 7'ê Hezîranê li ser navê xwe herî zêde deng berhev kirin. DF pêdivî bi wezîran nîne ji bo ku xwe bigihîne desthilatê. Danîmarkayê rejîmeke parlamenter ragirtiye, lewma hêza yasaçêker sertir e ji hêza birêveber. Her tişt di Folketing û bîst û pênc lijneyên wê yên parlamenter de çêdibe û dîsa li wir ew biryarên ku wezîr mecbûr in bisepînin têne cemidandin. *"Li Brûkselê, di civînên wezîran de, wezîrê danîmarkî divê li gorî dîrektîfan tevbigere û vegere ber Folketingê ji bo guhorîna wan"* diyar dike Gunnar Rieberholdt, kevne balyozê Danîmarkayê li Parîsê û yek ji mîmarên têketina sê welatên baltî [welatên li dora behra Baltîkê] nav Yekîtiya Ewrûpayê di 2004'an de.

## Rasta tundrew xwe li êrîşê daniye

Ji bo DF'yê, ku bi koma xwe ya di Parlemenê de piştrast e, gelek hêsan e êrîş û provakasyonên xwe yên li dijî koçberan, ku hejmara wan di serjimêriya 1 Çile 2009'an de li dor çar sed hezaran hatibû texmînkirin, û li dijî wan danîmarkiyan zêde bike ku bi binyada xwe ji welatên musulman in, ji Tirkiye heta Pakistanê û heta digihe Soma-

"Xebata me ji bo welatê me" Dergeha demokrasiya Danîmarkayê (LMD kurdî)




www.arsivakurdi.org

liyê, ku berev dawiya salên 1960'an wekî penaberên siyasî hatine wî welatî. Rojekê, bi lez û bez di kantînên xwendegehan de goştê mirîşkê bi yê berazî, ku bêtir "danîmarkî" tê nasîn, didin guhortin. Li nav DF'yê obsesyonekê [hingof] cihê xwe qahîm kiriye: bi her rê û rêbazekê bisînorkirina mafê koçberan ji parastina sosyal. Ji 2002'an ve, heke jina koçberekî di nav du salan de bi kêmî sê sed saetan kar nekiribe mafên xwe yên civakî ji dest dide. Hecet amade ye: azadbûna jina musulman ji çavdêrî û muhafizeya mêrê xwe. Bêguman ji bo bêtir azadkirina wê, hikûmet niha dixwaze çar sed û pênceh saetan dasepîne! Encama herî aşkera zêdekirina xizaniyê ye di nav koçberên herî dawî hatî de, bi taybetî ji bo zarokên wan, ku yek ji dehê wan li jêr sînorê xizaniyê dijîn.

Îmkana wergirtina mafê hevwelatîniya danîmarkî hema bêje nîne. Divê koçberek neh heta deh salan li wir jiyabe heta bikare muracaatê bike û dosyaya xwe ya berendamiyê dane; û paşî jî divê bi zimanê danîmarkî, ku jixwe zehmet e, bikeve ezmûnên danîmarkî yên bi taybetî dijwar-xistî. Ji 2002'an ve, bi fişara DF'yê, ezmûn çar caran hatine dijwarkirin ji aliyê Parlamenê ve. Testeke rastgele, ku Berlingske Tidende'yê çêkiribû, nîşan da ku yek ji du derçûyiyên zanîngehê yên "bi binyad" danîmarkî di ezmûnê de ketin [sernekeftin]. Heman dijwarkirin di yasa û qaîdeyên gihiştina malbatî de: mêr an jin divê bi kêmî 24 salî be û "pêwendiya wî/wê ya digel Danîmarkayê ji pêwendiya wî/wê ya digel welatê hevserê/a xwe xurtir be." Tedbîr li ser tedbîrê, hikûmet herroj, bi heceta bihêzbûnê, hinek ji wê statûya biyaniyên Romaya kevn [biyanî di antîkîteyê de kesek e ku li bajarekî dijî, îstifadeyê ji mafên hevwelatîniyê nake lê belê di bin parastina yasayan de ye] durist dike.

Ravi Chandran, sala 1992'an ji Sengapûrê hatiye, berpirsê rêxistineke ne-hukmî ye ku bispor e di warê alîkariya li mexdûrên AIDS'ê yên ji mînorîteyên etnîk de, behsa hêvîşkestên wan *"Danîmarkiyên nû"* dike ku ne çavşîn in ne porzer in: *"Ew li vir ji dayik bûne û li vir perwerde bûne; Danîmarka tenya welatê wan e, welatekî wan ê din nîne; gazindên dayik û bavên xwe dibihîzin ji ber sportên ku dikin, dibînin ka çawa nûçeyên telewîz0yonê li ber mirina xeşîm a danîmarkiyekî binkî dikeve lê mirina yên din piştguh dike; ew bi xwe wisa hest pê dikin ku li dîwarekî camî diqelibin… Lewma, car û baran diteqe, mîna di reşeme 2008'an de li Norrebroyê* (5) *!"* Lally Hoffmann, rojnamevanê hosta û bisporê siyaseta derve ji bo TV2'yê, kanala dewletî, xemgîniya xwe derdibire li ber vê hewaya bêtoleransiyê: *"Ez êdî Danîmarkaya zarokatiya xwe nema dinasim, îmaja wê di cîhanê de gelek xerab bûye."*

Qeyranekê li çavên cîhan û Ewrûpayê, ku bêtir bala xwe dide derveyî sînorên xwe, eyan kir bê giraniya rasta tundrew a danîmarkî di nav hikûmeta welatî de çend zêde ye: karîkatûrên pêxember Muhammed ku dawiya îlona 2005'an di rojnameyeke danîmarkî *Jyllands Posten* de hatine belavkirin. *"Kêşe ne belavbûna wan* [karîkatûr] *e, lê bêtir ew e ku serokwezîrê hingî Anders Fogh Rasmussen, îro sekreterê giştî yê NATO'yê, qederê çar mehan qebûl nekir digel balyozên danzdeh welatên musulman ên ku li ba me akredîte ne bicive"*, dibêje Toiger Seidenfaden, sernûserê *Politiken*ê, rojnameya mezin a danîmarkî ku sebaret bi qebûlkirina biyaniyan an jî muameleya digel mînorîteyan, kêmzêde bi tenê lê bi awayekî dilêrane, xeta azadîbawer a kevn diparêze. *"Jixwe bi tenê ji ber vê hindê qeyran bû navneteweyî û ji kontrolê derket."*

Qebûlnekirina Rasmussen bi qestî bû, bergîriya azadiya derbirînê bi tenê heceteke kêrnehatî bû ji bo veşartina razeke qirdikane ya derdorên siyasî yên Kopenhagen'ê: Stî Pia Kjaersgaard, ku berê paqijîker û alîkara malan bû û 1984'an bo Folketingê hate hilbijartin û niha rêvebera qadirê-mutleq ê DF'yê, her çi hevdîtin û civînek veto kiribû.

Çepa Danîmarkayê li ber meyla fikrî ya berev bîra rastgir nerihet e. Sosyal-demokrat, sosyalîstên çepgir û sosyal-lîberal rêkeftineke sêqolî girêdan ji bo hikûmetê, lê belê, çavtirsiyayî ji ber sê têkçûnan di hilbijaritnên di wan heşt salên dawî de, ew jî nikarin bi aşkerayî dijayetiyê li siyaseta biyanîtirs a piraniyê bikin. Lykketoftê ku piştî têkçûna dawî ya mijdara 2007'an serokatiya Partiya Sosyal-Demokrat ji dest da, xwe wiha diparêze: *"Hikûmet du caran bi ser hev hate hilbijartin û herdu caran jî em tawanbar dikirin ku em beramber biyaniyan gelek xweşbîn û nazik in."* Herwiha navborî bi bîr tîne ku,*"divê gelê Danîmarkayê ji bîr neke ku di warê civakî de heta niha çep hergav ji rastê çêtir bûye."*

Lê belê, ma hêj jî, wekî di salên 1960'an de, hevbîrî heye ji bo firehkirina modêla civakî ya danîmarkî, piştî dewlemendkirineke bêhed bilez? "Di nav du neslan de, sêlxaneke bêserûber û bêxwedan, li qeraxa Ewrûpayê, bû welatekî xeyalî [cocagne: di teheyula ewrûpî de ew welatê xeyalî ye ku bes xweşî tê de heye û mirov digihe hemû arezûyên xwe]", dinivîse Knud J. V. Jespersenê dîroknasê fermî yê Keybanûya Danîmarkayê Margarethe II'ya pir bi navûbang di kitêba xwe de ku bûye berhemeke klasîk (6). Yeksaniya kevn cihê xwe daye hesteke nû: egoîzma (xudbînî) çîne-navînciyan ku nema dixwazin pereyê xwe bimezixin "ji bo yên din" û bi qîr û hawar doza kêmkirina bacan dikin.

Heta niha jixwe bi reforma darayî qismen gihiştine armancên xwe, lê belê bi wê hindê tetmîn nabin. Dawiya gulanê, nod û heşt şaredarên welatî, aktorên eslî yên Dewleta-dabînker, ku gelek xizmet li wan spartî ne (kreş, xwendingeh, sexbêriya pîremêr û pîrejinan, kar û damezrandin, kultûr…), xwe dirrandin ji ber reşnivîsa qanûna terazkirina (muadil kirin/hevseng kirin) darayî ku li gorî wê qanûnê şaredariyên dewlemend dê alîkarî bidana şaredariyên xizan. Çil ji wan şert danîn ku reşnivîs bi awayekî wisa ji ser û nû bê amadekirin da ku alîkariya hevgirtinê jê bê daxistin. Rûmetşkestî, bîst û heft şaredarên şaredariyên xizan ji wan xwastin ku teklîfa xwe vekişin. Rudesdal, danîmarkiyên Neuilly'yê, ku li wir dahata serê kesî du qat zêdetir e ji ya li Kopenhagen'ê, êdî naxwaze pereyê xwe bimezixe… Şaxên "xelekên ramana" muhafezekarên amerîkî Cepos û Kopenhagen Institute baş damezrî ne li paytextê û didin bawerkirin ku daxistina bacan dê bibe çareya hemû kêşeyan.

Şîrket herwiha bêzerer û zîrekane xwe ji yariya darayî vedikişin. Baca li ser qazanca şîrketan daxistin sedî 25'an (33, 5 % li Fransayê); hema bêje ti şert û dasepandin nînin li ser sermaye û xwedantiyê; maldarî [her tiştê bi debara malê re pêwendîdar] piraniya barê mesrefên xizmetên civakî hildigirin bi rêya bacên neyekser ên giran ku nîşana bihayê jiyanê ne. Ji ber ku ne bereya rast ne jî ya çep doza hewleke zêdeyî ji wan şîrketan nake, xitimîn û biçûkbûna aboriya Dewleta-dabînker xweşûnexweş xwe di asoyê re dide der. Hikûmeta heyî dixwast maweya qerebûya bêkariyê ji çar salan daxe du salan, ku qerebû di 2006'an de gihiştibû heta mehane 2000 Euroyan. Lê dev ji wê pîlanê berda. Lê belê ev bi tenê devjêberdaneke demî ye. K. Rasmussenê ji rêxistina patronan a Danish Industry'yê di wê bareyê de dibêje ku, *"em dikarin kêşeyê bo çend salan vekêşin, niha ne dema guhortina tiştan e."*

Ji dêvla kêmkirina qerebû û alîkariyên civakî, rêyên din hene ji bo mezaxtina kêmtir, wekî ku aliyê din ê rêbaza ewle û serbest pêwîst dike, anku bicihkirina ewleyiya kar. *"Di 1993'an de, qutbûneke îdeolojîk çêbû,* bi analîza profesor Jorgen Goul Andersen, ji zanîngeha Aalborg, li navenda welatî. *Ewleyiya sosyal nema wek pêşanî* [eweliyet] *ma û armanceke din cihê wê girt: kêmkirina bêkariya bastûrî."* Şertên havildarbûna ji qerebûya bêkariyê zehmet kirine û mecbûriyet çend-bare zêde kirine (divê kesê bêkar heftiyê bi kêmî çar karderan bibîne, perwerdeyê wergire ji bo pîşeyekê, biçe jivanên ajansên damezrandinê, guhortina cih û pîşeyê xwe qebûl bike…).

Digel qeyrana aborî, bi ihtimaleke mezin sîstema qerebûyê dê bêtir bê şidandin. *Aktivering* (destbikarbûn), ku şert e ji hemû wergirên alîkariyan re, gelek biderdeserî ye û bi ya Andersen, *"bi piranî, bêkarek berî tewawbûna muhleta wî ya destbikarbûnê karekî ji xwe re peyda dike".*

Herçend di destpêkê de sosyal-demokratên danerên vê bernameyê hêvî dikirin bi xêra vê bernameyê bê navber û bêyî maweyeke bêkariyê pîşe û şiyaneke din bidine bêkaran, aşkera ye ku ji wê bêtir wekî fenekê derhat ku bêkaran mecbûr dike bi lez karekî peyda bikin da ku nekevine ser rêya zehmet… Ya rastî, her tişt heye ji bo qanihkirina yekî ku piştî sê mehên nekarkirinê nekeve nav rêza destbikarbûnê: hilbijartina karê xwe yê nû, herwiha hilbijartina karderê xwe û cihê karkirinê jî gelek zehmettir e. Heke hat û kar qebûl nekir, hingî mafê wî yê wergirtina alîkariyê jî ji dest diçe. Gelo work-fare (baş xebitîn) dê cihê wel-fare (baş jiyan) bigire di modêla civakî ya Danîmarkaya sibe de?

**Werger ji fransî**
**Cemil Denli**

### Hilbijartinên Ewrûpayê

Encamên partiyên sereke di hilbijartinên Ewrûpayê yên Hezîrana 2009'an de (bi rêjeya %).

- Enhedslisten (çepa tundrew): 7,2 %.
- Socialistik Folkeparti, SF (sosyalîstên çepgir): 15,9%.
- Socialdemokratiet, SD (sosyal-demokrat): 21,5 %.
- Radikale Venstre, RV (sosyal-lîberal): 4,3 %.
- Venstre (lîberal): 20,2 %.
- Konservative Folkeparti, KF (kevneparêz): 12,7 %.
- Dansk Folkeparti, DF (ratsa tundrew): 15,3 %.

[1] *Forbes*, New York, 25 adar 2009.

[2] European Foundation for the Improvement of Living and Working Conditions, www.eurofond.europa.eu

[3] Modêla Ghent ku hêj di destpêka tevgera karkeran de li bajarê Ganda Belçîkayê derhat, xwe dispêre sê prensîban: pêwendiya sist ya karkeran, rêveberiya sendîkal ji bo qaseyên darayî û pirbûna wan qaseyan. Bi vî awayî li dijî wê prensîba unîversalîzmê ye ku dixwaze heman xizmetan pêşkêşî hemû hevwelatiyan bike, çi xebatkar çi bêkar, çi hevwelatî çi koçber. Li Danîmarkayê ev modêl bi tenê ji bo qerebûkirina bêkaran hêj li kar e.

[4] Danske Bank, "Nordic Outlook. Economic and financial trends", Kopenhagen, Hezîran 2009.

[5] Taxa Norrebro li bakurê Copenhague'ê, ji sala 2007'an ve û piştî girtina squatekê [dukan an xaniyekî ku ciwan bê destûr dikevinê û çalakiyên xwe tê de bi rê ve dibin] gelek caran pevçûn çêdibin di navbera ciwan û polîsan de. Di reşemeya 2008'an de, lêkdanên di navbera çeteya bi motorsîkletan û ciwanên musulman de bû sebebê mirina kesekî û tax ser û bin kir.

[6] *A History of Denmark*, Palgrave Macmillan, New York 2004, 244 rp.

www.arsivakurdi.org

DANÎMARKA

# Modêlek bi pênc îstisnayan?

JEAN-PIERRE SERENI

Gelo modêleke civakî heye ku pênc welatên skandînavî par dikin û cuda ye ji modêla Ewrûpaya mayî ? Ev pirs, derdorên akademîk ên herêmê pîj dike. Ji 1996'an ve, toreke dîroknas û lêkolînerên warê zanistên civakî, digel bêtir ji sê sed endaman li wir dixebitin (I). Helbet, rêveberên siyasî, sendîkavan, çalakvan û bisporan xwe li benda wan negirt. Lewre berî bi zêdetir ji sedsalekê, 1907'an, yekem konferansa civakî ya Skandînavyayê, bi şertên wê demê, li dor mijarên qezayên li ser kar û parastina karkeran hate birêvebirin.

Ji hingî ve, muqabeleya hizran, lihevguhorîna tecrûbeyan, berawurda daîmî ya rêbaz û encamên wan, hevkariya siyasî û hikûmetî, wêneyê malbateke ji pênc welatên Bakurê Mezin da pêş çavên cîhanê sebaret bi meseleyên wekî birêvebirina warê civakî, şêweyê lêkdana sebeb û layenên nexweşiyê, pîratiyê, xizaniyê, bêkariyê…



*Keçmasiya Kopenhagenê xemgîn e (LMD kurdî)*

Ya rastî, ji bilî cudatiyên demografîk (Swêd, bi neh milyon nufûsa xwe, hema bêje du caran ji Danîmarka, Fînlanda û Norwejê ; û sî caran ji Îzlandayê qerebalixtir e), siyasî (Swêd û Danîmarka împaratoriyên bihêz bûn; Norwej, Fînlanda û Îzlanda kolonî bûn û serê sedsala XX'an gihiştine serxwebûna xwe), van pênc welatan rê û berên gelek nêzîk dane ber xwe. Berî 1939'an Cpenhague'ê rê diyar dikir, Swêda ku ji ber şerî veder mabû, piştî 1945'an dewr girte destê xwe.

Ji ber nexweşiya av û hewayê wê û bêbereketiya erdê wê, herêm bo demeke dirêj mabû di bextê belengazî û mehrûmiyeteke kûr de û bes piştî duyem nîvê sedsala XX'an pê de pê de û bizor derket ji wê rewşa xerab ; lê heta gihiştiye wê qonaxê çaryekê nufûsa xwe ji dest dabû, lewre du milyon û nîv ji niştecihên wê gihiştibûne Cîhana Nû. 1875'an, Swêd, bi rêjeyeke 87 % gundewar û agrîkol [aboriya li ser çandiniyê] e, Danîmarka bi 75 %, Norwej bi 81 % û Fînlanda bi 94 %. Diyar e veguherînên wê çaxê siyasî ne – mutleqiyet li Danîmarkayê di 1848'an de tê hilweşandin, hilbijartinên giştî bi rê ve çûne di navbera 1898 û 1920'an de. Veguherîn herwiha civakî ye jî – reformên di warê ax û çandiniyê de dawiya feodalîzmê tînin- û ji aliyekê ve jî aborî ye, lewre çaxa diyarbûna endûstriya mezin a modern (polayê swêdî, bazara berhemên çandiniyê li cem danîmarkiyan…) û bajarvaniyê ye.

Dêr di binyada wê hindê de ye ku serê pêşî dibe pena û stara bi tenê yên herî xizan, bi piranî gundiyên bêerd. Jiyana herêmî, ku piştî Almanyaya Bakur di sedsala XVI'an de digihe nîzama Reforman, dikeve bin serdestiya tevgerên lutheryen [hevaheng digel rêbaza dînî ya Martin Lutherî] ên dewletê. Rêbaza lutherî li sertaserê erdê herêmê bihêz û hazir e, xêrxwazî qaîdeyeke pir hişk e, rayedar alîkarîkirinê wekî siza bi kar tînin beramber kesên wekî sermest û jinebiyên ku bêpar in ji mafên bingehî û ji azadiyê.

Pêşniyarên rêveberiya cemaeta dêrê, ku pê de pê de ilmî [sekûler] dibin, pêşî li Swêdê û Norwejê, paşî li Danîmarkayê dibin sebebê derhatina rêveberiyên lokal ên ku alîkarî li xizan û şagirtan dikin. Dabeşiyeke diyarkirî ya rolan bi cih dibe di navbera hêza navendî û ya lokal de : dewlet yasayan çêdike û rêveberiyên lokal disepînin bêyî derfetên zêdeyî ji aliyê dewletê ve, ku ev yek barê hevgirtinê dixe ser hisabê xêrxwazên serekî yên wê çaxê, anku xwedanên erdên fireh. Hêza navendî ji bo pêşketinên civakî (sebaret bi xanenişînan, tenduristiyê, sêwiyan…) mercan dide ber wan giregirên lokal ku wan mercan disepînin bêtir da ku bacên li ser wan bilind nebin. Salên 1920 û 1930'an, li jêr fişara sendîkayan, pêwendiya hêzên siyasî vediguhore bi awayekî ku xêra çînên kedkar tê de hebe û zerermend bûrjûwazî û xwedan-erdên mezin bin. Muhafezekar û lîberal cihê yekem ji dest didin û sosyal-demokratên ku koalîsyonên piraniyan pêk tînin têne pêş li Danîmarka, Swêd û Norwejê. Fînlandaya ku hêj nû ji beşdariya xwe ya xwînî ya şoreşa 1917'an derhatibû, xwe ji wê meyla çepîbûna giştî diparêze. Berfirehkirina mafên sosyal ji bo tevahiya gel, qet nebe di çarçova prensîban de, têne bidestxistin bi rêya birêkxistina şirîkatiyeke saxlem di navbera sendîkayên karkeran û wan patronan de ku serûberkirineke maqûl a bazara kar qebûl dikin. Parastina sosyal li ser bingehê yeksaniyê û ji bo hemû hevwelatiyan tê dabînkirin. Bi yasayan, her hemwelatî xwedanê şiyana îstifadekirina ji Dewleta-dabînker e, ku dewlet bi bacan tê fînansekirin ne mîna li Fransayê bi kotîzasyona [peredana hevwelatiyan ji dahata xwe ji bo mesrefên hevbeş ên cemawerê] civakî. Norwec ne tê de, li welatên din bi tenê qerebûya bêkariyê ji sîgorteya mûçegiran tê dabînkirin.

Çaxê zêrîn ê Dewleta-dabînker, sepandina wê ya rasteqîne û bikêrhatî, piştî duyem şerê cîhanî ye. Armanca hevbeş ne civakeke lîberal e û ne jî ûtopiyeke sosyalîst e, lê rêyeke sêyem e ku li ser kapîtalîzmeke reformekirî hatiye avakirin, li ser zewaca xêrxwaziya civakî û aboriya bikêrhatî. Hemû hêzên siyasî û civakî, civakeke bazarê qebûl dikin ku rê nade pêkhatina ne-yeksaniyên pir aşkera û kûr. Ewleyiya sosyal, mûçeyên di çarçova alîkariyê de, kreş, xaniyên xanenişînan, sexbêriya li kêmendaman, tenduristî, perwerde, formasyon, lêkolîn, kultûr hemû bi hev re wekî versiyona sosyal-demokrat a Dewleta-dabînker dihatine pêş çavên welatên cîhanê.

Ev berhema wan partiyên sosyal-demokrat e ku pê de pê de bûne partî-dewlet, û ku qederê zêdetir ji şêst salan li Swêdê û zêdetir ji çil û pênc salan li Norwej û Danîmarkayê, bi tenê an jî di serokatiya koalîsyonan de desthilatdariya xwe ragirtin…

Qeyrana aborî ya salên 1980 û 1990'an, dawiya şerê sar, lawazketina siyasî ya sosyal-demokrasiyê û globalîzasyona darayî wê modêla sosyal a « Norden » naziktir dikin ku her ku diçe meyla xwe dide ser modêla Ewrûpaya rojavayî, modêla kêmtir sexî…

**Werger ji fransî**
**Cemil Denli**

**Têbînî:**

Niels Finn Christiansen (dîr.), *The Nordic Model of Welfare, A Historical Reappraisal,* Museum Tusculanum Press, University of Copenhagen, 2006, 432 rp.

www.arsivakurdi.org

GELO DIBE KU MIROV LI BER LOBIYA HERÎ ZÊDE DIKE DENGÊNÎ RABE?

# Cihûyen Amerîka li dijî rastgirên Îsraîlê

Hewladanên Serokê DYE'yê Barack Obama ji bo destpêkirina pêvajoya aştiyê li Rojhilata Nêzîk tengav dibin. Sedem jî ew e ku Serokwezîrê Îsraîlê Benyamin Netanyahu qebûl nake çêkirina wargehên cihûyan rawestîne. Dîsa jî çareserkirina pirsgirêka di navbera Îsraîl û Filistînê de yek ji stratejiyên navendî yên rêveberiya Amerîkî yên li herêmê ye. Serketina vê stratejiyê dibe ku hinekî jî girêdayî bandora lobiyeke nû ya cihûyan be, ya ku dijberî siyaseta rastgir a Îsraîlê ye.

ERIC ALTERMANN *

Dema di Tîrmeha 2009'an de Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê rêveberên sêzdeh rêxistinên cihûyan li Qesra Spî kirin mêvan, di lîsteya vexwendiyan de navên ku êdî em fêrî wan bûbûn hebûn: serokên strûkrûrên kevin ên muhafezekar ên mîna Konferansa Serokên Rêxistinên Mezin ên Cihûyên Amerîkî (Conference of Presidents of Major American Jewish Organizations), Lîga Dijberî Piçûkxistinê (l'Anti-Defarmation League - ADL), Komîteya Cihûyên Amerîkî û bêguman ruhê lôbiya Îsraîlê; l'American Israel Public Affairs Committee (Aipac). Belê di nava wan de yekî nû jî hebû: Rêzdar Jeremy Ben-Ami, Rêveberê lobiya nû ya cihûyan a pasîfîst 'J Street'ê (1). Ji ber ku ew jî amade bû, bêguman ne her kes jê xweş bû. Di nava weşanên ji aliyê meyila serwer ve tên tercîhkirin û neo-muhafezekar yên rêxistinên cihû de sempatiya ji bo 'J Street'ê bi qasî ya ji bo Hamasê kêm e. Bi vî awayî di stûnê xwe yê quncikê de Noah Pollak rêxistin weke "bênirx", "bêrûmet" û "dij-îsraîlî" nirxandibû; ji 'New Republic'ê James Kirchick ew weke "lobiya teslîmiyetê" (surrender lobby) bi nav kiribû; ji 'Weekly Standart'ê Michael Goldfarb ew bi "dijmintiya" Îsraîlê û "balistina pêlavên" terorîstan gunehbar kir. Ev ziman panîka li cem wan derdoran eşkere dike ku ditirsin xwedanedera 'J Street'ê - di hilbijartina Serokê DYE'yê de para wê jî heye – dibe ku nîşana destpêkirina dawîhatina li serweriya li ser diyarkirina siyaseta Amerîka ya Rojhilata Nêzîk be, ya ku berê hema bêje bi giştî di bin destê wan de bû.

Pêwendî şer û nakokiya di navbera Îsraîl û ereban de pirsek xwe di cih de dide der: Çima siyaseta Amerîkayê ewqasî ji ya netewên din cihê ye û bi taybetî jî ji ya hevgirên wê yên Ewrûpa? Têkiliya stratejîk a bi Îsraîlê re ji bo netewa amerîkî ji tevahiya têkiliyên wê yên din buhatir û bixisartir e, hem di warê pereyan de û hem jî di warê mirovan de. Ne ku tenê salê alîkariyeke sê milyar dolaran lê diçe, ew her wiha di pirraniya welatên misilman de kîn û nifrînê gurr dike û li seranserê dinyayê şîddeta amerîkî xwedî dike. Li ti paytexta dinyayê, bêguman ji bilî Tel-Avîvê, fena Dewletên Yekbûyî di Rojhilata Nêzîk nagihêje: Îsraîl "êrîşkarekî rastî êrîşê tê" ye, û filistînî jî "êrîşkarên deraqil" in. Tevî ku evqasî cihê nîqaşê ye jî, ev siyaset bêyî ku biguhere ji rêveberiyekê derbasî ya din, ji kongreyekê derbasî ya din dibe.




*Îsraîl piştgiriya cihûyên cîhanê wenda dike? (Wordpress)*

## Her kesê din şaş e

Partîzanên amerîkî yên ji xeta hişk a îsraîlî – pirraniya wan xirîstiyanên protestan û bi ser de bingehe cihû ya neo-muhafezekar – ew di siyaseta Washingtonê ya tenêmayî de ti pirsgirêkê nabînin. Li gorî wan tevrega ewrûpiyan ji antî-semîtîzmeke kevneşopî (Xirîstiyan) tê ku her wiha tevlî daxwazeke nermkirina rejîmên dewletên ereb yên petrolê hildiberînin bûye. Li vê jî zêde dikin ku çapemeniya Ewrûpî, ya mîna antîsemît tê nîşandan, her car aliyê bindestan digire – jixwe filistînî bi şaşî weke bindest tên dîtin – û ji we re vê meyildariya ji bo filistîniyan rave dikin. Ango helwesta Amerîkî weke îspatkirî wiha difikire: her kesê din şaş e.

Bi van argûmanên ku tenê yekê ji sedeman digirin nav xwe, bi ser de jî piçûk e, Îsraîl hê jî li Kongreyê serdest e. Sedema din têkildarî hêza Aipacê ye – tevî rêxistinên wê yên alîkar – ku bandor û hêza wê mirov nikare li ber ti lobiyeke din a navneteweyî bigire (di nava ti komên din ên bandor û zextê de jî komeke bi vî rengî nîne). Tevî du derbên hê nû lê ketin jî – lêpirsînên huqûqî yên ceza yên 2005an (niha dev ji wan hatiye berdan) ku ji ber sîxurtiya li dijî du rêveberên payebilind ên saziyên ên berê Canik Steve Rosen û Canik Keith Weissman (2) hatibû destpêkirin; û weşandina pirtûka John Mearsheimer û Stephen Walt ya bi navê *lobiya alîgirê Îsraîlê û siyaseta derve ya*

** Rojnamevan, nivîskarê pirtûka "Kî ji bo Amerîkayê dipeyive? Ji bo çi demokrasî di siyaseta derve de girîng e? / Who speaks for America? Why democracy matter in foreign policy?", Cornell university Press, London 1998.*

www.arsivakurdi.org

*Amerîka* (ji aliyê ‘La Découvert ve bi fransî bi sernavê *Le Lobby pro-israélien et la politique étrangère américaine* hate weşandin) -, mirov dikare delîla hêza ‘Aipac’ê di vê mînakê de bibîne: bi darêzorê Rêzdar Charles Freeman, “erebîstekî” tîpîk, namzetiya xwe Konseya Îstîxbaratê ya Netewî (National Intelligence Council, NIC) ya rêveberiya Obama paş ve kişand. Her çend li dijî wî kampanyayeke xurt hatibû destpêkirin jî – heta rojnamevanekî ew bi têkildariya bi pedofîliyê gunehbar kir, ‘Aipac’ê li xwe dananî ku têkiliya wê bi vê karê destabîzekirinê re heye. Mumkûn e, lê belê hêza wê mîna ya wan koman e ku bêyî kampanyayekê jî bi rê ve bibin tesîrê li daxwazên serokêkî DYE’yê bi-kin. Weke ku Jonathan Freedland di *The Guardian* de nivîsî, dema mirovek “mîtolojiya ‘lobiya îsraîlî’ bide aliyekî, ya ku rastî ye, têrê dike ku mirov tatêl û mitaleyan bike. (3)”

Eger hin mirovan dixwest vê namzetiyê sabote bikin, du sedemên vê hene ku hevdu qebûl dikin. Yan wan gelekî û ji dil mitale û fikar dikirin ka kî wê îstîxbarata Amerîkî analîz bike, lewma ew ditirsin ku Rêzdar Freedman wê êrîşeke Amerîkî yan jî îsraîlî li dijî Îranê zehmet bike (weke rapora ji aliyê Texmînên Îstîxbaratê yên Netewî – National Inteligence Estimates – ve di 2006’an de hatî weşandin ku îdîa dikir Îran êdî bernameyeke nukleerî ya eskerî naşopîne). Yan jî ew dixwazin karmendên potansiyel hemûyan pêbihisînin, eger li ber vîzyona wan a siyaseteke alîgirê Îsraîlê rabin, ew çiqasî kariyera xwe dixin xeterê – tevî ku rola van karmendan di nirxandina vê siyaseta behskirî de wê nebe jî. Civaka alîgirî Îsraîlê dixwest Rêzdar Freedman bide erdê; û ya xwe kir. Hejmara cihûyên Amerîka yên ku pişta xwe didin nûnerên xwe yên fermî baş e, belê ew xwe bi xeta hişk a rêxistinê ve ewqasî girê nadin. Li gorî anketên dawî yên ‘J Street’ê cihûyên Amerîka alîgirê (ji sedî 76 li beramberî ji sedî 24’an) çareseriyeke du dewletan û li hevhatineke dawî ne ya ku beriya heşt salan li Camp David û Tabayê bi ser neket (5). Ev nêzîkbûna çareseriyê ji aliyê ‘Aipac’ê ve bi awayekî sîstematîk tê reşkirin û şermezarkirin. Tevî ku li beramberî destnîşankirina wezîrê karê derve yê Îsraîlê , yê rasîst û tolhildêr Avigdor Lieberman, lobiyê dengê xwe nekir, pirraniya cihûyên Amerîkî li gorî anketa ‘J Street’ê li dijî helwestên wî bûn (ji sedî 69 li beramberî ji sedî 31’ê); wî xwest li ser welatiyên ereb ên Îsraîlê ferz bike ku sûnda dilsoziya bi dewleta cihû re bixwin û wî her wiha gef li parlementerên ereb ên îsraîlî xwaribûn. Bi ser de jî cihûyên Amerîka pêşverû ne, lê di ‘Aipac’ê de neomuhafezekar serdest in. Di hilbijartinên serokatiyê yên 2008’an de cihûyan bi dilsozî destek da demokratan û dengê xwe jî dan Rêzdar Obama, heta ji pênc paran çarên wan dengê xwe dan Obama. Ev nakokî çima heye: Rêxistinên weke ‘Aipac’ê ku ji aliyê cihûyên pêşverû ve tê fînansekirin, tevî vê jî bi muhafezekarên komarxwaz - yên ku dixwazin demokratên pêşverû reşbikin – re li hev dikin...

Pêwendî nifşên cihê jî nêzîkbûna nû ya ‘J Street’ê di encamê de tê ser xala behskirî. Çawa ku M. J. Rosenbergê beriya demeke kurt ji komeleya pasîfîst a bi navê *Israel Policy Forum*ê veqetiya dibêje, di ‘Aipac’ê de “*mirovên gelekî zêde kal û pîr serdest in*” lê belê “*zarokên wan û neviyên wan bi (wan) re ne hemfikr in. Çiqasî zêde em ji dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn dûr dikevin, ewqasî zehmettir e tirsê bi ciwanan re çêbikin da ku destekê bidin Îsraîlê. Ew ê bi tenê eger jê bawer bikin û eger Îsraîl li wan were pêşniyarkirin, pişta Îsraîlê bigirin. Lê ev stratejiyên xwe dispêrin tirsê hemû, yên bi awayê ‘di vê tu vê çekê mohr bikî, lewra wê cihû ji nû ve werin qirkirin’ êdî bi yên ku temenê wan di bin 60 salan re ye nameşe. Mirovên ku di salên 1960’î de li dijî şerê Wîetnamê xwepêşandan li dar xistin, wê nekevin nav resmê “vegera Hîtler” de.*

Û ew li gotinên xwe zêde dike: “*Popularîteya Îsraîlê li cem cihûyên Amerîka ji 1977’an û vir ve, ji ber destnîşankirina* [Mahanem] *Begin weke serokwezîr, kêm dibe. Heta hingî îmajeke Îsraîla Leon Uris (6) ya kibboutz û bihûşta sosyalîst firotibûne wan. Ev îmaj îro bi tevahî guherî.*”

Bi ser de jî Îsraîlî li gorî filistîniyan gelekî zêde populertir in – li gorî anketeke di dema şerê li Xazayê de sempatiya ji sedî 49’ên amerîkiyan bêhtir ji Îsraîlê re hebû (tenê ji sedî 11’an filistînî tercîh dikirin) -, Ev empatiya bi Îsraîlê re li cem muhafezekaran ji yên ku ji xwe re dibêjin pêşverû gelekî xurttir e (ji heşt paran heftê muhafezekaran empatiyê bi Îsraîlê re dikin, ya kesên ji xwe re dibêjin pêşverû jî empatiya wan heta bi ji sê paran diduyan kêm dibe).

‘J Street’ hewl dide beşekê ji teknîkên *buzz marketing*ê (7) bi kar bîne da ku bandora siyasî ya cihûyan li Washingtonê bi helwesta niha ya cihûyên Amerîka re li hev bike. *Buzz marketing* şîrketa koma bandora pêşverû ya bi navê Move On.org û ya kampanyaya Rêzdar Obama ya dema hilbijartinê ye. Tevî ku hînê gelekî zû ye em tesîra wê binirxînin jî, rêxistin xwe gelekî bi lez pêş dixe. Beriya hijdeh mehan hat damezrandin û ji hingî ve butceya wê gihîştiye sê milyon dolaran û bîst du kes jî jêre kar dikin. Emîn, mirov nikare li ber budceya 70,6 milyon dolaran a ‘Aipac’ê bigire, belê destpêk hêviyan dide. Milyonek dolar ji bo hilbijartinên Kongreyê hatibû komkirin, da ku namzetên girêdayî aştiyeke adil li Rojhilata Nêzîk, bidin hilbijartin.

## Dengên ku heta bi hevdengiyê bilind dibin

‘J Street’ê hewldanên xwe bi strûktûrên piçuk re dike yek – ku gelek ji wan ji destpêka krîza aborî û çûna komarxwazan ji Washingtonê (berê dijminatiya rêzdar George W. Bush dikir ku gelek kes devê kîsên xwe vekin) ve, ji ber kêmbûna bêş û alîkariyên maddî yên gelek rêxistinên çepgir ên navendî gelekî êşiyan. Wê hin ji van rêxistinana jî kirin nav xwe û ji ber vê yekê hewldanên hevbeş berdartir kirin. Yekemîn civata wê ya netewî ya ku wê di navbera 25 û 28ê Cotmeha 2009’an de pêk were, wê yazdeh komên pasîfîst bicivîne, di nav wan de rêxistinên herî rûniştî yên mîna American for Peace Now (Amerîkî ji bo Aştiyê a Niha), Israel Policy Forum (Foruma Siyasetê ya Îsraîlê) û New Israel Fund (Weqfa Îsraîlê ya nû). ‘J Street’ê Union of Progressive Zionist (Yekîtiya Siyonîstên Pêşverû) jî di Cotmeha 2008’an de kire nav rêxistina xwe, bi vî awayî gihîşte toreke rêxistinan ya piçûk belê dilsoz ya xwendekarên cihû.

Li gorî agahiyên dawî, ew dike her wiha rêxistina Brit Tzedek v’Shalom jî kontrol bike; ev rêxistina cihûyên pêşverû ji komên herêmî pêk tê û eşkere dike ku li DYE’yê hejmara mîlîtanên wê yên dildar çilûheşt hezar e. Li Washingtonê ‘J Street’ê gavake girîng avêt û bi girtina kar a rêzdar Hadar Susskind krediya xwe zêde kir, lewra Susskind xaziyekî artêşa Îsraîlê bû û demeke direj cîhgirê serok û rêveberê Jewish Council for Public Affairs jî bû ya ku bi pirsgirêkên navxweyî yên cihûyên Amerîka re eleqedar dibû.

Gelek tişt girêdayî şeweyê rêxistinên cihû û laîk ên çapemeniyê ne ka wê çawa cih bidin civata ‘J Street’ê ya li pêş me. Rêzdar Ben-Ami rave dike ku yek ji armancên wî yên sereke ew e, carekê xweş nîşanî her kesî bide ku bereya aştiyê ya cihû “*ne tenê ji deh kesan pêk tê ku di şikeftekê de dicivin*”. Demeke kurt beriya ji karê xwe veqete (û bikeve ber lêpirsînê), serokwezîrê berê yê Îsraîlê Ehoud Olmert hişyar kiribû: “*Eger çareseriya bi du dewletan bi bin bikeve, Îsraîl wê bi şerekî ji bo mafên sivîl ên mîna li Başûrê Afrîkayê re rûbirû bimîne.*” Û eger ev pêk were wî her wiha hişyar kir: “*Dawî li dewleta Îsraîlê hat*” (8).

Kapasîteya rêzdar Obama ku Îsraîlê bi qedereke wiha re rûbirû bihêle – û mafekî girîng a diyarkirina çarenûsa xwe bi xwe ya netewî, tevî dana misogerkirina erda pêwîst, bide filistîniyan –girêdayî serketina van dengên ku carê bi tenê yek yek bûn.

**Werger ji fransî**
**Lokman Turgut**

1) Li Washingtonê li gorî tîpên alfabeyê nav li rêyan hatiye kirin. Lê belê ‘J Street’ nîne. Damezrênerên rêxistinê bi vî awayî xwestin nîşan bidin ku wan dengek daye wan kesên ku heta hingî dengê wan nebû.

2) Bi îdîaya agahiyên veşartî dane Îsraîlê.

3) Jonathan Freedland, “Discard the mythology of ‘the Israel Lobby’, the reality is bad enough” (Mîtolojiya ‘lobiya Îsraîlê’ bidin aliyekî, rastî têra xwe xirab e), The Guardian, London, 18’ê Adarê 2009.

4) Texmînên Îstîxbarata Netewî (National Intelligence Estimates), nirxanidinên fermî yên tevahiya saziyên îstîxbaratê yên li Dewletên Yekbûyî ne.

5) Civîna Bilind a ‘Camp David’ê di Tîrmeha 2000’an de pêk hat. Di civînê de Serokê DYE’yê William Clinton, Serok wezîrê Îsraîlê Ehoud Barak û Rêveberê Rêxistina Rizgariya Filistînê Yaser Arafat hatin cem hev. Hevdîtinên di navbera Îsraîlî û Filistîniyan de di çileyê 2001’ê de li Tabayê pêk hatin.

6) Nivîskarê pirtûka bi navê *Exodus* (koçberî). Otto Preminger sala 1960’î li gorî vê pirtûkê fîlmek jî çêkir û lîstikvanê sereke jî Paul Newman bû.

7) Belavkirina agahdariyan bi kêmkirina peyaman bi rîtmên zêde û buhayê kêm, ku bi teknolojiya komunîkasyonê ya nû mumkin e.

8) Vê gotarê bixwîne: Willy Jackson, “Gelo Israîl ji ber kampanyayeke kêmpererazandinê di xeterê de ye? (Israël est-il menacé par une campagne de désinvestissement ?), Le Monde Diplomatique, Îlona 2009’an.

***Hasan Hüseyin Deveci***

(Malmime) di sala 1972’an li Anatolya Navîn, li gundekî Kurdên Qonyeyê ji dayîk bû. Sala 1994’an koçî Almanyayê kir. Xwendina xwe ya wênesaziyê li bajarê Kölnê qedand. Deveci heta niha beşdarî çendîn peşen-gehan bûye û bi şêweyê xwe bal kişandiye. Deveci îsal tevî sêzdeh hunermendên ji herçar beşên Kurdistanê yekemcar beşdarî pêşangeha navnetewî ya Wenedîkê, Biennalê bû. Beriya demekê bi slogana “Bi hev re” pêşangeha wêneyan li gel hevkara xwe ya wênesaz Monika Hajak li bajarê Kölnê vekir. Deveci niha tevî malbata xwe li Kölnê dijî û kar dikî. Ew endamê çendîn rêxistinên wênesazan yên navnetewî mina IGBK, Association Internationale des Arts Plastiques û AIAP ye.

www.arsivakurdi.org

XETERA RÛXANA DEWLETÊ

# Şerên veşartî li Yemenê

Ji niha û pê ve Yemen veguheriye baregeha piştbereyê ya şervanên El Qaîdeyê yên ji Erebîstana Suûdî tên. Li başûrê welêt ku sala 1990'î bi bakur re bû yek, muxalefeteke cihêxwaz mezin dibe. Li herêma Saadayê jî şerekî serhildêr her diçe gurr dibe. Rayedarên fermî îdîa dikin ku Îran destekê dide serhildêran, serhildêr jî îddîa dikin ku mudaxeleya Erebîstana Suûdî ne rast e. Ev şerê ku navê xwe bi lêv nake û van hefteyên dawiyê dijwartir dibe, xetera ku welêt veguhere dewleteke ketî jî bi xwe re hildigire.

PIERRE BERNIN *

Dûrî çavê dinyaya derve, herêma Saada li bakur rojavayê Yemenê, nêzî sînorê bi Erebîstana Suûdî re, ji Hezîrana 2004'an û vir ve veguheriye qada şerekî bi şîddet (1). Li vir hukûmet şerê komek serhildêrên bi navê "Hûtiyî" dike. Serokê komê parlemanterê berê Huseyin el-Hûtî bû, ji mirina wî ya di îlona 2004'an û vir ve birayê wî yê jê piçûk Ebdulmelîk el-Hûtî serokatiya komê dike. Tevî agirbesteke ku di Tîrmeha 2008'an de hatî eşkerekirin jî, ji nîvê Gulana 2009'an û vir ve şerî ji nû ve dest pê kir. Asêbûna di şer de, şîddeta wê, bi dehhezaran qurbanên wê û kesên ji welatê xwe bûyîn û xetera reaksiyoneke mîna xelekên yekzincîrê, di herêmeke ku di heman demê de erda eşîrên sereke yên welêt e, hîna jî para bêhtir nayên zanîn.

Serhildana Hûtiyan xwe disipêre nasnameya dînî Zaydîtiyê. Zaydîtî şaxekî Îslama Şîî ye ku li platoyên bilind ên Yemenê belav e. Ev Şîîtî di warê teolojiyê de bi awayekî zelal ji Şîîtiya Duwanzdeh Îmaman ya li Îranê serwer cuda ye (2). Zaydî ji sê paran yekê serjimara Yemenê pêk tînin. Di dîroka taybet a Yemenê de bi mafdarî di warê huqûqê û dogmayan de weke "nerm" têne bi navkirin û gelek şîroveyên wan yên dînî bi sûniyê mezheba Şafiî (3) re hevpar in; piraniya Yemeniyan Şafiî ne.

Hukûmet serhildêriyê bi daxwaza ji nû ve avakirina îmamata Zaydîtiyê gunehbar dike, ku heta 1962'an, ango şoreşa komarê, li welêt hukmê xwe meşandibû. Ev destpêka şerekî dirêj ê navxweyî bû, Erebîstana Suûdî pişta melikparêzan girtibû û Misira Cemal Abdulnasir jî yekîneyên xwe şandibûn da ku bi komarxwazan re mil bi mil ve şerê melikparêzan bikin. Îmam *sehîd* bûn ango ji malbata pêxember Muhemed; birayên malbata el-Hûtî jî *sehîd* in. Rayedarên Yemenî îdîa dikin ku Îran pişta Hûtiyiyan digire û Hûtiyî jî weke Hizbullaha Libnanê parçeyek ji projeya pêkanîna "*kevaneke Şîî*" li seranserê Rojhilata Nêzîk in. Armanca derxistina pêş a îdîaya tevlîbûna Îranê ew e, ku hukûmet dixwaze desteka Suûdî ji xwe re misoger bike, lewra rejîma Suûdî jixwe ji ber kapasîteya plankirinê ya her zêde dibe ya dijberê xwe Îranê fikaran dike.

Serokên Hûtiyî ev gunehbarî red kirin. Ew dilsoziya xwe bi komarê re didin zanîn û dixwazin baweriyê bidin ku ew bi tenê dixwazin nasnameya dînî ya zaydî biparêzin. Li gorî wan Zaydîtî bi xetera zordestiya versiyonên gelekî hişk ên Îslama Sunnî Wehabîtî û Salafîtiyê re rûbirû ye.

Erdên ku dergûşiya Zaydîtiyê kirine, li herêma Saada ne. Ev herêm berê di salên 1960'î de di dema şerê navxweyî de yek ji kelehên dawî yên melikparêzan bû. Lewma demeke dirêj dûrî çavên siyasetên pêşdebirinê yên hukûmetên li pey hev ên komarxwaz ma. Derketina Hûtiyiyên niha xwe disipêre tevgereke vejîna Zaydî ku di salên 1980'î de di nava saziyên per-



werdeyê, weşanxane û ziyaretên li der dora Saada lê her wiha li paytext Senayê cih ji xwe re dît û xwe da der.

Tevî ku Serokkomar Elî Ebdullah Salih jî têde, piraniya elîtên siyasî bi eslê xwe Zaydî ne jî, ev tevgera vejînê ya Zaydî timî gelekî hindik dimîne. Her wiha, her çend Zaydî bi israr li ser taybetbûna nasnameya xwe li beramberî şerîetê yan jî pratîkên dînî derdixin pêş, pirraniya welatiyan (yên esil-Zaydî jî di navê de) pêvajoya wekhevkirina nasnameyên dînî qebûl dikin, ya ku ji aliyê sîstema perwerdeyê ve tê rûnandin û ji aliyê dewleta komarxwaz ve tê birêvebirin. Ji ber vê yekê muxalefeta Sunnî-Şîî ne li gorî demê ye û tenê di keviya wê de dikare bandorê li ger, dewran û têkiliyên siyasî bike.

Ev hemarmanciya nasnameyan dîsa jî pêşiyê lê nagire ku salafiyên hevgirên şert û mercên desthilatdariya siyasî, Zaydiyan her diçe zêde dirh û dexme bikin. Di çarçova pirsgirêka li Saadayê de tengezarî zêde ye û xeter heye ku şer veguhere şerekî di navbera mezhebên cihê de. Dawiya Tebaxa 2009'an hin saziyên medyayê nûçe belav kirin ku di şerê di navbera Hûtiyî û xwendekarên înstîtuyeke salafî Dar el-Hadîsê de gelek kes hatine kuştin. Dar el-Hadîs ji aliyê Mûqbîl el-Wadî ve di salên 1980'î de hatibû damezrandin (4). Hûtiyiyan ev nûçe û agahdarî li ser malpera xwe ya înternetê derew derxistin. Di Adara 2007'an de du xwendekarên biyanî, yek jê jî fransî di şerên mîna vî de hatibûn kuştin.

## Rola şêlû û nediyar a Erebîstana Suûdî

Şer ji aliyê hukûmetê ve weke dijberiyeke îdeolojîk tê binavkirin û ev dijberî komarê û komeke radîkal a dînî tîne hember hev. Hûtiyî bi xwe li aliyê xwe vî şerî weke berxwedana hindikayiyeke dînî bi nav dikin. Li aliyekî îdîaya hukûmeta yemenî der barê bernameyeke jinûve avakirinê ya piştî agirbesta Tîrmeha 2008'an destpêkirî, li aliyê din îdîayên serhildêran ku dibêjin şer û navtêdan ti carî ranewestiyan e; ji van gunehbariyên herdualiyan û wê de pirsgirêk girêdayî gelek faktoran e ku asêbûn û bistbûna di pirsgirêkê de rave dikin.

Tevî agirbest û navbênkariyan – weke ya Qetarê di 2007'an de- dewama dijminatiyê ji 2004'an û vir ve hinekî jî girêdayî derketina pêş a berjewendiyên aborî ye ku li pirrbendî û dijberiya navxweyî ya ji bo bidestxistina desthilatdariyê zêde dibe. Kontrola bazirganiya îllegal a ber bi Erebîstana Suûdî ve û cîraniya Derya Sor – ku veguhestina mazotê û çekan ber bi Hebeşîtan, Somaliya û Erîtreyê ve hêsan dike – sedemeke sereke pêk tîne. Sîlehên ku wê ji artêşê re biçin jî ji aliyên hin sûbayan ve paş ve tên zîvirandin; eger beşek ji wan were firotinî derve jî, bi awayekî nakokiyane ji aliyê navbênkarê li vê herêmê bi taybetî çalak ve beşek ji wan ji nû ve tê firotinî serhildêran.

Perspektîva girtina cihê Serokkomar Salih ê ku ji 1978'an û vir ve li ser hukm e, agirê rikberî û hemberiya di nava rejîmê de jî gurr kir; bi taybetî jî di navbera kurê Salih, Ehmed Elî Salih (di heman demê de li serê hêzên taybet û muhafizên komarê ye jî), û gelek fîgurên di nava artêşê de. Di encama vê de tê gotin ku herêma Saadayê veguheriye qada şerekî li ser navên hin kesên din tê meşandin. Di nava vî şerî de eşîrên dijberê hev jî li aliyekî hewl didin çavkaniyên aboriyê bixin destê xwe û li aliyê din hewl didin bandora xwe li herêmê piştrast bikin. Di Gulana 2008'an de, herêma şer fereh bû û gihişte herêma Benî Hûşeyş a li der dora bîstûpênc kîlometroyan li bakurê paytext Senayê. Ji 2004'an û vir ve cara pêşî hêzên taybet û serketina wan paralelî binketina eskerî ya tabûrên artêşê li wilayeta Saadayê hat nîşandan.

Asêbûn û bistbûna di pirsgirêkê de di heman demê de girêdayî rola her diçe mezin dibe ya aktorên eşîrî ne. Çi alîgirê hukûmetê û çi yên Hûtiyiyan bîn, li gorî projeya hukûmetê ya Hezîrana 2008'an a çêkirina "artêşeke gel" ku xwe dispêre eşîrên

* *Lêkolîner*

www.arsivakurdi.org

li hawîrdora wîlayeta Saadayê, ketina nava şer a milîsan pirsgirêk xiste nava xelekeke şîddetê. Ev xeleka şîddetê mekanîzmayên tolhildan û heyfa xwînê yên ku li ser piştgiriya eşîrî avabûne, xurt dike. Di destpêka sala 2009'an de tevî ku desthilatdariyê pere ji bo jinûveavakirinê veqetandin jî, hin komên eşîrî, yên ku beriya çend mehan hevgirên artêşê bûn, lihevhatina bi Hûtiyiyan re red kirin û bi asêkirina riyan û rehîngirtina mirovan xwestin zextê li hukûmetê bikin. Hêja ye mirov bala xwe bide vê tehlûkê ku ev "eşîrîbûna" pirsgirêkê rê dide ku hin nîqaşên ji aliyê hin derdorên nêzî desthilatdariyê ve bi hev re têne kirin, ji nû ve li ber çavan werin girtin. Ev nîqaş yan projeyeke siyasî ya Hûtiyiyan, yan jî şerekî ku Sunî û Şîiyan bîne hemberî hev derdixin pêş.

Ji niha û pêve, pirsgirêka Saadayê wê xwe li dijminatiyên berê yên du konfederasyonên eşîran ên sereke yên platoya bakur zêde bikin: Ji van konfederasyonan Haşed li aliyê hêzên hukûmetê şer dikin, gelek eşîrên konfederasyona Bakîl jî destekê didin serhildêran (5). Emîn, analîzeke bi vî rengî, beriya ku bi kitekit ji hev were derxistin jî ji herêma Saada bihûrîna şer û belavbûna wê rave dike. Mirov bi nav bike ev herêma şer gihîştiyê devera Harf Sufyan, -li başûr ne dûrî erdên mîrîtiya el-Ûsaymat- yek ji eşîrên sereke yên Haşedan. Geremoleke bi vî rengî faktorên bê îstîkrarkirinê yên vî şerî radixe ber çavan ku xetera wan heye bi riya mekanîzmayên hevgirtina eşîrî li herêmên din ên bakurê Yemenê belav bibin; bi taybetî jî li wilayetên el-Cawf, Amran û Hayca.

Di nava vê lîstikê de tevlîbûna aktorên herêmî ya kêm avaker jî heye. Di 2007 – 2008'an de navbênkariya Qetarê û agirbesteke di navbera aliyên şer de li Dohayê ti bandora wan çênebû û xêra wan neda ti kesî. Ji nû ve destpêkirina şer kir ku hukûmeta Qetarê xwe ji nava meseleyê bikişîne û bide alî; Qetarê bi ser de soza desteka maddî ya jinûveavakirin û pêşxistina herêma Saadayê jî paş ve kişand. Rola cîranê Yemenê, Erebîstana Suûdî bi xwe mirov dikare weke şêlû û nediyar bi nav bike, heta hin kes wê bi xirakirina navbênkariya Qetarê gunehbar dikin, lewra Erebîstana Suûdî dixwaze hêza vê mîrnişîna piçûk li herêma ku li gorî rêûresma xwe bandora wê lê heye, sînordar bike. Tevî ku monarşiya el-Suûd şerê li Saadayê bi awayekî fermî weke pirsgirêkeke navxweyî dibîne jî, hin aktorên Suûdî di warê maddî de hem destekê didin hewldanên şer yên Yemenê, hem jî destekê didin milîsên eşîran û bi vê tevlîbûnê alîkariya dewamkirina şer dikin.



*Pêşeroja ciwanên Yemenê li ber asoyeke şolî ye (P. J. Walker)*

Li aliyê din Dewletên Yekbûyî û Yekîtiya Ewrûpayê awirên xwe hemû zîvirandine bi tenê ser mijara şerê 'dijterorîst'û ji destpêkê ve gelekî xwe naxin nav lêgerîneke lihevhatineke pasîfîst. Wan ne yekser be jî, destûreke bêsînor daye hukûmeta Senayê. Di serî de ji aliyê Washingtonê, tevî ku ji aliye hevgirên xwe ve jî ji ber tevlînebûna "şerê li dijî terorîzmê yê gerdûnî" hatî rexnekirin jî, hukûmeta Yemenê ya Salih bi hêsanî serhildêr weke komeke terorîst dan nasîn û heta carinan jî îdîa kir ku têkiliyên serhildêran bi el-Qaîdeyê re hene. Ev yek zêde baweriyê nade, lewra Hûtiyî Zaydî (Şiî) ne û rexneyan li doktirîna salafî digirin.

Faktora bê îstîkrariyê ya bi taybetî hişk, ango şerê li Saadayê dibe sedem ku desthilatdariya navendî li herêmên bakur lawaztir bibe. Aboriya şer, bê îstîkrariya kronîk û zordarî dikin ku komên şîddetê bikartînin yên ku hin ji wan nêzî el-Qaîdeyê ne hêsantir derkevin holê û pêşbikevin.

Tevî ku hînê bi tevahî nehatiye ronîkirin jî, di Hezîrana 2009'an de revandina endamên rêxistineke civaka sivîl a navneteweyî yên ku li nexweşxaneyeke li Saadayê kar dikirin û kuştina sisiyan ji wan vê mekanîzmaya nesaz darîçav dike. Herçend hukûmetê di destpêkê de got Hûtiyî berbirsiyarê bûyerê ne jî (6), bêhtir bi aqilan dikeve ku destê komên sunî yên şîddetê bi kar tînin di bûyerê de hebe.

Destpêka 2009'an, Yemeniyê ku para bêhtir weke sekreterê berê yê Ûsama bin Ladîn tê danasîn, Nasir el-Wabaş damezrandina el-Qaîdeyê li Nîvgirava Ereb û yekbûna şaxên suûdî û yemenî eşkere kir. Ji destpêka 2007'an û vir ve êrîşên ku dixin stûyê komên têkildarî el-Qaîdeyê, bi taybetî weke ya li dijî sefareta Dewletên Yekbûyî li Sena û herêmên Yemena Başûr a berê gelekî zêde bûn. Di heman demê de wilayetên li Bakurê Yemenê weke ku ji van êrîşan parastî û dûr bin xuya dikin.

Li aliyê din li dijî yekbûna Bakur û Başûr a sala 1990'î, ji 2007'an û vir ve li herêmên Yemena Başûr a berê protestoyeke xurt xwe dide der. Li van herêman gel xwe weke mexdûrê cihêkariyê dibîne. Ev protesto her diçe bêhtir vediguhere tevgereke cihêxwaz, lewra zext û zordarî her diçe zêde dibe (7).

Rejîma ku demeke dirêj e ji aliyê rêzdar Salih ve tê birêvebirin, jê hat ku bi riya texmînan derewan bike û behsa îstîkrarekê bike. Lê belê pirbûna krîz û aloziyan û pirsgirêkên cihgirtina wî, mêzîna wî ya ne ewle yekcar dixe xeterê (8) û dibe ku bibe destpêka rûxîna dewletê û ev jî wê encamên nikarin bên hesabkirin ji bo tevahiya herêmê derxîne holê.

**Werger ji fransî**
**Lokman Turgut**

---

(1) International Crisis Group, *Yemen: Diffusing the Saada Time Bomb* (Yemen: Bêtesîrkirina bombeya siwarkirî ya Saadayê), Sena-Bruksel, Gulana 2009'an

(2) Şîîtiya duwanzdeh îmaman, dogmaya li Îranê serdest e; li İraq û Libnanê jî heye. Berevajî ortodoksiya Sunî, ew bi girîngiya dide Elî, zavayê pêxember Muhemed û Duwanzdeh Îmamên ji zuriyeta wî ne, derdikeve pêş. Li gorî dogmayê, ji van Duwanzdeh Îmaman yê dawiyê nemiriye, belê "veşartî" (xayîb) ye, vegera wî wê serweriya dadê nîşan bide. Zaydîtî jî xwe bi rêûresma Şîîtiyê ve girêdide, belê bi tenê heft îmaman qebûl dike; û beriya her tiştî fikrê vegera îmamê "veşartî" (xayîb) li cem wan nîne û weke "nermtir" tên qebûlkirin.

(3) Li gorî dîrokê, ortodoksiya Sunî ji çar mezheban (dibistan) yan jî rêbazên dînî yên ji aliyê huqûqa dînî ve qebûlkirî û li deverên cihê yên cîhana Îslamî belavbûyî pêk tê: Malikîtî (bi taybetî li Mexrebê belav e); Şafiîtî (li Rojhilata Nêzîk, li Yemen û Başûrê Asyayê); Hembelîtî (li Nîvgirava Ereb); Henefîtî (li Asya Navî û Başûrê Asyayê).

(4) *El-Quds el-Ereb* (Rojnameya panerebîst), London, 27ê Tebaxa 2009'an.

(5) El-Şarea (kovara hefteyî serbixwe li Yemenê), Sena, 2ê Tîrmeha 2007'an.

(6) Ev gunehbarî ji aliyê serhildêran ve derew hat derxistin û wan bi xwe roja piştî dîtina cenazeyên sê xebatkarên alîkariya insanî, xwepêşandanek li dijî revandina wan organîze kir.

(7) Franck Mermier, "*Yemen: le Sud sur la voie de sécession?* (Yemen: Gelo Başûr li ser riya veqetînê ye?)", Echo-Geo, Hezîrana 2008'an, http://echogeo.revues.org

(8) Bixwîne: Lorent Bonnefoy, "Entre pressions extérieures et tensions internes, un équilibre instable au Yémen (Di navbera zexta ji derve û aloziya di hundur de, li Yemenê mêzîneke ne bi îstîkrar", *Le Monde Diplomatique*, Cotmeha 2006'an.

www.arsivakurdi.org

SALOXDARÎ AN NÎVLEŞKERÎ?


# Qanûna bêdengiyê di nava CIA'yê de

Li ser dîwarê çepê yê salona ketina qerargeha Central Intelligence Agency (CIA) a li Langleyê (Virginie), bi nivîseke ecêb mezin ayeteke a Încila Yûhanna hatiye nivîsandin: *"Û hûn ê rastiyê nas bikin û rastî wê we azad bike."*

Tim weha nabe... 18'ê Îlonê, heft rêveberên kevn ên CIA'yê – Mîrza Michael Hayden, Porter Goss, George Tenet, John Deutch, James Woolsey, William Webster û James Schlesinger – zor li serok Barack Obama kirin ku lêpirsîna pêşekî ya li dijî karmendên ajansa îstixbaratê ku ji ber *"piroletî"* yên wan ên di dema lêpirsînên antîterorîst ên di dewra M. George W. Bush de hatiye vekirin, bigire. Li gorî wan, lêpirsîneke wisa dikare ewlekariya Dewletên Yekbûyî bi awayekî cidî bixe xeterîyê.

Ji dema sazkirina wê ya ji aliyê serok Harry Truman, ango ji 1947'an heta niha, waqayînameya CIA'yê heta qirikê bi sûcên giran dagirtî ne. Rojnamevanê New York Times'ê, Tim Weiner bi bîr tîne ku fermandarê lîvayê John Magruder xêzek kişandibû binê van gotinan: "*Di operasyonên îstixbarata veşarî de her tim pêdivî çêdibe ku hemû rê û rêbaz bên binpêkirin. [...] Êdî ne Pentagon (Wezareta Parastinê) ne jî Wezareta Karên Derve dikarin rîska veşartina wezîfeyên wisa hilgirin ser xwe. Îca servîseke nû ya kirinên veşarî divê ji vê berpirs be* (1)." Allen Dulles'ê ku di dema şerê sar de ji 1953'an heta 1961'ê ajans (ango CIA) bi rê ve biriye, doktrînê zelaltir dike: *"Cînayeta polîtîk aîdê sazgerîna me ye [...] eger serok ji bo vê destûrê bidê. Di vê rewşê de, em mecbûr in her tiştî bikin ku ji bo 'înkareke mantiqî' rê tê de bimîne; eger CIA li derveyî welêt, ji kuştina mirovekî berpirs bê girtin, ew mecbûr e ku serok biparêze û derfetê bidiyê ku serok îddia bike ku bi tu awayî haya wî ji wê operasyonê tuneye* (2)."

Kirinên nepenî – cinayetên rêveberên derve, sazkirina aloziyan, derbeyên li dewletan, trafîka çek û tevzîneran – tesîr li gelek welatan kir, teva alîkarîyeke pirr piçûk ya xebata di riya wê demokrasiyê de ku xwedêgiravî ji aliyê Washingtonê ve tê parastin. Ajans li dû hev bû mijara gelek skandalan: Beşekî mezin yê bê exlaqiyên wê ji aliyê çapemenî û komîsyonên anketa parlamenter Church û Rockefeler ve, di salên 1970'yan de hat eşkerekirin. Skandala Îran-Contragate – firotina çekan ya nepenî bi Îranê re ji bo fînansekiri- na dij-şoreşgerên Nîkaragûayê (1986) – careke din ew da cezakirin. Di havîna 2007'an de, derketina "mucevherên malbatê", danheviya dokumanên herî acizker ên arşîvên wan, vê carê benê stuyê wê jidand. Lê belê, bê guman, mijar tim li ser bûyerên "wexteke derbasbûyî" bû.



*Plakata Fîlmê "The Silence of the Lambs / Bêdengiya berxikan"*

John Prados, wekî nivîskarên ku di vê gotarê de behsa wan tê kirin, xwe dispêre lodekî belgeyên nepenî ku vê dawîyê hatine vekirin, lê dîsa jî destnîşan dike: *"Berî sîh salan, 'pirsgirêka' CIA'yê wekî ku di statuya wê ya 'fîlê tenê' de dihat muhafezekirin, bi dûrxistina ji ber çavan, li her derê dinyayê, bi tevgerîna li gorî kêfa xwe. Niha pir eşkere ye ku Ajans û endamên wê di rastiyê de tenê fermanên serokatiyê pêk dianîn. [...] Pirsgirêk belkî ji ajanseke îstixbaratê zêdetir, ku ji hemû kontrolan dûrxistî ye, serokatîyeke "tenê" îfade dike (3)."* Bi awayekî kurtebirî, Birêz Bush bi xwe ye yê ku di sibata 2002'yan de biryarek bi eşkereyî îmze kir: *"Di şerê me yê bi El Qaîde re de, tu bendê peymana Cenevreyê derbas nabin."* Weiner destnîşan dike ku ji wê û bi şûn de Amerîkî bi hebûnê re têkildar hin pirsan ji xwe dikin. *"Gelo dibe ku di civakeke bi rastî jî demokratîk de servîseke me ya nepenî ya îstixbaratê hebe? Gelo em dikarin him operasyonên nepenî pêk bînin û him jî li gora qanûnan biçin? Em di heman demê de him ewlekariyê dixwazin û him jî azadiyê"*, lê belê *"em çiqas hêzê bidin birêvebirîyeke nepenî, azadiya me jî ewqas kêmtir dibe."*

Ya herî xerab ew e ku, "*mezintirîn nepenîya vê servîsa nepenî jî ev e*", CIA'yê tu caran di warê peywira xwe ya yekemîn de karê xwe li gora ku jê hatiye xwastin nekir: hayê Serokê Dewletên Yekbûyî jê çêbike bê li dinyayê çi diqewime.

Wê ne hatina şoreşa xumeynîst a li Îranê dît, ne perçebûna Yekîtiya Sovyetan, ne jî 11'ê Îlonê, tenê ji bo ragihandina van bûyeran... Gordon Thomas mijara Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê bi bîr tîne û dibêje: *"Ajansê tu caran nekarî 'koremişkekî' ku di nava pergala sovyetîk de xwedî cihekî bilind be bi kar bîne. Ji ber wê, li ser rewşa welêt û polîtîkaya wê ya çekan de, wê xwe bi texmînan bi sînor kir. Bi berpirsiyariya Ronald Reagen, [rêveberê wî] William Casey tu tişt ji xwe re nedikir xem û bi awayekî sîstematîk hesabên Koşka Spî hişktir kirin."*

Weiner ji xwe dipirse "gelo çima yanzdeh serokên Dewletên Yekbûyî û sê nifşên ajanên CIA'yê nekarîn ji dinyayê fahm bikin" û dibêje *"çima her rêveberî piştî hatina xwe ajans di rewşeke xirabtir de hişt?"* Belkî ji ber wê ye ku, mîna ku Birêz Bush jî wisa kir, rêveberîyê di şûna berhevkirina agahiyan de, ajans bêtir ji bo peywirên nîvleşkerî bi kar anî.

Hema çi be jî, yê ku divê pirs jê bê kirin ne Birêz Goss e ku rêveberêkî wê yên kevn e. Piştî ku ew 5'ê Gulana 2006'an ji karê xwe hat derxistin, ew rasterast çû Ohîoyê, li zanîngeha Tîffînê axaftinek kir û ji şagirtan re got: *"Eger hûn rêveberên CIA'yê bûna, pêşniyara ku min ê bidaya we, wê kurt û vekirî bûya: Li tu tiştî mikur neyên, her tiştî red bikin û kî we tawanbar bike, hûn jî wan tawanbar bikin (4.)"*

M.L.

**Werger ji fransî**
**Aynur Bozkurt**

(1) Tim Weiner, *Xweliyên mîrasê. Dîroka CIA'yê*, Editions de Fallois, Paris, 2009, 543 rûpel.

(2) Gordon Thomas, *Pirtûka reş a CIA'yê*, Nouveau Monde, Paris, 2007, 389 rûpel.

(3) John Prados, *Şerên veşarî yên CIA'yê*, Editions du Toucan, Paris, 2008, 842 rûpel.

(4) Tim Weiner, *pirtûka navborî.*


**Le Monde Diplomatique kurdî**
Ji aliyê Rûdaw Media GmbH ve tê weşandin

**Edîtorê giştî**
Faysal Dağlı

**Rêvebirê hunerî**
Mehmet Nazmi Demir

**Şêwirmenda weşanê**
Berîvan Aymaz

**Verger**
İbrahim Seydo Aydoğan, Aynur Bozkurt, Cemil Denli, Salih Kevirbirî, Emrah Kocahal, Alîxan Serhedî, Lokman Turgut, Ergin Opengin.

**Asîstant**
Semra Polat

Tlf: 00 49 (0) 221 26 00 40 02
Fax: 00 49 (0) 221 26 00 49 81
info@lemondediplo-kurdi.com
www.lemondediplo-kurdi.com

Rûdaw Media GmbH
Gutenbergstr. 63a
50823 Köln / Almanya

**KURDISTAN**
**Le Monde Diplomatique kurdî (soranî)**
Ji aliyê Rûdaw Media Company ve tê weşandin

**Edîtora beşa soranî**
Nazend Begîkhanî

**Şêwirmendê weşanê**
Ako Mihemed

**Rêvebirê hunerî**
Baxtiyar Mistefa

**Verger**
Muhsîn Ahmed, Amir Ahmad, Herdî Baban, Kawa Dastoorrah, Mesûd Diryaz, Ahmedê Mela, Mansour Sedghî.

**Asîstant**
Selam Sadî

Tlf: 00 964 (0) 750 488 56 96
info@lemondediplo-kurdi.com
www.lemondediplo-kurdi.com

Rûdaw Media Company
Caddeyî 100 Metre, Hewlêr, Kurdistan / Îraq

**FRANSA**
**Le Monde Diplomatique**

**Damezrêner**
Hubert Beuve-Méry

**Rêvebir**
Serge Halimi

**Sernûser**
Maurice Lemoine

**Cîgirên sernûser**
Martine Bulardi, Philippe Rivière, Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh, Mona Chollet, Pierre Rimbert, Dominique Vidal

**Rêvebirê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand, Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon, F-75013, Paris

**ABONETÎ**
Rudaw Media GmbH
Deutsche Bank
Konto: 245016101 - BLZ: 37070024
**Almanya:**
Salane: 40 Euro - 6 meh: 20 Euro
**Dervayê Almanya:**
Salane: 50 Euro - 6 meh: 25 Euro